

naverok

dosye

SERGOTAR

Editor.....2

Wyîstan

Mizgîn AYDIN.....3

DI GOTINÊN PÊŞIYAN DE AV.....4

ZERIYA ZÎZ NEWROZ

KURIKÊ EGÎD ADAR

Adil ZOZANÎ.....5

XEWNEKE ŞÎRÎN

Behlûl ZELAL.....7

LAMPE

A. Çeko JIYAN.....9

DIL JI BO 'TE' EVÎN PÎR KIRIN

Omer DILSOZ.....11

BI TARA CAF RE HEVPEYVÎN

Fatma SAVCI.....46

NANÊ EVÎNÊ

Arjen ARÎ.....48

SEBA TU NEHATÎ

Adar JIYAN.....50

ZOZAN

Mizgîn AYDIN.....52

DINALIM EZ

Şîpan XIZAN.....54

DU KURTEŞÎR

Selahedîn BAYEZÎDÎ.....56

AWIREK LI HELBESTA

KEVN Î NÛ

Konê REŞ.....57

SERGOYÊ KURDAN

BAXÇEYÊ CÎRANAN

Evdile KOÇER.....58

ŞANOYEK ÇAWA?

M. Saîd ALPASLAN.....59

AWIREK LI SER ROMANA

BÊHNA AXÊ

Mizgîn BÎNGOL.....63

DOSYE – NÛREDÎN ZAZA

Amadekar: Dilawer ZERAQ.....13

NÛREDÎN ZAZA Û KURTEÇÎROKÊN WÎ

Fîrat CEWERÎ15

JI XORTAN RE

Nûredîn ÎSIF19

ŞÎRETÊN EHMEDE XANÎ

Nûredîn ÎSIF20

NAMEYÊN DESTNIVÎSKÎ YÊN NÛREDÎN

ZAZA21

GULÊ

Nûredîn ÎSIF28

NÛREDÎN ZAZA; AVANGARDEKÎ ÇÎROKNÛSIYA KURDÎ YA NÛJEN

Dilawer ZERAQ29

NÛREDÎN ZAZA Û ÇÎROKNÛSIYA WÎ

Lal LALEŞ32

Dr. NÛREDÎN ZAZA Û 'DERKETÎ'

Yildiz ÇAKAR34

NÛREDÎN ZAZA Û KURTENIVÎSEK LI SER ÇÎROKNÛSIYÊ

Edîp POLAT37

DESTPÊKA QONAXA NÛJEN A ÇÎROKNÛSIYA KURDÎ; ÇÎROKÊN KU JI RENGÊ SOR Ê KESKESORÊ HEZ DIKIN

Sîdar JÎR39

DI ÇÎROKNÛSIYA KURDÎ DE PÊL

Yaqob TILERMENÎ41

BIRANÎNA KOÇKIRINA 17 SALIYA

Dr. NÛREDÎN ZAZA

Mihemedê SEYID HUSÊN.....43



Weşana Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Kovara Dumehane
Hejmar 14
Gulan - Pûşper 2007

Xwedî & Berpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise ŞÎRÎN - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENÎZ

Mizanpaj & Berg
Azad ZAL -Mîran Janbar

Şewirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
DIYARBAKIR

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:

www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:

Nava Welat, salek: 20 YTL
Welatên Dereke, salek: 60 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:

Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li wxediyên wan nayên vegeandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji Edîtor,

Xwendevanên Hêja,

Kovara W di hejmara yekemîn de wekî destpêk rêgez û rêçika xwe bi vî rengî diyar kiribû: "Kovargerîya kurdan a li bakur, di sala 1990'î de bi destpêkirina weşana kovara Rewşenê teqlekî nû û xurt da xwe û reng û dirûvekî dîtir girt; ji bo me, ji bo gelek xort û ciwanên wê gavê, bû zêrê ku em lê nedigeriyan, lê bi dîtina wê bi kêmasiyeke xwe ya jiyânî ku ji bo me bivê nevē ye, pê hisiyan û me ji qîmet û hêjahiya wê fêhm kir. Em pê re jî neman, me ew hemêz kir, me jê hez kir û me ew di xweştirîn quncê dilê xwe de bi cî kir; em hatin gihîştin roja îroyîn. Û em bûn encam û serencama wê dem û qonaxê. Belê, em yazdeh dil, yazdeh pênûsên kurdîhez û wêjehez, hatin cem hev û me biryara weşandina kovareke bi kurdî da; ji bo ku em bikaribin vê kakil û naveroka ku di me de çêbûye, şîrîntir û xurtir bikin da ku naverok û encamên dîtir jê çêbibin. Me xwest ku em jî bi ruhekî nû û bi rêbazeke dîtir tev li geşkirina vê qada hanê bibin û heta ji me hat, em bi belavkirina xwîna teze ya li reh û koka wê, wêjeya kurdî xurtir û bihêztir bikin..."

Ji Rezbera 2004'î heta Reşemiya 2007'ê li ser vê rêçikê û van rêgezan 13 hejmar hatin weşandin. Di rûpelên 13 hejmarên Kovara Wyê de ji sed kesî zêdetir nivîskar, helbestvan, wêjevan, lêkolîner, hunermend, wergêr û hwd. bi lêkolîn, berhem, aferînek û wergerên xwe rûpelên Kovara Wyê xemilandin. Ev jî di kovargerîya Kurdî de gihîşte asta kevneşopiyê. Ji ber vê jî diviyabû ku reng û dengê vê kevneşopiyê bêhtir berfireh û dorfireh bibûna. Ango bi hewl û xebata kesî heta cihekî diçû ji demekê şûnde diviyabû bi rengê saziyeke neteweyî ya ku ji nêzîkahî û bertekên kesane dûr bihata hilgirtin. Ev jî bû sedem ku Kovara W fetlekê li xwe bide û bigihîje asteke bilindtir û dorfirehtir. Her kesê/a ku bi nivîskarî, wêjevanî, lêkolîn, helbest û çîrok û zargotina Kurdî re mijûl e xwe bi reng û dengê xwe bikaribe bi serbestî îfade bike. Berhem û aferînekên wan kesan di ser kovara Wyê re bigihîjin xwendevanan. Belkî mirov bibêje dest guhert ne rast be. A çêtir ew e ku mirov bibêje milên ku diketin binî vî barî her zêde bûn.

Belê, Kovara Wyê ji hejmara 13'mîn û şûnde di bin banê Enstîtuya Kurdî ya Amedê de li ser vê kevneşopiyê xwe ew ê jiyana xwe bidomîne... Ev jî wek pêdiviyê li cih jî aliyê kadroyên Wyê û berpirsên Enstîtuya Kurdî ya Amedê ve hate dîtîn... Enstîtuya Kurdî ya Amedê xwe da binî vî barî û ew hêz di xwe de dît ku ji hejmara 13'mîn û şûnde berpirsiyariya Wyê bigire ser xwe.

Enstîtu vê hêzê ji rewşenbîr, nivîskar, helbestvan, wergêr û kurdîhezan digire. Yên ku heta niha milên xwe dabûn ber vî karî wê ji niha û şûnde jî xwe bidin ber vî barî. Wê di bin banê Enstîtuyê de derê, wê bi navê Weşana Enstîtuyê derê, lê di bingeha xwe de hêzdarên Wyê, bargirên kevneşopiyê kovargerîyê ya Wyê yê kevn û nû in. Her wiha ew kurdîhezên ji dil, nivîskar, rewşenbîr, helbestvan, wergêr, lêkolîner û berhevkarên Kurd ên her çar aliyê dinyayê ne.

Ji bo ku ji niha û şûnde Kovara W bi awayekî rêkûpêk û hîn xurtir weşana xwe bidomîne em li benda alîkariya nivîskar, rewşenbîr û kurdîhezan in.

Xwendevanên Hêja,

Bi hejmara 14'emîn em derketin pêşberî we. Em hêvîdar in li gor daxuyaniya ku me berê dabû û li jorê jî we xwend, me hejmareke bi rêk û pêk û dewlemend gihandiye ber destê we. Di vê hejmarê de wek mijara dosyayê me nûnerê çîroknûsiya nûjen a kurdî Nûredîn ZAZA û çîroknûsiya wî girt dest. Di dosyayê de Nûredîn ZAZA û çîroknûsiya wî ji gelek hêlan ve hatiye nirxandin. Dîsa di dosyayê de nameyên wî yê destnivîskî cih girtine. Bi baweriya me ev belgeyên dîrokî ne û diviyabû bigihên ber destê xwendevanên kurdî.

Çîroknûsiya Nûredîn ZAZA ji aliyê Firat CEWERÎ, Dilawer ZERAQ, Edîp POLAT, Yildiz ÇAKAR, Lal LALEŞ, Sîdar JÎR, Yaqob TILERMENÎ û Mihemedê SEYID HUSÊN ve ji gelek aliyên ve ji hev hatiye veçirandin û nirxandin. Wekî din jî 3 nivîsên wî bi xwe di dosyeyê de cih girtine. Em hêvîdar in ku me Nûredîn ZAZA û çîroknûsiya wî baş nirxandiye û baş daye nasandin.

Ji xeynî dosyeyê hûn ê di kovarê de rastî nivîs û berhemên wek çîrok, hevpeyvîn, helbest û nirxandinê jî bên. Ku ew jî her yek bi hêjahiya xwe rûpelên Wyê dixemilînin. Em bawer in ku me hejmareke têr û tije gihandiye ber destê we û hûnê biçibînin û jê memnûn bimînin.

Her çiqas di hinek hejmarên berê de kovar bi tevahî jî mijarekê re hatibe veqetandin jî ji niha û şûnde em ê ve yekê nekin. Em ê beşeke kovarê ji bo dosyeyê veqetînin. Ango di her hejmarê de wê dosye hebin. Heta ku ji destê me bê em ê kes, heyam û herêmên ku bandor li wêjeya kurdî kirine û berhemên nixdar afirandine bikin mijara dosyeyan û ragihînin we. Beşên din jî em ê wek ku me di vê hejmarê de jî kiriye em ê ji xebat û berhemên wekî din re veqetînin. Di hejmara 15'emîn de em ê wekî mijara dosyeyê Ereb ŞEMO û roman-nûsiya wî bigirin dest. Em li benda alîkarî û nivîsên kesên têkildar in.

Heta hejmareke din bimînin dixweşiyê de.....

WYÎSTAN

Mizgîn AYDIN



Wyîstan: Ez niha di dilqê çivîkeke payîzê de li deriyê Wyê dixim û xwe davêjim bextê hemû Wyan, da ku bikaribim gotinên xweş û baş berhev bikim ji dinyayê, ji xemê, ji dara maziye, ji bêdengiya şevê...

Beriya ku **W** derkeve ser dika dinyayê, min di helbesteke xwe ya dirêj de (bawer im hûn ê bikaribin ji rûpelên kovara me bixwînin) gotibû: “Navê min W ye niha”. Dû re min navê Wyê bihîst û pê gelek şad bûm. Lê min heya niha qet xwe bi dengê bilûrekê an jî bi keştiyeke bê kaptan negihîştand Wyîstanê. Ji ber vê ez niha gotineke derengmayî me, hatineke derengmayî. Lê ez ê xwe bibexşînim. Ji kerema xwe re hûn jî min bibexşînin, dibe?

Dilopên Avê

Dibêjin ku bîra dilopên avê jî heye. Mînak: dangan di navbera xwe de dihevin û demên dirêj vedişêrin. Di bîra xwe de dihelin. Gava ku mirov li gor vê rastiya zanistî dirame herî pêşî çemên Kurdistanê yên şahidên pirkujî, xwekujî û evînkujiyê tene bîra mirov. Bi rastî jî ku mirov bikaribûya dilopên avên Kurdistanê guhdar bikira, dê ji me re bi hezaran çîrokên di bîra xwe de dengên, di naveroka xwe de bigotina. Lê gelo dilopên avê cih nadin çîrokên me zindiyên jî. An jî em çawa tene bîra dilopên çem û kaniyên xwe?

Hespên Serxweş

Derhênerê me yê heja Behman Gobadî filîm û tège-

heke nuh ango “**Hespên Serxweş**” diyarî bîr û çavên me kir. Lewre berê, hespên me yên serxweş jî tune bûn, her çiqas ku berfa me hebû jî. Ya rastî em kurdên hesphez, ji hemû çîrokên hespan hez dikin. Ji ber ku dilê her yekî/ê ji me di xewna hespekî azad de dibeze, dibeze... Ku em nikarin bibezin jî, ew hespên azad, dilê me di xewnên xwe de dibezînin. Min got ‘ku’ lê dibê me qey jixwe ji bo ku em nikarin bibezin, dilê xwe diavêjin xewnên wan hespan. Lewre dil bîaqil e. Lê ku Gobadî wan hespên me yên dost û dîlkêş jî serxweş bike, em ê çî bikin? Dê hingê dilê me di xewnên wan hespên serxweş de çî bikin? Lê dizanim, bedel çî dibe bila bibe, ne dilê me dev ji hespên azad berdide ne jî xewnên wan dev ji me berdidin. Loma jî bi risteya “Siwaro! Derbas be!” xatir ji we dixwazim û dibêjim ku hûn di vê dema “super teknolojik” de jî, ji xweşîktî, dînîtî, azadî û siwariya hespan bê par nemînin. Hespno! Me bê xewnên xwe yên azad nehêlin! Ji ber ku bêhna azadiyê tenê ji we tê êdî.

Kadiz

Kadiz an jî bi gotina hin “kurdnasên” me “rêya kayê(!)” di bîra mirovahiyê ya Mîtosî de xwedî cihekî girîng e. Û girîngiya xwe jî, ji şîrê dayîkê û pîroziya wê digire. Ji ber ku fêmkirin û têgihîştina hişê mirov û bi taybetî jî ya jinê, hinek jî bi fêmkirin û têgihîştina şîrê ajalên û şîrê mirovan dest pê kiriye. Her wekî: mirovahî di kesbûna jinê de di merheleya zarokiyê de bûye, lê ji wê zarokiyê jî bi têgihîştina şîrê singê xwe û girîngiya wê ya ji bo gihîştandina zarokan ango

jiyînê derbas bûye, ango weriya ye. Her wiha vêya pîrozbûn û Xwedawendiya jinê jî aniye himatê. Loma jî jin di nîşaneyên Xwedawendiyê de, ji ber şîrê xwe, xwîna xwe û golavbûna xwe (di dema ducanîbûniyê de) wek deryayê hatiye xêzkirin. Mirov di xêzikên li ser kûz, cer û hwd. ên wê demê de rastî nîşaneyên wek pêlan tê ku, carna jî wek pêşîran in ew navgîn û şîr tînin bîra mirov. Her wiha aferînera erd û asîman e jî. Loma rûyên asîman jî bi sembolên wê nexişandî ye. Ango stêrk ronahiya çirayên wê, heyv salnameya bedena wê û kadiz jî şîrê singa wê ye. Lewre jî bi îngilîzî, hêna jî ji kadizê re dibêjin “the mîlkyway” (şîrerê), hindî dibêjin “oqyanûsa şîr” û yewnanî jî dibêjin ku kadiz ji rijîn û herikîna şîrê Herayê çêbûye ku pir nêzîkî kadizê ye. Lê nizanîm çima em kurdên ku di gelek stran, çîrok û gotinên pêşîyan de behsa şîrê dayîkê dikin, ji komestêrka ku gelek civakan ew şîban-dine ‘şîr’ re dibêjin: kadiz? Faris jî dibêjin ‘kakêşan’. Mirov dide ramandinê jî lewre çî karê kayê heye li asîman (çî, we got: “lê çî yê şîr heye?”) an jî diz çî

dikin li asîman, çawa xwe gihandine wê derê? Ka dizîne û ji tirs û lîrê bi rê de jî rijandine? Belê ev binavkirina asîmanî cudatiya feraset û nêrîna me dide xwiyakirin. Gelo dizên herî har, jîr û zîrek ên me kurdan bûne ku çûne heya asîman û kadiz çêkirine ji me re?

**ev
binavkirin
balkêş e û min
xwest ku em bi
van çend nîşeyan
be jî, vegerin
kadiza zaroktiya
xwe, û em wê
bînin bîra
xwe**

Çîroka wê wiha ye lê gelo nabe ku ji ber şîbîna rengê kayê, ka-ji-wê-derê-dizê gotibin kadiz? Nizanîm, lê ev binavkirin balkêş e û min xwest ku em bi van çend nîşeyan be jî, vegerin kadiza zaroktiya xwe, wê bînin bîra xwe. Birastî dibêjin ku ji ber ronahiyên mezin, êdî asîman baş naxuyê û kes lê mêze nake. Ango asîman jî ne asîmanê berê ye. Lê belkî hêna jî asîmanhez hebin û ji kerema xwe re van çend gotinên li ser kadizê bixwînin. Û jixwe pîrs, meraq, nêrîn û çîrokên zarokiya me hemûyan ne li asîman in hêna jî. Kî çî dizane, belkî me ka jî diziye, şîrê Herayê jî rijandiye di zarokiya xwe de. An na wê çima kadiz hebûya?

DI GOTINÊN PÊŞIYAN DE

AV

YÊN DINYAYÊ

- *Wextê bîr çikiya, wê bihayê avê bê zanîn
SCOTLANDÎ
- *Kesê kû ji bo avê jî mûn be, bimire baştir e
HINDÎ
- *Ava boş, dengê wê kême e.
HINDÎ
- *Av her çiqas giranbiha be jî, dema genî bû, divê bêt rêhtin
ÇÎNÎ
- *Kaniya avê her çiqas dûr be, tu gavên xwe dirêjtir bike
EFRÎQÎ
- *Mirov ji avê çêdibe, lê bi nanî zindî ye.
JAPONÎ
- *Ava di cihê de çûyî, êdî venagere.
FARISÎ
- *Dilopa avê, kevir kun dike.
RÛSÎ
- *Av û agir, ji her tiştî baştir cihê xwe vedikin.
ELMANÎ
- *Ava sekinandî aş nagerîne.
SPANYOLÎ

YÊN KURDÎ

- *Ava zordaran berjor diçe.
- *Av ji serê kaniyê şêlû ye.
- *Ava bin kayê ye.
- *Avê li wî destî bike ku destê te bişo.
- *Av di cihê teng de deng dide.
- *Ava sekinî, bêhn jê tê.
- *Ava boş, deng jê nayê
- *Av di golê de genî dibe.
- *Av di serkaniyê de şêlû dibe.
- *Av diçe lê aş li cihê xwe dimîne.
- *Av ji kaniyê û nan ji baniyê.
- *Av şûna nan nagire.
- *Av û agir radizên lê dijmin ranazê.
- *Ava bin kayê deng jê nayê.
- *Ava golê dimîne heta salê.
- *Ava hêdî me ecêb jê di.
- *Av bi bêjîngê nayê civandin.
- *Ava xurt serevraz diçe.
- *Av di ciyê gels de diqete.
- *Av di golê de bimîne wê genî bibe.
- *Av heta girav nebe zelal nabe.
- *Av ji çiyayan diherike li newalan xwe dide der.
- *Av ji serê sukur de ziwa dibe.
- *Av rabû sukur û bend belav bûn.
- *Ava bîran bi tevdiran.
- *Ava cemidî ji kaniya qut nabe
- *Ava xwestî naçe serî
- *Ava zelal tê de xuya ye xem û xeyal

Zeriya Zîz Newroz

Kurikê Egîd Adar

Adil ZOZANÎ

Ji bo her kesekî/ê efsaneyeke Newrozê heye, ji bo min jî wisa ye. Efsaneyeke min jî ya ku Newrozan ji bo min vedibêje heye. Lehengên min jî wekî yên her kesî/ê ku Newrozê vedibêjin hene. Lehengên min ên ligel taviyên barana biharê di nav rondikên xeman de xerq bûne hene. Dilê wan tije kul û keser, asoyên wan teng bûyî... Nizanim, di lîteratûrê de bêjeyeke ku kul û keseran her wekî ji dilê lehengên min ên Newrozê diherikin rawe dike heye an na? Ez gelekî li ser hûr û kûr fikirîm, lê; min bêjeyeke ku wan kul û keseran vedibêje peyde nekir. Paşê navên lehengên min di nav rêzikên nivîsê de afirîn. Raweya kul û keseran darişt ser kaxezê. Adar û Newroz...

Adar û Newroz 2 hezar û 619 sal berya niha di 21'ê adarê de hatibûn cem hev û di navbera xwe de sohbetek dikir. Dabaşa wan a li ser pîrozbahî û wateyên li pîrozbahîyan bar dikir ez ber bi raweya kul û keseran ve birim. Adar û Newroz di navbera xwe de dipeşint û diheraft. Adar digot 'ez mîlada te me'. Newrozê jî digot; 'Naxêr, heke ez nebûma navê te jî nedibû.' Dabaşa di navbera wan de li ser vî şeweyî vekîşiya û min jî ew guhdarî kirin.

Adar: Ez xemla biharê me. Gul û kulîlk li ser dilê min şîn dibin. Baranên hemû demên salên wêranker in nebin, ên ji ser dilê min diherikin ku giyan didin miriyan. Ewrên hemû demsalan hestên xerîbiyê ava dikin, yên ji ber hilma min diherikin mizgîniyan... Ava keviyan xwe ber bi rihên xwezayê ve berdidin û hestên nû şîn dibin. Heke ez nebûma ne 'sîng û debana yarê dibû zozanên Feraşînê û ne jî li ber memikên yarê cotê reşgamêşan dixwar taştê û şiv.' Ne jî dengbêjekî ku van bendan bi ser bedewiya yarê de bîne dibû.

Newroz: Heyranê dil, maqûlê ber memkên dayikê, Adarê xweşnav! Ji bilî dayikan ku kes nizane jana

bûnê. Roja min Kawayê Hesinkar naskîrî hê tu nehatibûye navkirin. Kul û keserên ji dilê wî diherikin wekî çemê Feratê bi hêrs, wekî çemê Dîcleyê melûl bûn... Salnameyeke ku em rojbûna te li ser îşaret bikin tune bû.

Newrozê pê li rastiyeke dikir. Salnameya ew qala wê dike tekane salnameya ku ji aliyê her kesekî ve wekî salnameya destpêkê tê zanîn e. Mirovahiyê tekane salnameyeke hevbeşkirî heye. Ev jî ji 21'ê adarê dest pê dike. Hinek gel wê wekî salnameya Mohriyê, hin jî wê wekî salnameya Horoskop bi nav dikin.

Adar: Ligel xemla biharê li min teşe digire, rengê xemê û yê şeng û şoxiyê di hembêza min de digire, xwe nû dike. Her sal ji nû ve diafire. Ligel vê afirînê tu jî têtî. Lê tu wekî zeriya zîz î.

Lê navkirina zeriya zîz li Newrozê giran hat. Kul û keser xistine dilê wê û ew bi nav kûrahiya dîrokê de bir. Lehengên wê yên carînan li Amedê, carînan li Nînovayê, carînan li Kobanê, carînan jî li Mehabadê xwe spêrtiye guliyên agir û agir harkirî hatin bîra wê. Ji Nînovayê Kawa, ji Bexdayê Leyla, li merxeb Rahşan, li zîndanên Mazlûm hatin ber çavên wê. Li ser bircên Amedê guliyên Zekiye di nav baskên agir de gur bûn û li şêrê bibask siwar bû û firiya ber asîman.

Gotina Adar li Newrozê giran hat. Zîzbûn karê zeriyan eşîrî ye. Lê ew xwe aydê qirneyekê jiyana civakî nabîne. Dibe ku hinekî zîzbûna Newrozê hebe. Lê zîzbûna wê aydê tu dewr û deman nîn e. Ev jî nav qirneyan neafiriye. Qirne di hembêza Newrozê de afirîne.

Newroz: Her gelê ku cejna min pîroz dike, li gorî xwe efsaneyekê jî li min tîne. Tu jî wisa dikî. Lê efsaneya ku ez li xwe tînim tu kes meraq nake. Çima wisa ye? Rast e hinekî zîzbûna min heye. Gelo ez çima wisa zîz bûme? Qet te ji xwe pirs kiriye? Na... Tu serê xwe bi tiştên wisa naêşînî. Lewma li te jî hêsan tê, hema ji min re bibêji zîz û xwe vederî aliyekî bikî. Rastî ne wisa ye, her wekî tu dibêji! Ne diyar e ku tu dê bixwazî rastiye jî guhdarî bikî. Ez dê çirokekê ji bo te vebêjim. Tu bersiva xwe di nav çîroka min de peyde bike.

Çîrok ev e:

"Peyva Newrozê ji du bêjeyan pêk tê. 'Nû-Roj'. Di vê rojê de şev û roj wekhev dibin. Roj ji birca masiyê derdikeve û dikeve birca beranî. Ev bûyera xwezayê di 21'ê Adarê de pêk tê. Her çiqas ji vê rasthatinê destpêka biharê hatibe fêmkirin jî di kûrahiya wê de li hemberî zilm û zordariyê serhildan jî hatiye

fêmkirin. Zilm û zordarî bi dawî dibe û têgehên heq, hiqûq û edalatê derdikevin pêş.

Hewce ye ez li vir qala Zerdûşiyê bikim. Ji ber ku ev aliyê Newrozê her dem li tariyê hatiye hiştin. Di bingeha vê baweriyê de; ked, hilberîn û qezenca helal hebû. Di vê baweriyê de xweza pîroz e û qurbankirina ajalan hatiye qedexekirin. Li gorî hewcehiyê mezextin esas e. Ji derveyî xweparastinê li hemberî şîdetê ye. Di dema koletiyê de jinê bi hemû awayan girîngiya xwe wenda kiriye, lê li gorî baweriyê Zerdûşî mirovbûna jinê hatiye parastin. Di Zerdûşiyê de têkiliya evd û Reb tune ye. Zerdûşt hin caran ji Xwedayê qenciye Ahûra Mazda hesabê dipirse. Radestbûna perestgehan an jî bê şert girêdana bi qralên xweda nayê qebûlkirin. Hewce ye ku îradeya mirov esas bê girtin. Ji ber vê yekê tê fikirîn ku ji bo wê demê şoreşa herî mezin a ramanê pêk hatiye. Li herêma ku ev bawerî lê serwer bû gel ji qral Cemşît bi gazinc bû û rayedariya wî ruxuya û qralê zalim Dehaq li cihê wî rûnişt. Dehaq di demeke kurt de bi zilm û zordariya xwe nav da.

Li gorî efsaneyê şeytan di rûyê aşpêj û xizmetkar de xizmetê ji bo Dehaq dike. Ji bo wî xwarinên xweş çêdike. Ji ber vê yekê Dehaq ji wî pir memnûn e û jê re dibêje heke daxwazeke te hebe ez dê bi cih bînim. Şeytan jî wê yekê wekî fersend bi kar tîne û dixwaze her du milên Dehaq maç bike. Dehaq jî destûr dayê. Şeytanî piştî her du milên Dehaq maç kir ji holê wenda dibe. Li her du milên Dehaq, li derên ku Şeytanî maç kirin du mar peyde bûn. Dehaq maran dide birîn. Lê çi qas maran dide birîn jî dîsa dertên û janên mezin didin wî.

Hemû hekîmên welatî tîn vexwendin, lê çareyek ji bo derdê wî peyde nabe. Şeytan vê carê di rûyê bijîşk de tê qesra Dehaq. Jê re dibêje ji bo ku ev jan bi dawî bibin divê her roj mêjiyê mirovan bidin van marên li ser milên wî derketine. Tu guman pê navê Şeytanî xwestiye li hemberî mirovahiyê nebaşiyên mezin bêne kirin û ew gihîştîye armanca xwe.

Dehaq demildest emir dide; her roj du ciwanan tînin qesrê, serê wan jê dikan û mêjiyê wan bi maran didin xwarin. Di nava demê de qetilkirina bi hezaran ci-

wanan di nava gel de dibe sebebê nerazîbûnê. Gel di nava tirs û xofan de ye.

Du mirovên baş ên di qesra Dehaq de aşpêjî dikir, Armaîl û Karmaîl, ciwanên ji bo serjêkirinê dianîn diveşartin û li cihê mêjiyê wan mêjiyê du mihan ji bo Dehaq dibirin. Ciwanên ji mirinê rizgar dibûn derdiketin çiyayan. Tê gotin ku ev rewş bi salan wisa domiya ye.

Hesinkarê bi navê Kawa ji 12 kurên xwe 11 jê dabû Dehaq û hatibûn serjêkirin. Rojek hat kurê wî yê mayî jî jê hate xwestin û wî li hemberî vê yekê serî hilda. Gelê xwe û ciwanên ku bi salan e derketibûn çiyayan birêxistin kir û bi hev re êrîş birin ser qesra Dehaq. Serhildana bi rêberiya Kawa pêkhatî biser ket. Qesra Dehaq xist bin destê xwe û Dehaq jî kuşt. Qralî da Ferîdûnê bi edaleta xwe tê nasîn.

Her wekî tê zanîn ku di Zerdûşiyê de agir pîroz e. Ji ber vê yekê serkeftina serhildanê bi vexistina agirekî mezin hate pîrozkirin. Ev roj li gorî salnameyan beriya mîladê roj 21'ê Adarê sala 612'ê nişan dide."

Ango Adar! Çîroka ku tu wekî efsaneyê dizanî di heman demê de rojbûna te ye. Li min binihêre û di nav awirên min de xwe bibîne.

Adar: Erê tu rojbûna min bi xwe nav dikî lê mirinên di nav baskên agirê xwe de çawa nav dikî? Gotineke te ya ji bo vê yekê heye gelo?

Newroz: Baskên min ên ji agir pêk tînin ji ber ku tovê Dehaqan neqeliya hembêza xwe li ber mirinê vekirî hiştine. Loma, agirê min ji xweliya sar a kul û keseran xwe afirandiye û li hemberî zordariyê bûye bingeha raperînê. Zîzbûna min ji hebûna Dehaqan diqewime.

Kul û keserên ji efsaneya Newrozê dariştine ser kaxezê encax bi vejîna efsaneya Newrozê bê vegotin. Gotina Newrozê ya ji bo Adar wekî jeha qesra Ferîdûn a ku ji Dehaq re bûye goristan li jiyana bûye xetîre. Û Adar jî vê rastiye qebûl dike egîdiya xwe dispêre Newrozê.

Xewneke Şîrîn

Behlûl ZELAL

Çîyayê ku xwe lê girtibûn îro ji her rojê bilindtir, ji her rojê xweştir, ji her rojê hêniktir bû. Başûrê çiyê, deşta Nisêbînê bû. Çiqe çiqe germa deştê, serê çûkan li hewayê dibiraştin. Di demsala havînî de, bi rojê çiqas germ bû; bi şevê jî ew qasî hênik bû. Hênik, lê çawan hênik? Hênikahiyeke wisan ku ew germa rojê ya dojhê dida jibîrkirin. Hênikahiyeke wisan bû ku dema bayê li rû û laşê mirovî dixist; mirov pêre pêre nola ku ji xwe ve biçe bi xewê ve diçû.

Esra teng bû. Memyan hinekî li paş mabû. Hevalên wî rabûbûn ser xwe, bi rê ketibûn; wî hîna jî li aliyê başûr, li gundên Qamişloyê dinihêrî. Berê xwe diguhert, fikir ku ew jî li pey hevalên xwe biçe lê hişê wî li paş, li aliyê xaka ku lê hatibû dinyayê dima. Ne pir, di saetekê de, bi meşê, wî dikaribû bigihê gundê xwe yê di binya xetê de. Di saetekê de wî dikaribû bigihê diya xwe, bavê xwe, xwişk, bira û hemû mirovên xwe. "Heke di navberê de, mayin tunebûna, têla direhî, nobedarên xedar, xêzikên sînoran yên ku mîna şûrekî tûj û dirêj seranserê welêt kiriye çar wesle... Welat çar wesle, dil, mêjî; sed, hezar wesle." Him bi giranî dimeşîya him jî li ser rewşa welatê xwe difikirî...

Geh ber bi hevalên xwe ve dimeşîya geh radiwestiya dîsa dîsa li pey xwe, li başûrê dilê xwe, li kaniya jiyana xwe melûl melûl dinihêrî. Roj ber bi êvarî ve diqulibî. Navê vê dera ku lê rûniştibûn Ferşa Melê bû. Bilindtirîn lûtkeya Çiyayê Bagokê ev der bû. Mele, di rojê jî rojên biharê de, ji deştê diçe torê. Dema digihê vê derê, derdikeve ser kevîrê mezî û pehn ku navê 'fers' jê wergirtiye û geh li aliyê torê dinihêre geh li aliyê deştê. Bihara salê zaf xweş e, zevî

seranser geş bûne. Ceh û genim digihên qama siwaran. Ji kêfa zekata ku dê îsal bigihê gêj dibe, xwe winda dike; ji nişka ve ji ser latê noqî erdê dibe. Mele di heman kêliyê de, ne dide û ne distîne. Loma şênîyên vê herêmê navê vê derê kirine "Ferşê Melê"

Roj diqulibî êvarî. Bayekî hênik dest pê kiribû. Ronî hin bi hin kêmbû, tariyê cihê wê werdigirt. Morî, perperok, mêş, kêzik, kêroşk, rovî, pezkovî, kew, tivîlk, sûsik, her cure teyr û tilûr, her cure ajalên ku Çiyayê Bagokê ji xwe re kirine war, hêdî hêdî ber bi hêlînên xwe ve dikişîyan. Ma ev çiya tenê ji ajalên re bûye cih û war? Gelek kurên dê û bavan, li vî çiyayî; bi rojan, bi mehan, bi salan bûne mêvan. Lê vê carê, ne tenê kur, keçên dê û bavan jî ev çiya ji xwe re kirine hêlîn, ji xwe re kirine hêvî.

Memyan îro pir kêfxweş bû. Ligel kêfê ew hinekî xemgîn jî bû. Erê, ew îro bi telefonê bi diya xwe re axivîbû, bi xwişka xwe re û bi biraziyê xwe re. Memyan bavê xwe xwestibû ser telefonê lê diya wî gotibû, "Bavê te çûye Qamişlokê, ne li malê ye." Derfeta telefonê her tim tune bû. Ji roja ku ji malê derketibû, ev du sal û nîv bû, yekem car bû bi malbata xwe re axivîbû. Pir pir kêfa diya wî, xwişka wî, biraziyê wî hatibû. Diya wî giriyabû.

"Min gelekî bêriya te kiriye kurê min, tu çawan î, hûn çi dixwin, çi vedixwin?" hevokên wê nîvco mabûn. Kelegirî bûbû, xwişka wî, telefon ji destê diya xwe girtibû. Bi xwişka xwe re bêhtir axivîbû. Lê piştî çend hevokên lihevpirsînê ew jî kelegirî bûbû. Di dawiyê de gotibû "Gulnazê her roj pîrsa te dike." Û peyre telefon dabû biraziyê xwe yê şeş salî ku nedihat bîra wî, apê wî kengî çûye û nizanibû çûye ku derê, çi karî dike. Tenê wî apê xwe ji fofrafin dinasî. Her roj û her gav jê re digotin; "Binihêre, ev apê te yê Mihemed e". Navê wî yê kevin digotin, navê nû qet bilêv nedikirin. Wî jî gotibû: "Tu yê kengî bêyî malê? Tu çima nayêyî malê? Zû were malê."

Nola ku êşek di bedena mirov de be û ji bedenê derkeve, nola ku cihekî êşiyayî rihet bibe; bi vê axaftina telefonê serê wî wisan rihet bûbû. Lê hema di dilê xwe de digot:

"Xwezî, xwezî ez bi bavê xwe re jî bi axiviyama, heta careke dî Xwedê mezî bû."

Hevalên wî xuya dikirin. Ji aliyekî ve li axaftina têlefônê ya îro bi malbata xwe re diramiya, hevok, peyvik yek bi yek di hişê xwe de dubare dikirin, carina di hinan de radiwestiya, ew bi dengê nîzîm bilêv dikirin, ji aliyekî ve jî hevalên xwe dişopand. Carinan kêfxweş dibû, rûken dibû, carinan jî xemgîn dibû. Henaseke kûr dikişand. Pîranî jî gotina ku xwişka wî gotibû "Gulnazê her roj pîrsa te dike." Ji bîra wî nedişû. Roja dawiyê dema ku xatir ji hev xwestibûn; bi her du destên hev girtibûn, pişt re hev û din hêmbêz kiribûn, hêstirên Gulnazê bi rûyê Memyanî ve herikîbûn. Dema ev dîmen bi bîr dianî; laşê wî dilerizî, germahiyekê digirt ser laşê wî, dilê wî bicoş lêdixist. Ji xeyalekê derbasî ya din dibû. Dê rojek bihata; ew dê vegeriya malê. Dê hemû gundî bihatana pêşiya wî. Di sêrî de diya wî, bavê wî, gelo çima bavê wî ne li malê bû? "Tişteki nebaş nehatibe serê bavê min? Na na..." Bi lez xwe jî vê pîrsê, jî vê ramanê bi dûr dixist. Pişt re hemû xizmên wî, heval û hogirên wî. Pişt re delala dilê wî, Gulnazê... Na, na li wê derê nedibû, dê pişt re li cihekî din, nola roja ku xatir ji hev xwestibûn hev û din hêmbêz bikirina. Dê hemû serpêhatiyên xwe vegotina, dê şahiya serkeftinê li gund li dar bixistina. Pişt re dê rêveberiya gund û

rêveberiya her karî hîlbijartina. Dê jiyaneke nû, jiyaneke birûmet, jiyaneke xweş dest pê bikira... Di-viyabû her tişt, her tiştî ji nû ve dest pê bikira...

Di nav xeyalên rengîn û xweşik de, di nav xewneke şîrîn de, di nav tarî û bêdengiya çiyê de diherikî Memyan. Çavên xwe miç dikirin: Wî û Gulnazê bi destên hev girtibûn, ketibûn serê govendê. Kesên li dora wan, destên xwe diavêtine çekên xwe.....

Çavên xwe vedikirin: Hemû darên berû, hemû latên vî çiyayî bûbûne reşahî. Reşahiya mîna zilaman. Zilamên destbitiving. Dengê tivingan guh lê ker kiribûn. Ji serê daran, ji binê latan, ji ser zinaran, ji her aliyê çiyê ve agir dibarî.

Dengê tivingên reş bêdengiya çiyê çirandibûn, li Deşta Nisêbînê, di nav tîlên direhî û narîncokên nepenî de; bînxet bûbû, li nav gund û şênîyên Qamişlokê olan dabû.

Avrêl 2005 / Amed

e-mail: b.zelal@mynet.com



Lampe

Amed Ç. Jiyan

Qey ew roja qiyameta ku di pirtûkên pîroz de behsa wê dihat kirin, îro bû. Na, ev qiyamet ne ew qiyameta di pirtûkên pîroz de behsa wê dihat kirin bû û qet nedişibiya qiyamet û mehşerên di çîrok û derewokên pîrên rûqermîçî û çavkûs de dihatin qalkirin. Qey Star êdî ne navê Xwedê bû û ew navê ku tirs û rehetî dixist dilê mirovên hejar, ji listeya navên Xwedê hatibû birin û Xocê Xizir newêrîbû bibe bersîva hawar û giliyên mirovên şepirze û bê çare. Mirovên reben...

Ji asîmanên ku bi ewrên reş û tarî hatibû girtin, aferîdeyên kinik û hûrik, aferîdeyên ku diyar nedibû ka zarok û sebî ne an jî ecûc û mecûc in, tîrên zêrîn ku bi dûvikên wan ve çavên bi xwîn hebûn, dibarandin ser rûyê erdê. Ji cihên ku dibûn armanca tîrên qiyametê, agirêkî sor, agirêkî bi dû û dûxan bilind dibû. Dema ku tîr li kevîr û tehtan diketin, ew kevîr û teht pêşî diheliyan û dibûn av û dû re wekî ava li ser êgir dikele, dibûn dûxan û hildikişiyên ewrên reş û tarî... ewr reştir û ronahiya heyî qelstir dikirin. Her ku dinya tarîtir dibû, hejmara tîrên dibarîn zêdetir dibû. Dinya ji ber tîrên qiyametê, wekî kefa destê mirov dûz dibû... Ne tehtek ne girek ne jî çiyayek ji ber xezeba tîran difilitî. Li ser rûyê erdê deşteke fireh hatibû pê. Mirovên ji bo ku nebin armanca tîrên zêrîn, pê li hev dikirin û hev diperçiqandin. Qêrîn û hawara jin û pîrên di bin lingan de diperçiqîn tevî qêrîn û hawara kesên ku ji bo tîran dibûn armanca dibû.

Ji bo ku ji xezeba sebiyên di destê wan de tîrên zêrîn hene bifilite, bi hemû hêza xwe, ber bi cihên ku ewrên reş û tarî hê xwe negihandibûnê ve dibeziya. Her kes wekî wî bi cihên bê sih de dibeziya. Mirovên ku li hev diqelibîn, heke zû ranebûna ser xwe û ji barana tîran nereviyana, dişewitîn, dibûn av û dû re tevî ewrên reş dibûn. Çiqas ji navenda siha ewran dûr diketin, hejmara tîrên qiyametê yên bi ser wan de dibariyan kêmbû. Lê her ku hejmara mirovên dimirin zêde dibû, ewrên reş û tarî zêdetir cih dixistin bin siha xwe. Û tîr zêde dibûn bi her mirinekê.

Her gaveke ku diavêt ji gava berê biçûktir dibû, êdî tu hêz di canê wî de nemabû ku baz bide. Lê rev diviya, diviya ku xwe bigihîne cihên sahî. Li nava çavên rebenok ên jin û pîrên li der û dora wî tera bûne û dinalin nihêrt û gavên xwe firehtir kir û qîriya... Ya Rebî Staaaaaaar... Bi qêrînê re tîrek li ser dilê wî ket... û tîreke din li mejiyê wî... Tera bû erdê, laşê wî germ bû. Di bedena xwe de şilbûnek hîs kir, ji eniya wî, rûyê wî û hemû laşê wî aveke germ ber bi jêr ve herikî û êşeke nedîtî kete mejiyê wî.

Dema ku ji xew hişyar bû, Kotan li ber serê wî sekinîbû û rûyê wî dialast. Bi carekê ji cihê xwe hilpekiya. Bi hilpekîna wî, Kotên dûvê xwe xist nav lingên xwe û bi ûsteûst reviya. Ji bo ku tişteki ji rewşa ku tê de ye derxe, li dora xwe nihêrt. Paşê li asîmanan nihêrt; ewrekî biçûk be jî li asîmanan xuya nedikir; dinya vekirî bû. Li der û dora xwe nihêrt; zinar û gir û çiya li cihê xwe bûn. Destê xwe ber bi ezmanan ve vegirt û ji bo ku her tişt xewnek bû, spasiyên ji dil pêşkêşî Xwedê kir.

Roj ber bi ava ve diçû. Diviya ku ji zû de ketibûya ser riya gund. Ji ber ku ew qiyamet hemû xewnek bû, derengmayîn ev car jê re ne xem bû. Beriya ku cixareyekê bipêçe, li keriyê pez nihêrt. Kerî wekî libên hinareke li erdê ketiye ji hev belav bûbû. Her yek bi aliyekî de çûbû. Gelekên wan heya piştî gir çûbûn û ji çavan winda bûbûn. Piştî cixarê çavên xwe li şiva xwe gerand da ku pezê vir de û wê de belav bûye li hev kom bike û here gund. Li cihê ku şiv lê dît, şopeke balkêş hebû. Xwe bi ser de xwar kir û bi awirên rêçgerîn li şopê nihêrt. Ew ne rêça lingê mirovan bû. Ne dişibiya rêça lingên lawiran jî. Rêç çarqorzi bû û ber bi neqeba girî de diçû. Tiştê balkêş ew bû ku, ji rêçan xuya bû ku aferîdeya rêç li dû xwe hiştine, duling e û her rêçek bi qasî gavekî mirovan ji ya li dû xwe dûr e.

Xofek kete dilê wî. Gelo di navbera wê xewna bisaw û van rêçan de tîkiliyek hebû? Êdî ne keriyê ji hev belav bûye ne jî derengmayîn mejiyê wî mijûl dikir, hiş û bala wî tenê li ser van şopan bû. Van şopan ew xist bin bandora wê xewnê. Çavên wî li erdê, li ser şopan û wekî din û bêhişan ber bi cihê ku şop diçûnê de çû.

Lingên xwe di şûna şopan de bicih dikirin û gavên xwe jî wekî ku şopan dixwest carinan biçûk carinan ji mezin dadikirin. Her ku diçû, navbera şopan firetir dibû û piştî ji neqebê derbas bû bêtî xwesteka xwe, lê di bin bandora şopan de dibeziya. Kes hene li dû şopan diçin, lê kesên din hene ku li dû xwe şopan dihêlin. Ew kî bû an jî çî bû ku di revê de li dû xwe şop hiştibûn? Ji kê an jî ji çî direviya? Baştir bû ku li

bersivên van pirsan bifikire bêyî ku mejiyê wî zorê bidê da ku têkiliyekê di navbera xewn û şopan de dayne.

Bazdana wî êdî ne ji dûrbûna di navbera şopan de bû. Qet xem nedikir ku lingê wî li ser şopan e an jî li derveyî şopan e. Tenê, tenê aliyê ku şop diçûnê xema wî bû. Ji bazdanê hilehilê pê girtibû. Ev girê çendan bû ku derbas kiribû û neqeba çendan bû ku tê re derbas bûbû? Dema gihîşt qûntara çiyê, digot qey gilokeke ji striyan çêbûye xwariye û ew strî, di her gavekê de di nava kezeba wî de digeriyan û wekî hespê Troyê ew ji hundir de têk dibir.

Di odeyeke tarî de hat ser hişê xwe. Li ser nivînekê dirêj kirî bû. Ji bo ku tiştekî ji rewşa ku tê de ye derxe, li dora xwe nihêrt. Her der tarî bû. Çavên xwe di tariyê de çikand da ku hinek be jî, tarî li ber çavên wî ronî bibe. Tiştên herî dawî dihatin hişê wî; şop, neqeb, gir û çiya bûn... û bazdan. Li ser teht û latan, bi bazdan bi çiyê ve hildipekiya. Da ku tiştekî ji rewşa tê de ye derxe, hêdî hêdî rabû ser xwe. Her derê wî diêşiya, zor da xwe ku bimeşe, bi zorê gav diavêt. Hê gava duyemîn danekiribû, ronahiyeke qels ber bi wî de hat. Ronahî hêdî hêdî nêzîk dibû. Her ku ronahî nêzîk dibû, ronahiyê çavên wî diêşand û çavên xwe kûs dikirin. Ronahî ji çiraya destê kalekî rîdirêj dihat. Du kesên din, temenê yê dirêj li dora çilî bû û yê din jî lawikekî kej bû ku hê mûyên simbelê wî zer nebûbûn. Di destê zîlamê dirêj de qetek nan û tasek şorbe hebû. Zîlamê pîr ew li ser nivînê da rûniştandin û nan û tasa şorbê danî ber. Ji ber tevliheviya di mejiyê wî, heya ku çavên wî bi nêr û şorbê neketibû, birçîbûna wî xwe qet nedabû hîskirin..

Dema ku wî wekî gurên birçî êrîş dibir ser xwarinê, zîlamê pîr pêşî got ku wî bi awayekî birîndarbûyî di bin zinarekî de dîtine û anîne şikefta xwe û dû re çîroka xwe jê re vegot. Ew file bûn û ji fermana fileyan reviyabûn. Belkî ji ber ku siûda wan ji yê din çêtir xebitibû, ji mirinê filitibûn û xwe li vê şikeftê girtibûn. Ev pazdeh sal in ku ev şikeft wan ji qirkirinê diparêze. Ji ber ku kuna şikeftê di nava tehtên xedar de ye, tu kes newêre ku bi vê derê de were. Dema ku zîlamê pîr li nava çavên wî dinihêrt û qala qirkirinê di dema fermanê de çêbûbûn dikir, ew xewna bixof li ber çavên wî zindî dibû. Zîlamê pîr bi dûv û dirêjî çîroka xwe ya dilsoj got. Dilê wî bi kesên ku bi tivîngên bisingû hatibûn kuştin şewitî... Nexasim bi zarokên ku xwîna wan bi derbên singûyan belav dibû û bi serê singûyan tevli xwîna diyên wan dibû.

Zîlamê pîr got; “Vaye çîroka me ev e. Em ji wê fermana ku xwînen bi derbên singûyan ji laşan diherikîn û erdê û her der ji xwîna bêgunehan sor dikir, reviyên û em ketin vê şikeftê. Ev şikeft bû stara me. Gelo te li ser van zinarên xedar çî dikir?” Bi dengê çilmisî ku bi zorê dihat bihîstin, got “Şopên çarqorzi... Ez li dû şopan hatim.” Lawikê kej di bin simbelên ku hê şîn nehatibûn de keniya.. Zîlamê pîr, ji bo ku kenê lêwik bisekinîne, bi dengê biwate got; “Şop? Haa. Me ji xwe re solên depî çêkirine û em bi wan solan derdikevin derve. Ji ber ku şopa wan çarqorzi ye, ev solên depî mirovan ji me dûr dihêlin.”

Gotinên zîlamê pîr hinek be jî dilê wî rehet kir. Lê pirseke din di mejiyê wî de çêbûbû. “Te got ev pazdeh sal in ku hûn di vê şikeftê de dijîn. Dem û dewran hat guhertin. Fermana fileyan nema.” Beriya ku zîlamê rîdirêj bipeyive, lawikê kej bi zîmanekî ku nedihat fêmkirin kete nava xeberdanê. Zîlamê pîr pîrsa lêwik got; “Bişev şewqeke mezin li ser gund û bajaran heye. Gelo ew ronahî ji çî tê?” Ji ber ku pîrs ji lêwik hatibû, berê xwe da lêwik û got; “Dibe ku ew ronahiyên xanî û sikakên bajaran bin.... Ronahiyên lampeyan wan.” Zîlamê pîr bi dengê matmayî got; “Ronahiyên lampeyan? Ew çî lampe ne ku ronahiya wan ji çiyayan xuya dibe?”

“Hêêêêêêê!” Bi qêrînên xwişk û birayên xwe hişyar bû. Ji bo ku tiştekî ji rewşa ku tê de ye derxe, li dora xwe nihêrî. Li ser kanapeyê dirêj kiribû. Ji ber ku ev demeke dirêj bû ku elektrîk çûbû, kalorîferê tîna xwe wînd kiribû û xanî sar bûbû. Betaniya ku pîrça wê sê tilî dirêj bû, li xwe lefandibû. Germa betaniyê çavên wî girantir dikir. Gotinên dawî yê ku beriya ku careke din noqî nav xewnan bibe, mejiyê wî tevlihev kirin, qerebalixa bira û xwişkên wî bû.

“Ev çîrok rast bû bavo?”

“Erê rast bû. Zîlamê pîr ji apê min re gotibû. Apê min jî di şeveke sar a zivistanê de ji me re gotibû.”

“Çîrokeke din bibêje bavo, çîrokeke din.”

“Erê bavo çîrokeke din. Diya te here cinetê çîrokeke din.”

“Na, kurê min. Vaye ceyran hat. Gava careke din ceyran çû, ez ê çîroka Varjabed bibêjim. Lê vêga televîzyonê veke da ku li nûçeyan temaşe bikim.”

e-mail: amedcj@hotmail.com

Dil Ji Bo 'te' Evîn Pîr Kirin

Omer DILSOZ

*Min pîva, min şêla
Min êş li bêndera dil kirin
Dil gêra, dil hêra,
Dil bo 'te' evîn pîr kirin*

Ez ji te direviyam û min xwe disparte 'te'ya nava dilê xwe... Hingê tu ji min dûr dibûyî lê her wiha di nava dilê min de ji xwecih dibûyî. Te jehr berdida nava dilê min. Ew awirên te yên ji kîn û hêrsa jiyanê têkçûyî li dilê min digeziya. Wekî dûpişkekê... Hingê dilop bi dilop dilê min ji jehra te vedixwar. Min nedikarî te ji bîra xwe birenim; herzêla bîrmendiya min bi te hatibû dagirkirin. Dilê min bi jehra te avis dibû hêdî hêdî... Te tovê jehrê li nava dilê min çandibû. Ez roj bi roj diheliyam... Wekî berfa tavê lêdayî. Li keviya dilê min ji axîn û kovanan kulîlkên jehrîn serê xwe radikirin. Gotin bi jehrê vedireşyan ji devê min û jehr şîn dibû li nav dilistana min...

Hingê ez direviyam ji jehra te û ji 'te' ber bi te ve direviyam. Ber bi 'te'ya nava dilê xwe ve... Ber bi 'te'ya xwe ve... Tuya min gelekî ji tuya 'te' cudatir bû. Ez ber bi wê tuyê ve diçûm. Ew, welatê min ê herî hêmin bû. Ewle bû. Bagerên dilê min li wir dinûsiyan. Agirên gur li wir vedimiriyan. Ez li wir, li nik te ya di nava dilê min de tovrêşandî aram dibûm. Ez bi jehra evîna te aram dibûm. Min ji jehra evîna te dilê xwe têr dikir. Tîniya dilê xwe dişikand. Tovê jehra te li dilistana min rehên xwe dadihêlan û dilê min pê diwerimî. Bi jehrê diket. Lê jehra te her ku xwe berdida nav reh û rêçikên dilistana min, ruhê min bêhtir şa dibû. Jehra te ya ji bêbextiya jiyanê barbûyî, li nava dilê min êş mezin dikirin. Êş mêjot dikirin. Dilê min ê tî û damayî ji memikên jehrê zikê xwe diwerimand û sibereke spîtale rengê xwe dida bergehên jiyana min... Êdî min her tişt li pişt wê spîtaleyê bi rengê jehrê didît. Her tam û tîn ji bi êş û jana wê seh dikir...

Dil bi jehra te evîn kuştin. Evîn beyirandin. Evîn pîr kirin. Evîn ji bîr kirin. Dil bi jehra te 'xwe' ji bîr kir, tûvil avêt û rengê 'xwe' ji xwe kir. Dil bi rengê te xwe

pêça. Bi jehra te avis bû, lê çu caran bi evîna -bêevîniya- te neza. Dil ji te revî û xwe sparte min, ez ji dil revîm û min xwe sparte 'te'ya di nava dilê xwe de... Te ez jehr dam. Te kula jiyanê li dilê min siwar kir û dilop bi dilop jehra xwe li nav dilê min belav kir. Ez bi evîna te gêj bûm; min qet hay ji xwe nema û ez ji xwe geriyam. Min ji xwe bêhtir, ji te bawer kir; rastiyan çavên min vemaliştin, lê min çavên xwe ji rastiyan badan û bi jehra te kutandin. Evîna te ez kor kirim. Evîna -bêevîniya- te ez xapandim. Hingê dil bi jehra te gêj bûbû. Te pişt xwe da min. Te jehra xwe berda nav dilê min... Te dilê xwe bi jehra jiyanê bar kiribû; te ew jehr anî, weriband, kire tîr, da ber kevane gotinan û berda dilê min. Tîr lê çikilî. Ji ber ku dilê min xav bû. Ji ber ku dilê min bêwar bû. Ji ber ku dilê min tî bû, av diviya. Dilê min birçiyê evîneke saf bû, hezkirin diviya. Lewma bi te xapiya. Bi jehrê ket û naliya. Êşiya. Kul bû. Geviziya... Te dilê min da ber 'tîrên jehrê' û tovê tîrsê te li nava dilistana min çand. Wisa, ez ji xwe ditirsiyam. Ez ji xwe direviyam û min xwe sparte 'te'ya ku min bi evîna xwe ya kûvî vaftîzkirî, bi hestên xwe yên bêguneh mêjotkirî, bi xweziyên xwe yên zarokane pîrozkirî...

Ez bi jehra te gevizîm bi şev û rojan. Çi gava min çavên xwe danîn ser hev, jehra te êş berdan nava dilê min. Ez gelek li jehrkujan geriyam; min ji çavên xeza-lan ava jiyanê vexwar, nebû. Min kulên xwe bi awazê bilbilan nivandin, nebû. Min ji xunava ser pelên gulên şerbet noşî, dîsa nebû. Min ji kerbê xwîna xwe vexwar, careke din nebû. Ez careke din ji 'te' ber bi teya li dilistana xwe ve reviyam lê negihîştimê. Her ku nêzî te bûm, ji te dûr ketim. Piyên min giran bûn; jehra te ruhê min pêça û ez li cihê xwe perpitîm...

Perpitîm... Şev û roj wekî tirşebayeke lertzok di ser min re hatin û çûn. Jehr li hemû laşê min geziya. Dilê min pê werimî. Kulekê li nava dilê min zîl da; gewde bû û bû pitikeke bê dest û pê, bê ser û çav... Ez bi bîjiyê kulan avis ketim. Bîjiyekî bê dayik û bê bav... Bîjiyekî jandar ê ku her roj parçeyek ji gewdeyê min dimêt. Her roj çînîkek ji goştê min vediro. Hestiyê min dikoji. Her roj mistek ji xwîna min vedixwar... Her roj di nava dilê min de hêvî û xweziyeke zarokatiyê ji min dikuşt... Ew bîjiyê evîna te bû. Ew bîjiyê revaneyê te bû.

Tu guneha herî mezin a demên min ên bêdem... Tu tîrsa herî kirêt a jiyana min a bi jeng... Tu jeng û jehra ciwaniya umrê min ê tîrnedîtî... Tu xirabiya herî mezin a heyamên min ên ji evîneke saf û pak bawerkirî...(yî)

Peritîm... Ji hêrandina kulan peritî dilê min... Ji şêlandina xeman... Ji pîvandina keseran... Ji gêrandina

êşan... Hêvî û xweziyên min ên feqîr û stûxwar wekî gulnixwînekê (şilêr) bi jehra xwe giriyan. Di giriya xwe de xew çûn û di kela xwe de pijiyên. Dil li ser pel û bizotên keseran hate biraştin... Di xweliya xwe de xewinîn hemû hêviyên min ên pêpeskirî... Jehra te ez pûç kirim... Wekî pûşik li ba kirim û li coxîna jiyane raxistim; hingê te ez li bin sim û nalên ker û hespên serberdayî pelixandim. Wê demê li terazina dilê min qaz û qulingan dest bi koça xwe ya payîzî kiribû û li ser tifik û kuçikê mirinê xêrnexwazan dest bi germkirina ava şowarê kiribûn jî. Ji ber ku îşev ji nava stêrkan dê stêrkeke dîtir jî birijiya. Lewma ewran qet xwe ji rûyê asîman venedikêşa... -Ma tu nabêjî qey ew barana bêwerz bêsedem dibariya? Belkî jî, da ku peritiyê ji jehra evîneke bêsiûd di agirê xwe de neşewite. Qet nebe, da ku koma hestiyên li bin kêlekê bîn çalkirin, qet nebe; belkî rojekê rêwîngeke xêrxwaz bêt û axa gorê vepê. Hingê ez ê van rêzikan vereşînim ji jehra te:

*“Rûbarên xeman diherikîn li ser dilistana min
Rûpelên dîrokê xwe vedikêşa ji ber pênuşê
Zeman ziwade bû li ber hilavêtina dilê min
Tu diçûyî û vedigirt keliya gora min xwîsê*

*Çîroka agirê bê dû dihat gotin li ser tenûrê
Gava ku xewn û xeyalên me tev dibûn bizotên sor
Kula hezar salan xwe berdida ser dengê bilûrê
Dinaliyan li nav xweliya xwe ya sar mirî û gor”*

Bi gazin bûm... Lê min baş dizanî jî, hemû gazinên min di bédengiyê de winda dibûn û li min vedigeriyan. Her çend di hinavên min de qiyamet jî radibûn, lê rondikên min li ser rûyê min hişk dibûn. Ji çirûska çavên min misteke jehrê dibariya. Rondikên min jî bi evîna -bêevîniya- te lewitibûn û hatibûn jehrdan. Êdî her çend keliya gora min xwîsê vegirta jî, kesê nedizanî ku ew jehra te berdaye nava dilê min hê jî di hestiyên min de maye û ev jî kelvedana wê ye!... Ma dê kîjan biaqilî aqilê xwe bixwara da ku têbigihîştta ku kelvedana evîneke kûr di goristanê de jî her û her tîn vedide... Ma ji qestî kulîlkên zer ên jehrîn li dor gora min bişkiftî ne? Lewma ez ji te direviyam, min xwe disparte xwe lê li wir jî tu sebata min nîn bû, ji wir direviyam û îcar min xwe davêt ser bextê ‘te’ya di nava dilê xwe de... Li wir dil bi jehra te ditebitî...

Te kîna salan li dilê xwe bar kiribû. Tu bi rik û ser-hişkiya salan a ku te li dilê xwe pengandibû, bi ser dilê min ê pak û paqij de dibariyayî. Hemû êşên jiyane; bêbextî, bextreşî, serxurî, tev te li awirên xwe nijinandibûn û bi ser min de dihatî. Wekî dûpişkeke tengav te demildest ew jehr tev berdida ser dil û hinavên min. Min nizanî ka çi dibe lê jehra te li malzaroka dilê min venûsiyabû û êdî dil bi jehra te avis ketibû...

Navê wî bijî jî ‘êş’ danîbûn...

e-mail: o_dilsoz@hotmail.com



**Hêvî û
xweziyên
min ên
feqîr û
stûxwar
wekî
şilêrekê bi
jehra xwe
giriyan,
di giriya
xwe de
xew çûn û
di kela xwe
de pijiyên,
dil li ser
pel û
bizotên
keseran
hate
biraştin...**

Nûredîn ZAZA

Amadekar:
Dilawer ZERAQ
Nûredîn ZAZA û Kurteçîrokên Wî:
Firat CEWERÎ
Ji Xortan Re:
Nûredîn ÊSIF
Şîretên Ehmedê Xanî:
Nûredîn ÊSIF
Nameyên Destnivîskî yên Nûredîn ZAZA
Gulê:
Nûredîn ÊSIF
Nûredîn ZAZA; Avangardekî Çîroknûsiya Kurdî
ya Nûjen:
Dilawer ZERAQ
Nûredîn ZAZA û Kurtenivîsek Li Ser Çîroknûsiyê:
Edîp POLAT
Dr. Nûredîn Zaza û 'Derketî':
Yildiz ÇAKAR
Nûredîn ZAZA û Çîroknûsiya Wî:
Lal LALEŞ
Destpêka Qonaxa Nûjen a Çîroknûsiya Kurdî;
Çîrokên Ku Ji Rengê Sor
ê Keskesorê Hez Dikin:
Sîdar JÎR
Di Çîroknûsiya Kurdî de Pêl:
Yaqob Tîlermenî
Bîranîna Koçkirina 17 Saliya Dr. Nûredîn Zaza:
Mihemedê Seyid Husên

Nûredîn ZAZA, di sala 1919'ê de li Madenê hatiye dinyayê û hê di zaroktiya xwe de ji cih û warê xwe koç dike û li Sûriyê bi cih dibe.

Ew li Sûriyê xwe digihîne Celadet Bedir Xan û di kovara Hawarê de dest bi nivîsandina kurteçîrokan dike.

Nûredîn Zazayê ku ji ber xebatên xwe yê siyasî gelek caran hatiye girtin, piraniya jiyana xwe li derveyî Kurdistanê bihurandiye.

Wî bi navê:

"Şerê Azadî",
 "Ma vie de kurde",
 "Memê Alan"
 "Keskesor"

(di nav weşanên Nûdemê de derket û weşanxaneyê ev nav li pirtûka wî ya kurteçîrokan kiriye).

Çar pirtûk nivîsiye û hinek nivîsên wî yê ku nehatine weşandin jî hene.

Nûredîn Zaza li Swîsreyê bi cih bûbû, li wir zewicîbû, doktoraya xwe ya li ser fîlozofê fransî Emanuel Monnier li wir kiribû. Nûredîn Zaza di sala 1988'ê de li wir çû ser heqîya xwe.

Nûredîn Zaza û Kurteçîrokên Wî

Firat Cewerî

Dr. Nûredîn Zaza yê ku di nav koma hevkarên Hawarê de yê herî xort bû, jiyana wî jî mîna ya pir ronakbîrên kurd trajîk; lê bi rûmet, pirhêl, rengîn, bi tecrubeyan tîjî û dewlemend derbas bû. Wî ji welêt bêtir dûrî, xerîbî û sirgûnî dît. Ew hê di deh yazdeh saliya xwe de mecbûr dimîne, digel kekê xwe Dr. Nafiz cih û warê xwe terk dike, ji ber zilm û zora tirk, ji ber taqîbkirin û stemkariya polêsên wan nake der, riya azadî û rizgariya xwe di revê de dibîne. Ew û kekê xwe Dr. Nafiz baz didin û derbasî Sûriyê dibin. Ew pêşî diçin Helebê, paşê jî bi alîkariya hin kurdên nas û welathez li Şamê bi cih dibin.

Nûredînê biçûk û kekê xwe demekê ji hev diqetin. Ji ber ku kekê wî doktor bû û welathezekî dîlşewat bû, ji bo ku ew alîkariya kurdan bike, wan derman û derzî bike; ya girîngtir jî wan ji nezani, belengazî, perîşanî û bindestiyê rizgar bike, berê xwe dide beriya Cizîrê û li wir di nexweşxaneyekê de wek doktor û di nava gel de jî wek mamosteyekî azadiyê dest bi xebatê dike.

Nûredînê biçûk yê ku niha di dibistana fransîzan de xwendiyê û xwe gihandiyê, bûyerên Tirkîyeyê roj bi roj taqîb dike û dilê wî her ji bo gelê wî lêdixe. Loma, bombebarandina dewleta tirk a li ser Dêrsimê tehmûl nake, ji bo protestokirina van kirinên dewleta tirk, bi hin hevalên xwe re (ku paşê di bin navê Hêvî de komeleyekê ava dikin) li sefaretên hin welatên Ewrûpayê digerîn, ji bo piştgiriya gelê kurd û lîdî-jderketina ordiya tirk, ji wan alîkariyê dixwazin.

Nûredîn Zaza li gelek welatan digere. Pêşî Sûrî, paşê Iraq, Lubnan û Swîsre... Ew di vê gera xwe de, an jî di vê jiyana xwe ya sirgûnê de gelek tade û neheqiyê dibîne. Ew di zîndanên kûr û tarî de hesreta çirûskek roj dikişîne. Ew jiyana wî ya sirgûnê, tade û neheqîya ku lê dibe wî bêtir li xebatê gur dike. Ew bi Cegerxwîn re dibe yek û bi helbestên wî, ku wê demê ji bo kur-



**Nûredîn Zaza
di sirgûnê de
her sirgûn
dibû, xwe
nedida dest,
dîlî û bédengî
nedipejirand;
her li ber xwe
dida,
her dixebitû...**

dên razayî zengilê şiyarkirinê bû, pê xelkê ji xewa nezani û kirêt şiyar dike; bi Osman Sebrî re, ku ew jî weke wî mecbûr mabû, welatê xwe terk kiribû û li Sûriyê bi cih bûbû, yekemîn car, di sala 1957'ê de bingehên Partiya Demokrat a Kurd (PDK) datînin. Berî lidarxistina Partiyê, ew li Ewrûpayê, di sala 1949'ê de bi hin hevalên xwe re "Komela Xwendekarên Kurd li Ewrûpa" ava dikin û berpirsiyariya wê jî hildigire ser milên xwe. Bi avakirina vê komelê re gelek êrîş tene ser Nûredîn Zaza. Ev êrîş ne bi tenê ji welatên dagirker, herweha ji komunîstên dogmatîk yên welatên dagirker jî dihatinê. Van celeb komunîstên Nûredîn Zaza bi nasyonalîstî sîldar dikirin û xwe jî bi înternasyonalîstî didane pêş. Lê, ew înternasyonalîstiya wan, hindik bûya jî, dîsan gelê kurd jê destekewtî nedibû û jê bi qasî misqalekî fêde nedidit.

Nûredîn Zaza di sirgûnê de her sirgûn dibû, xwe nedida dest, dîlî û bédengî nedipejirand; her li ber xwe dida, her dixebitû... Wek mînak; li Sûriyê partî danî,

li Swîsrê komele ava kir û rojnameya bi navê “Dengê Kurdistan” derxist, li Bêrûdê berpirsiyariya radyoya kurdî, ku bermaya Mîr Kamiran Bedir Xan bû, girt ser milên xwe.

Vî ronakbîrê kurd ê bi rûmet, tu carî li ber zilm û zorê, neheqî û pîkolyê serî dananî. Lê mixabin, kansera kambax pencê xwe avête vî camêrê rûspî, serbilind, zana û têgihîştî û li xerîbiyê serê wî danî.

Dr. Nûredîn Zaza heta bi wefata xwe jî li Swîsrê dima. Ew li wir bi jineke swîsrî re zewicîbû û bavê lawekî bû. Ew li welatê xwe yê sirgûnê doktoraya xwe li ser “Herikîna Personalist di ramana filosofê fransîz Emmanuel Monnier” dike û jî billî xebatên xwe yên militanî û siyasî jî gelek bend û nivîsên bi kurdî, erebî û fransîzî dinivîse û pirtûkeke helbestan bi navê “Şerê Azadî” çap dike. Du pirtûkan jî bi fransîzî


“Contes et Lé gendes du Kurdistan” û “Ma vie de Kurd” derxistiye. Romana Ereb Şemo wergerandiye, destana kurdî “Memê Alan” digel pêşgotineke dirêj û bedew amade kiriye û hê jî gelek tiştên wî yên neçapkirî hene.

Lê, digel hemû tiştan, digel xebatên wî yên siyasî, nivîs, bend û pirtûkên wî jî, dîsan jî bo min tiştên herî balkêş li ba Nûredîn Zaza, çîrokên wî ne. Ew di aliyê nivîsandina çîrokan de xurt, têgihîştî û li gorî dema xwe nûjen bû. Hê di bîst û du saliya xwe de gava çîroka wî ya yekemîn “Xurşîd” di kovara Hawar, hejmar 27, 15 Nîsan 1941’ê de derketibû, ez bawer dikim wê pir kêfa xwendevanên Hawarê hatibe.

Ev çîroka wî ya ku di bin navê Nûredîn Êsif de hatiye weşandin, di der heqê peyayekî bi navê Xurşîd de ye. Xurşîd dewlemendê gund e. Rojekê jî vî dewlemendê gund re lawek çêdibe. Ev camêr jî bo navê lawê xwe diçe mala meleyê gund. Mele peyakî welathez e û navê wî Cemşîd e. Ew vî navê xwe yê şîrîn diyarî lawê Xurşîd jî dike. Xurşîd bi vê yeka hanê pir dilşa dibe û bi kêfxweşî jî ba melê dide rê û diçe malê.

Piştî şazdeh salan, jî bo ku lawê Xurşîd, Cemşîd, bi serfirazî dibistana xwe xelas dike, bavê wî jî bo dayina mewlûdeke dîsan diçe nik melê. Mele dîsan bi rûkenî Xurşîd qebûl dike û jî bo serfirazî û zîrekiya lawê wî mewlûdeke kurdî dixwîne.

Piştî heşt salên din, vê carê jî Xurşîd jî bo mehra lawê xwe diçe mala Melê. Mele bi kêfxweşî mehra wî jî dibire. Heya berî ku kurê Xurşîd, Cemşîd, bi dû destikên keştiya xwe di avê werdibe û difetise, Xurşîd wek xortekî bextiyar e. Ew dilşa ye, bi hêvî ye, xurt û li ser xwe ye. Lê piştî windakirina kurê xwe, ezîzê ber dilê xwe, Xurşîdê weke çiyayekî dikeve, kal dibe, rû lê diqermiçe, pişt lê ditewe û por û rih lê spî dibin. Û bi wî awayî diçe ba melê, bi stûxwarî wê nûçeya reş digihîne. Meleyê ku hem zana ye û hem jî welathez e, Xurşîd teselî dike, ew bi zanebûna xwe û Xurşîd jî bi malê xwe bi xortên gund re dixebitin, xwesteka Cemşîd tînin cih, wan didin xwendin û daweta çil xortên hêja û mîletperwer, digel ku Xurşîd di serê govendê de ye, çêdikin.



Di Hezîrana 1941ê, di hejmara 29'ê de jî bi navê "Derketî" adaptasyonêke Nûredîn Zaza heye. Ev çîroka ku bi bêhnêkê têtê xwendin û weke helbesteke bedew diherike, li ser derketiyan e.

Derketî; ew kesên ku ji welatên xwe derketine, terka welatê xwe kirine, bi çol û çepelan ketine û ji xwe re li dûriyê li starekê geriyan in. Mirov di vê kurteçîrokê de dibîne ku dûrî çiqas xweş be jî, dîsan mal, yanî welat xweştir e. Xwarin, lixwekirin, vexwarin, xweza û stranên welêt bi mirov xweştir û şîrîntir in.

Di eynî hejmarê de, yanî di hejmara 29'ê ya 10'ê Hezîrana 1941'ê de çîrokeke wî bi navê "Gulê" heye. Gulê mîrê xwe, yê ku ne bi dilê wê ye dîkujê, paşê bi qiralê çiyayan, Qoçoyê Pola re derdikeve çiyê. Gulê jîneke bejînzîrav, spehî, şîrîn û mîrxas e. Lê di çavê gundiyan de jîneke qehpik, bênamûs û xerab e. Qoçoyê Pola ku gelek xerabî û rêbirî kiriye, ji bo ku êdî li hemberî dijminê gelê xwe şer bike, di hizûra gundiyan de sond dixwe.

Nûredîn Zaza hatina Qoço wiha salix dide:

"Gundî di mêvanxana Reşo de rûniştibûn û daxiftin. Dijmin ji gund bi tenê qonaxekê dûr bû, nixta gundê Şadiya di nêzik de wê biketa axa bav û kalan.

Her kes diponijîn û li çarekê digeriyan. Ezman girtî bû, bandevêkê ji reşîya şevê re hîn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê çiyayan, Qoçoyê Pola bi heşt mirovên xwe ve kete hundir. Cilên wan şil bûn, av di tivingên wan de dihate xwarê. Gundiyan gişan da ber qîran: Polayê kurd, sergevazê çiyayên Kurdistanê, fermo".

Qoço bi çil gundiyan ve li hemberî dijmin kemînê vedigire û bi hêrs û rik li hemberî dijmin şer dîkin. Gulê radihêje xencerekê û demekê wînda dibe. Paşê gava di reşîya şevê de ji hember ve têt, gundî û Qoço wisa têtigihîjin ku Gulê ew xistine xefika dijmin; loma gundî Qoço hêrs dîkin û Qoço jî berê tivinga xwe bi Gulê ve dike û bi hêrs berdidê.

"Berikê wek qîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrişim raxiste erdê".

Lê paşê gava zora dijmin dibin û li gund vedigerin, di malekê de tiştekî ecêb dibînin.

"Serê zabîte dijmin ji laşê wî hatibû birrîn û xencer bi xwîn bû... Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porên Gulê ên zer pêl didan".

Gava qiralê çiyayan, Qoçoyê Pola, vê mîrxasî û bi-namûsbûna Gulê dibîne û bi rastiyê dihesê, rohnî di çavan de namîne, radihêje xencerê û bi bayê bezê derdikeve û nema xuya dike.

Çîroka "Keskesor" jî di der heqê serîhildana Şêx Seîd de ye. Ev çîroka ku bi forma kesê yekemîn hatiye nivîsandin, xuya ye bîranîneke Nûredîn Zaza ya zarokiyê bi xwe ye.

Nûredîn zarok e, diçe dibistana tirk. Tam di dest-pêka biharê de ye. Yanî gava êdî zivistan cihê xwe ji biharê re û sarî jî cihê xwe ji germê re dihele, Nûredîn guhertinekê di mirovan de dibîne, tiştin dibin. "Gelo ev çî ye, çî dibe?" Nûredînê xwendevan ji xwe dipirse. Lê paşê ji çûyin û hatina mezinan, ji tevgera wan, ji rabûn û rûniştina wan, ji peyv û gotinên wan têtigihê ku şerek dike dest pê bike; şerê kurdan, serîhildana wan li hemberî dewleta tirk. Têkoşerên kurd demekê baş li ber xwe didin, xwe ji ber êrişên dijmin diparêzin û paşê jî dijmin ji bajarê xwe derdixin.

Zaza vê yeka hanê wiha salix dide:

"Esker top û mitralyozên xwe berdidan û direviyan. Mezinên bajêr yên ko berê berberî bi hev re dîkin, li hev dihatin û çek didan mirovên xwe".

Şerkerên kurd yên ku ji bajêr derketibûn û dabûn ser piştê dijmin, millet bê sebir li bendî vegera wan e. Dûre gava pêjna hatina wan dîkin, "Hatîn, nêzik bûn, kurd hatîn" dibêjin. Ev yeka hanê zû di nava bajêr de belav dibe, her kes pê dihesê "Xort û mîr bi çekên xwe ve, hinek bi dahol û zirne, hinek siwar, hinek peya; bi hezaran û bi dengê her bijî kurd! Her bijî Kurdistan! Her bijî serbestî!" ve pêrgî şervanên xwe tînin.

Xuya ye ev azadî û kêfxweşîya millet zêde dom nake. Dijmin bi hemû hêza xwe ve digire ser wan; kêfxweşî û dîlşahiya wan li wan dike doje, wan şerpeze dike. Yanî wê azadiya ku wan ji bo kurtedemekê bi dest xistine, bi hovîti ji wan distîne.

"Ala rengîn, şan û rûmeta me çirandin, avêtin ber lingên xwe, pê lê kirin û li şûna wê, ya xwe, ya xwînwaran danîn. Ziman û stranên kurdî bend kirin û tirsek dijwar xistin dilê xelkê".

Çîroka li dû wê jî ya bi navê "Stêrk" e. Stêrk çîrokeke evînî ye, ji Les Étoiles, D'alphose Daudet adaptasyon e. Ez dikarim bibêjim ku ev çîrok yek ji çîrokên bi kurdî ya herî xweş û bedew e ku min xwendiyê û jê hez kiriye. Ev çîroka ku gelekî nêzikî realîzmê ye, lê

di eynî demê de pir romantîk e, di der heqa şivanekî û keça axê, Mijganê de ye. Di der heqê evîna wan de ye, an jî di der heqê evîna şivên ya nîvplatonîk de ye.

Ew xortê diltenik, dilketiyê Mijganê, li ba bavê wê şivan e. Cihê şivên bi qonaxekê dûrî mala axê ye. Ew di xaniyekî mîna holikekê de dijî û ji pazdeh rojan carekê xwarina wî jê re diçe. Piraniya caran, pîrê, ku ew jî li ba mala axê xizmetkar e, xwarina şivên jê re dibe. Rojekê pîrê ne hazir e û kesekî din ku bikaribe xwarina şivên jê re bibe tune ye, ji ber vê yekê keça axê Mijganê, digel xwarina şivên a pazdeh rojan li hespê siwar dibe û berê xwe dide zozên, ba şivên.

“Mijgan bi bejna xwe ya zirav û narîn, bi çavên xwe yê çeleng û bi cilên xwe yê xemilandî û giran spehîti bi xwe bû. Ciyê wê bajar, xaniyên delal û îşê wê govend, reqs û stran bû; lê ne çiya, rêl û qantir bû.”

Gava şivan bi wî awayî çav li Mijganê dikeve şaş dibe, ji çavên xwe bawer nake.

“Mexlûqa çeleng! Çavên min jê nedibûn. Cara pêşî min ew pir ji nêzik ve didît. Niha ew li ber min sekinîbû û tenê ji bona çavên min bû.”

Lê ew yeka hanê ji şivên re ne ew çend hêsan bû. Ya ku ew di xewn û xeyalan de lê difikirî, niha li ba wî, zadê wî yê pazdeh rojan jê re anîbû. Ji ber vê yekê jî ew şaş bûbû. Gava ew pê re dipeyivî jî, dilê wî hildavêt, hişê wî diçû û qirika wî dihate girtin.

Ji ber ku baran tê û çem weke lehiyekê radiibe, Mijganê nikare li çem bixe, derbasî aliyê din bibe û here malê, loma bi tirs ber bi şivên ve vedigere. Şivan vê mêvana xwe ya ezîz bi dilxweşiyê bêmehpa qebûl dike, ji bo ziwakirina kincên wê jê re agirekî dadide, di wê navê de jî jê re xwarinekê û tasek şîr amade dike. Paşê jî jê re ji pûş û ji postê mihê cihekî razanê çêdike.

Ew yeka ku ji bo şivên bi tenê xewn û eyal bû, niha rastî bi xwe bû. Loma jî wî "tu caran ezmanek mîna ezmanê wê şevê kûr û stêrk wek yê wê şevê geş nedîtibû".

Keça axayê wî ye, şeveder maye û xwe spartîye wî. Şivanê diltenik ji evîna wê pêve li tu tiştekî din nafikire. Yanî li gor gotina şivên, “Li tiştekî xerab nafikire”.

Xuya ye di wê holikê de li ser wî pûşî xewa Mijganê direve, ew radiibe ser xwe û derdikeve der.

“Deriyê holikê vebû û weke hîva çardeşevî keçika delal jê derket”.

Di hejmara 35'ê ya kovara Hawarê de jî çîrokeke Zaza bi navê “Perîşanî” heye. Perîşanî ya li ser xeyalekê hatiye avakirin, wiha dest pê dike:

“Li taxa mahciran, ji oda xwe temaşa baxçeyên Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê yê bilind, bi dar û avên cemidî tîna bîra min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê, li bin daran dibînin.” Û wîlo dom dike, di van xeyalan de kûr diçe, digel xweşî û spehîbûna Kurdistanê, ew zilma leşkeran, stemkariya wan, perîşanî, belengazî, paşdemayin û nezaniya kurdan û welatê wan dibîne û di vê rêwîtiya xeyalan de dîsan bi paş de tê Şamê, dikeve oda xwe û li ber pencera xwe xuya dike. Bê hemdê xwe keserekê dikişîne û ji xwe re dibêje:

“Nezanî...Nezanî...Nezanî...”

Hevîna Perîxanê jî di hejmara 37'ê a Hawarê de weşiyaye. Çîroknivîs vê bûyerê ji destpêka sedsala 19'ê distîne. Ev evîn ne evîna ku em pê dizanin, ne evîna xortekî ye. Evîna Perîxanê evîna welêt e, evîna gelê wê ye. Evîna bavê Perîxanê jî evîna gel bû, evîna welêt bû. Lê bavê wê yê girs, çeleng, dewlemend û mîletperwer di ber vê evîna xwe de şehîd dikeve. Şehîdketina bavê Perîxanê gelekî tesîrê lê dike, dilê wê yê tenik perçe dike. Loma ew dixwîne, xwe digihîne, bi dil û can û bi bawerî dide ser riya bavê xwe. Di demeke kurt de gelek mirovan li dora xwe dicivîne û dibe serok û şîretkera wan. Lê mixabin, ew jî mîna bavê xwe ji wê evîna pak re dibe gorî, lê ji aliyê din jî li ser riya hizir û ramana wê kurd cih bi cih rizgar dibin.

“Nûçeyên serdestiya Kurdistanê dihatin. Xelkê hêstirên şîn û şahiyê dirijandin û giyanê Perîxanê di tava ala rengîn de diçirîsî û ji giyanê bavê xwe re dikenî.”

Nûredîn Zaza di hemû çîrokên xwe de zimanekî sivik û zelal bi kar anîye. Ez bawer nakim wê tu xwendevan di xwendina van çîrokan de zehmetiyê bikişîne. Digel sivikbûn û zelalbûna zimên, gava mirov temenê wî û dîroka nivîsandina van çîrokan jî dide ber çavan, mirov dibîne ku Zaza di nivîsandina kurteçîrokan de xurt û jêhatî bûye. Ger di nivîskariya wî de berdevamî hebûya, wî dikaribû bibûya nivîskarekî dema me yê bijarte. Lê mixabin, ji ber gelek sedemên nas û nenas, mîna piraniya endamên ekola Hawarê wî jî berhemîn kêmkirî li dû xwe hiştin. Lê her çawan be, ev kêmbûn jî ji bo rohnîkirina dîroka kultur, siyaset û edebiyata kurdî, şewqek e. Nemaze, wê di dîroka edebiyata kurdî de cihekî çîrokên wî yê taybet hebe.

Karlstad 1987

Jî Xortan Re*

Nûredîn Êsîf**

Rudyard Kîplîng şair û feylesofê Îngilîz şîret li xortan kiriye û gotiye:

- Te dît ku xelk di dora te de şaş bûn û jî te re dibêjin tu jî şaş î: guh mede wan...
- Ku xelk jî te kete şikê, tu jî xwe bawer bibe û guh mede gotina wan.
- Heke dikarî bendewar bibî û jî bendewariyê bêzar nebî; ku xelkê derew li te kir tu her gav bide ser riya rastiyê.
- Heke xelkê jî te nefret kir tu jî wan mexeyide.
- Xeyalan bike lê wan jî xwe re meke xwedî.
- Baş bifikire, lê fikrên xwe jî xwe re meke sereş.
- Serdestî û bindestî, van her du xapînokên ha wek hev bizane û xwe bi wan mede xapandin.
- Heke gotinên te yê rast derew derêxistin û gotin ku tu xelkê dixapînî tu guh mede wan.
- Bi salan ve dixebitî, xwediyê tiştan dibî, pişt re, rojekê wan gişan winda dikî û jî nûve jî bo pêkanîna wan dixebitî.
- Divê bikaribî malê xwe giştî bi carekê havejî halûbatê û bibêjî: Mîn da an mîn bir. Ê jî çûna wî tu keserî nekişî û bi agirî xurt xwe jî nûve bidî xebatê.
- Dil û laşê te jî mêjve westiyane; lê di giyanê te de hêj tiştek heye û nav di te dide û dibêje: Xebat, xebat... û te davêje xebatê, dest bibe xwe.
- Bi mirovên kêr re te da û stand rûmeta xwe winda meke.
- Ku bi şêx û axa û dewlemendan re rabû û runiştî, bala xwe bidê hişê rastiyê jî te nebit.
- Ne jî dijmîne xwe, ne jî jî dostê xwe yê delal meêşe.
- Qedrê her mirovî bigire lê behayê wan zêde mehesibîne.
- Ji demên jiyîna xwe deqîqeyekê jî bê kar û havîl derbas meke.
- Ku tu ketî ser şêst û pêncan jî xwe bide xebatê wek xortekî bîst û pênc salî.
- Heke tu bi şîretên min ên jorîn ve çûyî hingê dînya û tiştên wê dikevin destên te û tu dibî mirov, kurê min.

*Ev nivîsara Nûredîn ZAZA di Kovara HAWARê Hejmar 30'ê min (1 Tîrmeh 1941) de bi imzeya Nûredîn Êsîf hatiye weşandin.

**Çavkanî: Kovara HAWAR, Cild 2 (Hejmar: 24-57), Rûpel: 758



Şîretên Ehmedê XANÎ*

Nûredîn Ûsîf**

Rojekê, Ehmedê Xanî şêst zaroyên kurd -keç û kur- birin mala xwe û ji wan re daweteke mezin da. Pişt re di nav wan de rûnişt û ji wan re pirsên jêrîn got. Divê hûn wan di dilê xwe de veşêrin, ji ber ku; rêber û zanayê me yê mezin ew ne ji wan şêst zarokan bi tenê re gotine, lê ji bo hemî zaroyên kurd re. Gotinên rehmetî ev in:

- Hûn piçûk in, hûn geş in, bê derd û xem dileyîzin û dikevin: ev dema dilxweşiyê ye.
- Eger hûn dixwazin her gav bextiyar bibin û tu caran pir bedbext nebin li du tiştan bigerin; hezkirin û xebat.

- Kî hez ji we dike hez ji wî bikin: Îro hez ji merivên xwe bikin; hez ji diya xwe, hez ji bavê xwe bikin, hez ji hevalên xwe bikin, pişt re hûn ê hînî hezkirina diya me gişan; Kur-distanê bibin.

- Ê duduyan; bixebitin; îro ji bo hînbunê, ji bo zanînê bixebitin; da ku halê dinê bizanibin, bi pêş ve herin, bibin meriv, bibin hêja, bibin serdest, bibin însan!


Gava hûn dersên xwe baş dizanin, dilê mamosteyên xwe xweş dikin. Hûn

dibînin ku hûn jî geş dibin, ji bin barekî giran xelas dibin, sivik dibin. Ew her gav holê ye. Bixebitin da ku wîjdana we her gav ji we razî be! Û gava wîjdana însan rehet e û dilê wî bi kêf e, ew însan tu caran ne bedbext e.

Zaroyên min ên delal! Niha ji bo xatirê min têr bixwin, vexwin û bikenin! Ez bi we bextiyar im, ez dixwazim hûn jî bi min dilxweş bin, da ku welat jî bi hezkirina me ya hev û du her gav şa be!

**Ev nivîsara Nûredîn ZAZA di Kovara HAWARê Hejmara 32'yemîn (1 Îlon 1941) de bi îmzeya Nûredîn Ûsîfhatiye weşandin.*

***Çavkanî: Kovara HAWAR, Cild 2 (Hejmar: 24-57), Rûpel: 796*



Nameyên Destnivîskî yên Nûredîn ZAZA



Hevrêye delal delal, -10.8.1984

Ez spardarê nameya
te 10.8.1984 a me.

Şûna te Parîsê ez
dibawesê kirim. Tu xwe awesê li zimên
û genda kurdî mijûl dikî; berxudan bî
û dew ji vê xebatê bermede. Di rojên
îro de, ev xebat tiştêkî bingehîn e.
Ez li xwe, weke berê, êdî nikarim herim
ciwînan. Ev niha karê we xortan e.

Niha, ez tu fîstê nû
nawivîsim. Gend nivîsandinên min ên
kevn hene. Yek ji wan, bîrek ji bîranînên
min e, Bi kurmancî ye. Kurdek ji
Parîsê hatilû vir. Me ew li hevrê xwend.
Piştî, ewî duffer liir û vegeriya Parîsê.
Dibe ku, bi desê INSTITUT bêtî şapkirin
Gend helwest û «Tîzên - Temeşa» yê
min jî hene. Niha raza ne.

Nûçeyên liherketina

- 2 -

Kurdan li Ewropa digehin min û dilê
 min dipêçitînin. Di derve jî herdu di-
 kuyin. Ev çî bextreşî ye ku li stuyê me
 siwar e û der jî me liernade?!...
 Nivîsandineke min di Hawarê de heye, û
 ew digehê dawiyê: Nezanî, nezanî, perî-
 şanî!... Ev res hîn nequbîriye û dom dike.
 Bi hêviya ku miletê me jî
 rojekê çavên xwe xweş bike û çarenûsa
 xwe has, lixe destê xwe...

● Ronê Delal û hêja, 12.10.1984

● Di nameya xwe de
 tubehsa diwarîyên nivîsevanên ^{kurd} dikî.

● Duhî, radyaya (Pêlweş) ^{iswîsre} Swîsra ya bi
 frensîzî ez vexwendibûm (dawet kiribûm)
 ku ez li ser nivîsevan û hunermen-
 dên kurd baxêvîm. hêzîkî saetêk

● û nîv min xeberda. Di axaftinên xwe
 de, min behsa nameya te kir, bêi ku
 navê te bidim, min qala Ismail Be-
 dikci jî kir û gelek fêrmê wî da.

● Min navê yaşar Kemal jî anî. Min
 got ku Kurd e, nivîsevanekî mezin e, lê,
 çawa nikare bêje ku Kurd e. Min dîsa
 got ku heke Kurd azad bixwêna ewê
 jî wê nivîsevanên pir li nav û deng
 derketina...

● Piştî mirîna Yılmaz

● Güney jî ben min kiribûn; hingê jî, nêzîkî
 saetêk min axaftibû. Çi jî destê me tê, em

Ji lû mîletê xwe yê perîşan dikin.
 Lê, em şawa bikin, ji dijminên me
 yê derve yê liêtir, em neyartiya
 xwe dikin: eşîti, neyekbûn û bêbertî!

Di Kovara Berbang de, te
 gotinên hin peyvaşên mezin wergerandine
 Kurmancî. Ev xebateke ne xirab e.
 Min jî, di Hawarê de, hin nivîsanên
 biyanîyan wergerandine Kurdî. Hel-
 hesta R. Kipling, a pîr bi navûdeng
 "I F" - EGER", di min re xweş der-
 kelibû. Gelo te ew xwendige?

Tevê wê xebata ha, divê ku
 em gotinên mezin Kurd jî di kurdaure
 lûdine nas kirin. Wek Cezîrî, Xanî,
 Sîyeh Pûş, ~~te~~ û hin. Di pêzgotîna
 Memê Alan de, min Ehmedê Xanî,
 Hegel û Marx danîne ber hev û
 min nîşan daye ku berî van her di-
 wan, Ehmedê Xanî bi "dîyalektîk",

— 2 —

hesiyabû. Herce le ev pêşgotin
mexwendibû, Memê Alan peyda lûke
û lûxwîne. Çapa Ewropa heye. Reşo
Zilan bi vî karî rabûbû. Ev kîlêb
lû xwe, niha, li la min nemaye.

Di "kulîlk" de "Şîrelên

Ehmedê Xanî" derketibû. Ev lişt,
bivê nevē, bi destê te çêlûye. Gelek
spas. Lê, mixabin ka tê de gelek
şazîgên çapê hene...

Hun, Kurdên Sêwêdê, xweş
dixebitin, dom bikin. Lê, kurman-
ciya xwe pîz kevliker mekin. Camê,
ez lû xwe, ji nivîsandinên hûnêkan
tu tîst fêhmî nakim...

Êdî, xweşî û serfraziyate.

8. 12. 19 86

Nivîsêvanê me ye delal,

Min nameya te ya 15.11. 86

xergirt, gelek spas. Tu ji gotinên «devavetî-
nên min - rexne - » min ne xeyidîye, mala
te ava. Ez hez dikim ku xortên wek te
ku hej nivîsandinê dîcin xwe hînî hemî
awayên nivîsandinê bikin. Û şîqa ji we tê.
binivîsin. Dirê ku Kurdîya we her diçe,
siviktir, bi rengtir û xurtir be. Ji yîna
we li si-wêd bextyariyêke mezin e; er
kêşêke welê^{ya} ku nakeve destê hemî Kurdên
Ewropa. Li Swîsre, hikûmet qurîşkê nade
ji bo şanda kurdî û li Elmanyayê jî rê
venakin ku zaroyên Kurd bi zimanê xwe
bixwînin.

Min «Xewna Orhanovî», carekê di
xwend: xewn û rastî xweş bi hev re hatine
girêdan. Hêvîdar im ku rojek berî rojekê
Orhanov wê bibe wezîrek li Kurdistanê
azad buyî!

Ez pir dixwazim ku kilêbate
 xweş bête fratî; lê livir bi xwe, li
 dora min, kurdên xwendevan mabînim.
 Ên tîn cem min, "bestxwestiyên",
 dora Maraş, Anêb, Adiyaman in.
 Dixwazim, xwe li ber hilcimetê kurdên
 siyasî bidine zanîn. Lê, gava ez ji
 wan re behsa Kurdistanê dikim, latêb
 û rojnameyên kurdî ku dikevin destê
 min, şanî wan didim, ruyê ^{xwe} ji wan
 dizivirînin. Lê, dixwazim ku ez ji
 wan re tereimaniyê bikim, an ji "itirazan",
 binivîsim ku bikaribin li swîsre bimînin,
 bixobitin û pere kar bikin...

Edî ez geşiyate dixwazim
 û, ji nihû da, sala te ya nû pîroz dikim.

E.Z.

Gulê*

Gundî di mêvanxaneya Reşo de rûniştibûn û di-axivîn. Dijmin ji gund bi tenê qonaxekê dûr bû, nixta gundê şadiyan di nêzik de wê biketa axa bav û kalan.

Her kes diponijî û li çareyekê digeriya.

Asîman girtî bû; bandevêkê ji reşiya şevê re hîn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şid vebû; qiralê çîyan, Qoçoyê Pola, bi heşt mirovên xwe ve kete hundir. Cilên wan şil bûn; av di tivingên wan re di-hate xwarê. Gundîyan gişan dan ber qîran: "Polayê kurd, sergevazê çîyayên Kurdistanê fermo!"

Lê Qoço rûnenişt, di nivê odeyê de ma û wekî serdarekî bi dengê xurt û gur gote wan: "Gundîno! Ev panzdeh sal in ku ez gunehan dikim. Xelkê dikujim. Xerabiyê dikim. Stranên min di van rêlên rojnedîtî de hatin gotin, lê ji duhî vir ve ji devê tu kesî dernakevin. Belkî ji bo me hemûyan, ev şev, li ser axa welêt şeva me ya dawiyê be. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe min sond xwariye ku dijmin ji welêt derxînim".

Sorahiya rivîna agirê êzingan di tifikê de li dîwaran dihejiya. Pola li dora xwe dinihêrî. Çavên wî diçirîsîn. Çil gundî tevde rabûn û gotin: "Em ji sond dixwin, em ji bi te re ne, pilingê kurd!"

Di wê gavê de, ji nişka ve derî vebû, jinikeke zirav, narîn û şîrîn, wek pelekî dara bişengê li ber bayî, ket hundir û got:

- Ez jî bi te re me, ez jî, mêrê Pola!

Gundîyan gişan bi dengê wekî ken kir qîr:

- Gula qehpik! Gula bênamûs!

Gulê ji gund bû. Berî çend salan bavê wê bi zor ew dabû yekî. Gulê rojekê mêrê xwe kuştibû, ketibû pey Qoço û li serê çîyan pê re digeriya. Gundîyan bi çavekî nebaş lê dinihêrîn, her gav jê re dijûn dikirin û deriyên xwe her gav lê digirtin. Ji tîrsa Qoço nebûya belkî ew bikuştina. Lê, ne tehqîra gundîyan, ne jî tajanga Qoço ji Gulê re ev rê nedida berdan. Gava Qoço ew dida ber tajan-gan, Gulê digot: "Li min bixe pilingê min! Li min bixe! Heya destê te biweste! Tu jîna min î! Ez goriya te me. Bêyî te ez nabim!"

Di çîyan de bi Qoço re ger di şikeftan de raketin, di berfê de qefilîn, jê re bextiyariyeke mezin bû.

Wê şevê Gulê dîsa digiriya, lê îcar ne ji êşa ta-janga Qoço ku wekî marekî xwe li bejna wê ya zirav dipêçand. Xew, qet nediket çavên wê. Dijmin dê biketa welêt... Rojên geşî ji bo wan nediman. Her tişt dibû xeyal. Dengê topên dijmin gelek nêzik dihatin bihîstin... Çîyayên Qoço yên serbest diketin destê dijmin... Jina gund a pîs li ser vî halî bi girîn difikirî. Li çareya xelasbûnê digeriya. Di-viyabû ku gundê xwe, welatê xwe, çîyayê xwe û serbestiya pilingê xwe 'Pola' ji dijmin biparêze. Ji nişka ve rabû. Tiştê hatibû bîra wê. Xencereke bi şiv girt. Ji şikeftê derket. Riya aliyê dijmin girt û winda bû.

Qoço, bi çil gundiyên xort û mêrxas ve li pêş dij-min kemîn girtibû. Hingûra şevê bû. Li ser çîyayê bilind, nivreş heyveke sor bi dilekî şikestî hêdî hêdî hildihat. Dengê topan hatibû birîn. Pola çavên xwe li ser çîyayên xwe; li ser warên xwe gerand û bi keser li wan nihêrî:

Wî sond xwaribû; gunehên xwe yên pazdeh salan wê bi destê xwe rakira, nehişt ku dijmin derbasî tixûbên welêt bibe...

Di dilê wî yê pola de agirê serbestiyê pêketibû. Wî tu caran wek wê şevê hez ji kuştin û helanîna tola xwe nekiribû.

Demekê, Gulê hat bîra wî. Wî hez ji vê jinikê dikir. Li dora xwe nihêrî; li Gula xwe ya ko wek si-hekê jê nedibû nedît.

Di wê gavê de nêrevanekî wan got: "Bala xwe bidinê! Ji aliyê dijmin yek tê."

Siha ku xuya dikir bêtirs û bêtelaş dihat. Dengê şikên wan rakir: "Ev Gula qehpik e!"

Gundiyekî din got: "Qehpikê em xistine xefikê! Tivingê berdê, Pola! Ew rêberiya dijmin dike!"

Qoço rûyê xwe tîrş kiribû; birihên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinihêrî. Wî ji gotinên gundîyan rast didît. Gulê li cem dijmin çî dikir? Nexwe cihê wan şanî dijmin kiribû... qehpîti kiribû.

Qoço di bin ronahiya heyva sor re tivinga xwe dirêjî Gulê kir û got:

- Ha ji te re, Gulê! Berî dijmin berika pêşîn para te be...

Berikê wekî qîrekê tariya şevê çirand û ar-manca xwe ya zirav wekî çarşeveke hevrişim rax-iste erdê.

Pişt re Qoço rabû ser xwe û ji gundîyan re got:

- Zû bikin hevalno! Em ê nixta dijmin bigirin!

Çûn. Lê dijmin bê liberxwedan reviya. Kurd ketin asêgehê; her der vala bû. Bi tenê di odeyekê de tiştê ecêb dît. Serê zabitê dijmin ji laşê wî hatibû birîn û menzel bi xwîn bû. Li ser nivînê xencereke bi xwîn diçirîsî.

Qoço xencer rakir; wî ew xencer dabû Gulê? Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porê Gulê yê zer pêl dida.

Qoço kulmikên xwe gez kir û wî pilingê ku çîya dihejand ji bo cara pêşîn da girî û gote gundîyan:

- We bi min gunehê paşîn da kirin, ji Gula qeh-pik re me qehpetî kir!

Bi dengê tîrêş, tîrpoşmanî û tîrbirîn gotina xwe ya paşîn kir:

- Gulê! Te deynê xwe da, te gunehên xwe rakir! Niha dora min e, Gulê! Gula min a zer!

Bi xencera xwîndar wek bayekî ji odeyê derket, berê xwe da dijmin û nema xuya kir.

Nûredîn USIF

**Ev nivîsara Nûredîn ZAZA di Kovara HAWAR Hejmara 29'emin (10 Hizêran 1941) de bi îmzeyê Nûredîn Êsîf hatiye weşandin.*

***Çavkanî: Kovara HAWAR, Cild 2 (Hejmar: 24-57), Rûpel: 732-733*

Nûredîn Zaza: Avangardekî Çîroknûsiya Kurdî ya Nûjen

Dilawer ZERAQ

Qonaxa Hawarê di ziman û wêjeya kurdî de qonaxeke destpêkî û modern e. Her wiha, di serdema Hawarê de, kurdan bi riya ziman, nivîs û wêjeyê, bi awayekî modern, gavên xurtir avêtine ber bi netewebûnê ve. Di vê dema hanê de, di nav wan rewşenbîr û dilsozên kurdî û xebatên kurdayetiyê de Nureddîn Zaza wekî çîroknûsekî xweser derdikeve pêş.

N. Zaza yek ji wan çîroknûsan e ku; hewl daye ku hêmanên wêjeya modern, wekî honak, dirûv û şewazê, di çîrok û nivîsarên kurdî de bide rûniştandin. Tevî ku N. Zaza hejmareke hindik çîrok nivîsandine û ji zimanên din hin çîrok li kurdî anîne jî, wî karibûye di çend kurteçîrokan xwe de çêl û behsa hin aliyên jêvcuda û pevgirêdayî yên kurdan –digel erênî û neyînîya wan– bîne zimên.

Mijarên çîrokan N. Zaza êş û azarên gel in. Çi ji layê feodaliyê ve, çi ji layê serhildêriya kurdan ve, çi ji layê tore û adetên heyî ku nayê devjêberdan, çi ji ji layê hestên jin û zarokan ve... Wî hewl daye ku ji gelek aliyan ve jiyan û êş û jan û kêf û şahiya kurdan, bîne zimên; bi sebr û semtika hubra xwe herikandiyê nav adet û toreya kurdan ku bûne (û hê jî dibin) sedemên şûndemayîn û pêşneketina kurdan.

Ji bo vê yekê, çîroka wî ya bi navê “Gulê” mînakeke balkêş e. Di vê çîrokê de leheng, “Gulê” hem ew jin e ku bi darê zorê ew dane mîrê ku jê hez nake û ji ber vê yekê wê mîrê xwe kuştîye, pê re jî rabûye bi mîrêkî din re jiyaye; meseleya namûsa girîng (!) serûbinê hev kiriye û hem jî ew jin e ku bi çavê xayîn û xiyanetkar lê tê nihêrîn û ew –bêyî ku guh bide wan gotinan– bi kirin, bi xebat û tevgerên xwe yên welatparêzî hemû darazên kermegirtî yên li ser xwe (û li ser hemû jinên kurd) dişikîne û wan (mîr û toreya ku ji desthilatdariya mîraniyê hatiye pê) di nav heyira xwe de difetisîne.

Tevî Gulê lehengê sereke yê vê çîrokê qiralê çiyayan Qoçoyê Pola ye. Qoçoyê Pola yek ji nûnerên îqtîdar û desthilatiya feodal e ku pêşî bi keleşî gelek kes kuştîye, tirsaxwe xistiye dilê gelê herêmê û bi vî awayî jî bûye mîrxas û qehremanê –ji neyînî û negatîfî afirîyê gund û herêmê.

Qoçoyê Pola, di navîna çîrokê de –bi şayesandina N. Zaza– hay ji kirinên xwe dibe, tê ba gundiyan, di navîna odeyê de, li ser piyan û wekî serdarekî xurt û gur, bi tepan bi serê xwe dikeve, ji wan re wiha dibêje: “Gundîno! Ev pazdeh sal in ku ez gunehan dikim. Xelkê dikujim. Xerabiyê dikim. Stranên min di van rêlên rojnê de hatin gotin, lê ji duh bi vir de ji devê tu kesî dernakevin. Belkî ji bo me hemûyan, ev şev, li ser axa welêt şeva me ya dawiyê be. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe min sond xwariye ku dijmin ji welêt derêxim.”* û bi van gotinan poşmaniya xwe tîne zimên.

Di axaftina Qoçoyê Pola de du tişt dikevin bala mirov: Yek jê, awayê poşmaniya Qoçoyê Pola ku; bêtî ku quretiya xwe ya mîranî, keleşî û desthilatiyê bîne bîra xwe û fikara jidestberdana îqtîdara heyî bike, wekî kesekî jî rêzê poşmaniya xwe dibêje û xwe rexne dike.

A duduyan jî; perçivandin û îdealîzma di vegotina N. Zaza de ye ku; wêjeyê ji bo hişyarkirina gel wekî alavekê bi kar tîne û dixwaze ji gel re bibêje, “Va ye gelê min, hûn jî dibînin ku dawîya dawî ew desthilatdariya we ya hundirîn ku tirsax wî di dilê we de ye, ew jî hat ser dîn û îmanê.”


Ev her du hêmanên çîrokê bi me didin zanîn ku wekî hemû wêjekarên cîhanê wêjeya kurdiya nûjen jî bi îdealîzmeke perçivandî û romantîzmeke xav dest pê kiriye.

Dûre di heman dûmenê de, derî vedibe, jina bi navê Gulê dikeve hundir û ji Qoço re dibêje: “Ez jî bi te re me, ez jî mîrê Pola!” û hema bi gotina Gulê re, gundî tevde bi yekdevî dibêjin: “Gula qehpik! Gula bênamûs!”

Li vir bi vê gotina gundiyan, yek ji hêmanên esasî ya çîrok û çîroknûsiya nûjen xwe dide der: Girêka Çîrokê.

Belê N. Zaza, hema di dawîya benda ewil de, girêka esasî nîşanî me dide. Hesasî û tenikiya mijara jinan; tew bi ser de jina ku di çavê gel de ‘wekî Qehpik’ tê zanîn û wekî têkoşerekê xwe dide tengala Qoçoyê Pola.

GIRÊKA ÇÎROKÊ Û TEMSÎLA GIRÊKÊ WIHA YE:



Gulê: Namûs-Qehpetî.

Nûnerî û temsîliyet: Bêhêzî- Parsûyê xwar.

Giloka girêkê: Daxwaza têkoşeriyê ya Gulê.

Nelihevî: Desthilatî-Bindestî,
Têkoşîn-Serîtewandin,
Mêr-Jin,
Qoçoyê Pola-Gulê,
Qehpe-Têkoşer.

Dûre, N. Zaza çîroka Gulê ji me re vedibêje. Bi vî awayî em pê dizanin ku bavê Gulê bi zorê û ne bi dilê wê ew daye mêrekî. Gulê semaxa vê yekê nekiriye, mêrê xwe kuştîye û ketîye pey Qoço û çiya bi çiya pê re geriyaye.

Li vir girêka çîrokê hê bêhtir xurt dibe: Lewre, gundî keleşî û xerabiya Qoçoyê Pola wekî mêrxasî û tiştê bivêvenê û asayî dibînin, lê mêrkuştin û vîn û îradeya Gulê -ku wê bi kuştina mêrê xwe bi xwe xistiye destê xwe-, wekî Qehpetî! tê dîtin. Lê ji ber tîrsa Qoço gundî nikarin Gulê bikujin.

Di çîrokê de tiştêkî balkêş heye, ew jî ev e: Gulê piştî kuştina mêrê xwe digihîje Qoçoyê Pola, bêtî mara mele (Mara Mele: Sembola bawerîya kurdan a ji sosyaliya ola Îslamê), bi Gulê re dikeve nav ciyan û ji ber wê yekê gundî nav bi pey dixin û jê re dibêjin Gulê Qehpik! Tiştêkî heyirînê ye ku Qoço dengê xwe ji vê gotina gundiyan re dernaxîne û her çiqas pê re be, wekî ku Gulê jina wî be li hember wê tevbigere jî,

ji ber bertek û reaksiyona gundiyan a adetî û feodal û ji ber parsûxwariya wê baweriyê pê nayîne. Digel vê yekê, her çiqas Gulê serdestiya Qoço peji-randibe jî, zêde guh nade gotinên gundiyan û tîrsa Qoço dayî derûdorê. Şevêkê wekî mîlîtanê perwerdekirî, di ber xwe de pîlanekê çêdike û bi tena serê xwe jî pîlana xwe bi cih tîne.


Tevî ku kirina Gulê pir li realîteyê neyê jî, em vê bi îdealîzekirina N.Zaza ve girê didin. Li vê derê em careke din jî rastî hêmanêke esasî ya çîroka nûjen tînin. Verêsa girêka çîrokê bi vegotîneke kurt û veşartî di hişê me de tê bicihkirin, da ku wexta dema wê hat, ew wekî dîmenêke xurt di serê me de xuya bike û em pê fam bikin ku sedema dawîya çîrokê ew e. “Qoço bi çil gundiyan xort û mêrxas ve li pêş dijmin kemîn girtibû. Hingura şevê bû. Dengê topan hatibû birîn. Pola çavên xwe li ser çiyayên xwe; li ser warên xwe gerand û bi keser li wan nêrî:

Wî sond xwaribû; gunehên xwe yê pazdeh salan wê bi destê xwe rakirana, nehiştî ku dijmin derbasî tixûbên welêt bibe...”

Di vê beşa vegotinê de tevî ku em hîn dibin ku Qoço pazdeh salan keleşî kiriye jî, wexta dipeyive wekî serkêşekî zana û hayjixwe difikire; “wî yê nehiştî ku dijmin derbasî tixûbên welêt bibe...”

Dûre, yek ji nêrevanekî dibêje, “Bala xwe bidin! Ji

Perçivandin û
îdealîzma
di vegotina Nûredîn
Zaza de ye ku; wêjeyê
ji bo hişyarkirina gel
wekî alavekê bi kar
tîne û dixwaze ji gel re
bibêje,
*'Vaye gelê min, hûn jî
dibînin ku dawîya
dawî ew
desthilatdariya we
ya hundirîn ku tirsê
wî di dilê we de ye,
ew jî hat ser dîn û
îmanê'*



aliyê dijmin yek tê." Yekî din dibêje: "Ev Gula Qehpik e!" Yekî din dibêje: "Qehpikê em xistine xefikê! Tifingê berde, Pola! Ew rêberiya dijmin dike!" Qoço jî bi rûtirşî li Gulê dinêre, bawerî bi gotina gundiyan tîne û bi gotina "Ha ji te re, Gulê! Berî dijmin berika pêşîn para te be..." guleyê berdide û Gulê dîkuje.

Tevî ku em di dawîya çîrokê de pir zêde bi vê dûmenê diêşin, bi pêşdaraziya gundiyan diqehirin û ji ber bawerkirina wî ya ji gundiyan naletê li Qoço tînin jî, çîroknûsê avangard N. Zaza, dixwaze ku haya me baş bi vê yekê hebe: 'Her çiqas serok û serkêş bin jî, her çiqas egît û mîrxas bin jî, her çiqas bi îdealîzekirineke perçivandî li ber çavên mirovan wekî nîvxweda bînin dîtin jî, di dawîya dawî de, serkêş û rêber jî mirov in û ew jî şaşîti û xeletiyên dîkin.'

Pîştî kuştina Gulê, Qoço yê Pola û têkoşerên kurd dijmin tîk dibin, ew dikevin asêgeha dijmin, dinihêrin ku her der vala ye. Lê bi tenê di odeyekê de tiştekî ecêb heye. Serê zabîte dijmin hatiye birîn û li ser nivîna wî xencereke bi xwîn diçirise. Qoço xencerê radike ku çî bibîne; ew xencer e ku wî ew daye Gulê û di nav kulma guvaştî ya zabîte de gurzek ji porê Gulê yê zer pêl dide.

Û girêka çîrokê, wekî ku tu tayê esasî yê goreya rîşîn

bikişîn, ji hev tê verêstî û em di temsîliyeta Qoço de, bi hemû qehra xwe, bi feodaliya xwe, bi îqtîdara xwe ya hundirîn, bi nezaniya xwe, bi pêşdaraziya xwe, bi gundîtiya xwe... û bi xwe diqehirin. Em dîkin nakin nikarin dilê xwe bi Gulê bişewitînin.

Lewre Gulê êdî ne jineke bêhêz e, ne yeke parsûxwar e, ne yeke qehpik e, ne ew jin e ku mîrê xwe kuştîye, ne bînamûs e; wê bi kirina xwe ya ku bi vî û îradeya xwe ew pêk aniye, hem kiriye ku dijmin nekeve welêt, hem kiriye ku qirêjiya xelk û civata feodal û şûndemayî avêtîye ser paqij bibe û hem jî kiriye ku şerefa mîrxasiya Qoço yê Pola (û şerefa îqtîdar û feodaliya mîr!) ku biryara paqijkirina qirêjiyên xwe dabû, paqij û xelas bibe.

N. Zaza, wekî çîroknûsekî avangard, di vê çîrokê de hêmanên çîroknûsiya nûjen bi serkeftî pêk tîne û her çiqas piçekî perçivandî û mezinkirî be û tu tiştekî hewce li çîroknûsiya N. Zaza nake jî, gotina C. Alî Bedirxan ku wî ji bo N. Zaza gotîye: 'Çexovê kurdan e', wekî avangardekî çîroknûsiya kurdî ya nûjen, heq dike.

* Hemû jêgirtinên ji çîroka Gulê, ji kitêba wî ya bi navê **Keskesor hatine girtin (Keskesor, Weşanên Nûdem, 1995, Stockholm, çapa yekem)**

Nûredîn Zaza û Çîroknûsiya Wî

Lal LALEŞ

-I-

Dîroka edebiyata kurdî, çî bigire dîroka helbesta kurdî ye, jixwe wek peyv jî helbestvan-şair di nava çand û edebiyata kurdî de xurtir xuya dike. Heta Qenadê Kurdo digel ku navê Dîroka Edebiyata Kurdî li berhema xwe kiriye jî, cih nedaye tu romanûs, an çîroknûsê kurd. Sedema vê yekê ji ber nêzikdayînên me yên li lînguîstîk, struktuel, peyv û edebiyatê ye, wekî din jî kodên me yên kulturî, sosyolojîk, aborî û erkî ye.

Miletên ku tîkîliya wan bi hibrê (nivîs) re qels e, lê bi peyvê re, angî bi edebiyata devkî re xurt e, ji hêla pexşanê ve qels mane. Bêguman di afirandina tekstên pexşanî de zehmetî kişandine. Di vê heyama ku em tê de dijîn de, pexşan, bi taybetî jî çîrok dê bibe ku zimanê kurdî zemîn, aso û xwezayê nû bi dest bixe û bibe xwediyê hin stratejiyên nû yên vegotinê.

Tavilê dibe ku ev pirs bê bîra me; bi qasî helbesta kurdî çîrokên gelerî, çîrçîrok û xeberojkên kurdî jî hem hene, hem jî xurt in. Gelo dê ev mîrat bi kêrî çîrok û pexşana kurdî neyê? Bêguman, kelepura kurdî ya xam çavkaniya edebiyata kurdî ya herî girîng û hêja ye. Lê mixabin divê em li vê derê rastiyeke vebêjin; karektera kelepura kurdî ya forma devkî jî helbestî ye û tesîra dengbêjiyê, hozaniyê bi awayekî xurt heye. Heta mirov dikare hin stran û hin çîrokên ku dengbêj distrên, an vedibêjin, wan wek destpêka modernîzma helbesta kurdî qebûl bike. Gava em dîsan vegerin ser îdiaya xwe ya ku em dibêjin bi taybetî çîroka ku dengbêj vedibêjin, an jî distrên, hem jî hêla şêwe û hem jî hêla muzîkê ve nêzikî helbestê ne. Ji ber vê yekê jî, divê mirov tîkîliya çîrokên gelerî û yên nûjen baş binirxîne. Ji ber ku wek me berê jî got, bi qasî nêzikî helbestê ne, ew qasî nêzikî pexşanê ne jî. Mirov dikare bibêje ku di çîroka modern de jî, hin caran tesîra vê yekê bi awayekî xurt heye, an jî carinan çîrok û helbest tevlihev dibe. Hûn bawer bikin rola helbestê ya di çîroka modern û di ya gelerî de ne yek e; sedema wê jî ev e: muzîka (helbestbûyîna) çîrokên gelerî nêzikî ristê ye,

muzîka (helbestbûyîna) çîroka modern nêzikî hevokê ye. Eger nivîskar û xwendevanên edebiyata me baş li dengê zimên binihêrin ew ê tê bigihîjin ku ez dixazim çî bibêjim.

Belkî jî hemû hewldana çîrokê ev e: gerîna li deng û çalakgeriya xwe ya hundirîn. Ger ev her du xusûsiyetên çîrokê xurt bibin û tîkîliyeke hevokê bi mekan, tişt û camidan re deyne, ew ê çîrok bibe xwediyê atmosfereke xurt û wê mirovan bi awa û bi şêweyekî xurt vebêje.

-II-

Çîroka kurdî bi Mele Mahmûdê Beyazîdî (1799-1867) dest pê dike, lê belê wekî ku hûn jî dizanin heta demê dirêj gelek rewşenbîr, dîrokan û nivîskarên kurd wek çîroka yekem çîroka Fûat Temo ya bi navê Şiwêş qebûl dikirin. Lê Firat Cewerî di Antolojiya Çîrokên Kurdî de dibêje ku Ferhat Pîrbal wek çîroka yekem “Çîroka Mem û Zînê” ya Mele Mahmûdê Beyazîdî dihesibîne. Li gorî vê agahiyê çîroka kurdî ji sala 1956’ê vir ve diherike û her dihere xurt dibe. Di xurtbûna çîroka kurdî de gelek rojname û kovarên kurdî rolên girîng listine; Kurdistan (1898), Rojî Kurd (1913), Jîn (1918), Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-1945), Roja Nû (1943-1946), Tîrêj, Jiyana Rewşen, Pelîn, Nûdem, Dûgir, Nûbihar, Kovara W û hwd.

Kovar hem bûne dibistanên edebiyata kurdî û hem jî bûne êkolên edebiyata me. Li gorî zanînan di dest me de Kovara Hawarê roleke girîng listiye di bûneweriya wêje û giyanê nivîskarê kurd de. Bêguman çîroka kurdî rehên xwe di Kovara Hawarê de xurt kiriye û gihîştîye van rojan. Di nava ekola Hawarê de, bi taybetî yên bi çîrokê re tîkildar bûne Nûredîn Zaza (1919-1988, Maden) û Qedrîcan (1934-1972, Dêrika Çiyayê Mazî) in; ev her du nivîskarên hêja ne bi tenê endamên ekola Hawarê ne, di heman katê de pêşengên çîroka modern a kurdî ne jî.

Celadet Bedir Xan ji bo Nûredîn Zaza digot; “Çexovê Kurdî.” N. Zaza gerok e. Secera wî ya dûrketinê, ya sirgûnê gelekî dirêj e, ji Sûrî dest pê dike li Îraqê li Libnanê li Swîsrê bi awayekî erjeng didome.

Nûredîn Zaza mirovekî pîralî bû; wî wek rewşenbîr, nivîskar, siyasetvan xizmet ji gelê xwe re kir, lê digel jêhatîbûn û çalakgeriyê jî bi kansêrê mir. Gelek berhem, nivîs û bend bi zimanê erebî, kurdî û frensî nivîsand, ji vana yên çapbûyî ev in; Şerê Azadî (helbest, kurdî), Constes El Li Gendes Du Kurdis (frensî), Ma Vie De Kurd (frensî), Keskesor (çîrok, kurdî), Destana Memê Alan (amadekar û pêşgotin), Şivanê Kurd (werger, Erebo Şemo).

Nivîskarî rewşenbîrî û siyasetmedariya Nûredîn Zaza, mirov nikare ji ekola Hawarê û endamên wê yên hêja wek Celadet Bedir Xan, Osman Sebrî, Qêdrîcan, Cegerxwîn veqetîne. Nûredîn Zaza, ji bilî çand, ziman û edebiyata kurdî, wek siyasetmedar jî tevgeriyaye. Di sala 1957'ê de Partiya Demokrat a Kurd ava dike, di sala 1949'ê de ew û çend hevalên xwe "Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewrûpa" ava dikin. Li Siwîsrê rojnameyeke bi navê Dengê Kurdistan derdixe li Bêrûdê berpirsiyariya radyoya kurdî dide ser milê xwe. Bi kurtasî kar û barên wî yên siyasî û edebî bi hev re dimeşin.

Çîrokên Nûredîn Zaza û Mijarên Wan

Bi tevayî çîrokên N. Zaza yên li berdestê me, deh heb in; ji van çar heb jê adaptasyon in. Çîrokên Zaza; Xurşîd, Gulê, Keskesor, Perîşanî, Hevîna Perîxanê, Şerê Mêşan in. Adaptasyonên çîroknûs ev in; Derketî, Stêrk, Xatûn û Piling, Dê û Xwişk, çîroka "Şerê Mêşan" di sala 1965'ê de di Hêviya Welêt de çap bûye, yên din di navbera salên 1941-1943'yan de di kovara Hawarê de çap bûne. Mirov çîroka Nûredîn Zaza dikare bike dû heyam;

1- Heyama Hawarê

2- Heyama Hêviya Welêt

Her tim şert û mercên civakî, aborî û polîtîk tesîr li ser mijarên çîroka kurdî kiriye. Babetên çîroka kurdî bi dîroka kurdî re, bi têkoşîn û tevgerên kurdî re têkildar in. Jixwe bi piranî wêjekar û nûserên kurdî zehmetî, êş û zordariya dagirkeran li ser gelê wan ferz kirine, anîne zimên, lê hin caran mijarê kiriye ku ji hêla hunerê ve ahenga çîrokê xera bibe. Heta bûye sedem ku gelek nivîskar heman mijarê hema çi bigire bi heman şêwe, hest û nêzikdayînê binivîsin.

Di dema çîrokên Nûredîn Zaza çap dibûn de babetên çîroka kurdî bi taybetî jî yên çîroka başûr, Ferhad Shakelî wiha radigihîne me.

1- Di salên 1940-1950'î de Îraq ji hêla Brîtanyayê ve dihate îdarekirin. Di wê rewşa monarşiyê de, temaya zêde dihate nivîsandin têkoşîna rêncber û gundiyan a ku li hember begên feodal dihat kirin, bû.

2- Di salên 1960'î de zilm û zordariya li ser jinê û meseleyên bertilê bûn.

3- Piştî salên 1960'î, têkoşîna rizgariyê, pirsgrîrêkên jiyan û felsefeyê di jiyana modern de jiyan, jiyana cinsî, pirsgrîrêkên şexsî an takekesî bûn.

Di heman wextê de gava em li çîrokên ku N. Zaza nivîsandine dinîhêrin, mijarên wan ev in; Rola perwerdehiyê, xwestina tiştên pak ji bo hemû mirovan (Xurşîd), hezkirina welêt û ji bo wê têkoşîn (Gulê), serhildana Şêx Seîd, hezkirina xakê û ji bo wê têkoşîn

(Keskesor), evîn evînên bêbersîv, ên nivîplatonîk (Stêrk), paşdemayin, zilm û zora li ser gel, nezanî, belengazî (perîşanî), tolhildan, hezkirin (Hevîna Perîxanê), sirgûn, ji kultur û zimanê xwe dûrketin, bandora sirgûnê ya li ser giyanê mirov (Derketî), dudilî (Xatûn û Piling), serpêhatiyên mirovên neçar, mehkûm û kêliyên wan ên jiyanê, aciziyên ruh (Şerê Mêşan).

Ji Hêla Edebî ve Hin Ciyawaziyên Çîroka Nûredîn Zaza

1- Çîroka Nûredîn Zaza, awêneya siyaset, civak, psîkolojî û guhertinên dema xwe ye; hemû teferuatên nava jiyanê bi awayekî neqane, zelal û herikbar vedibêje, taswîr dike. Carinan hin tiştên di jiyana mirov de ku ji rêzê ye mirov ji nêz ve nas dike, bi awayekî ne ji rêzê, lê bi raz vedibêje, mînak; çîroka Şerê Mêşan.

2- Çîrokeke bûyerî ye ne ya rewşê ye. Çîroknûs hemû lehengên xwe bi ruh gewde dike. Psîkolojiya wan bi awayekî balkêş vedibêje.

3- Çîrokên pedagojîk, polîtîk û tund in; şêweyê vegotina wî dike ku tundbûyin nebe qisûr ji çîrokan re, ango qisûr bûye xusûsiyeteke nivîsa wî.

4- Rêgezên çîrokê yên çarçoveya derve û ya hundir bi awayekî biserketî bi kar aniye, wekî ku tê zanîn kurteçîrok ji peyvên wê bigire heta bédengmayina wê, tu tiştêkî li wê bibe bar qebûl nake. Bi gelemperî Nûredîn Zaza, xwe ji van zêdayiyan parastîye, lê carinan kêşeya kurdî li hember meseleyên civak û welêt û tevgerê li çîrokên Nûredîn Zaza bûne bar.

5- Çîroknûs, bi bikaranîna sembolan, bi zimanê xwe yê zelal di hişê mirov de îmajên curbucur çêdike.

6- Di çîrokên nivîskar de, cih û tişt roleke girîng dilîzin û dibin sersebebê atmosfereke xurt.

7- Diyalogên wî zindî ne. (Çîroka Xurşîd)

8- Di hevokên çîroknûs de muzîka hundirîn xurt e, di hin cihan de tehma helbestê jê tê. (Çîroka Derketî)

9- Zaroktî paşxaneya çîrokê ya herî xurt e. Çîroknûs ji jiyana xwe ya zarokiyê hin kêlî bi kar anîne. Jixwe çîroka "Keskesor" bi forma kesê yekem nivîsiye.

Serpêhatî û bîranînen çîroknûs di çîroka wî ya bi navê "Şerê Mêşan" de jî roleke girîng lîstîye. "Şerê Mêşan" ku em wek berhema "Heyama Hêviya Welêt" bi nav dikin, ji gelek hêlan ve ji yên din vediqete. Bêguman, ger çîroknûs di çarçoveya "Şerê Mêşan" de çîroknûsiya xwe bidomanda û tevger û çalakiyên hundirîn di çîrokên xwe de xurt kiribûya, ew ê mîrateke xurt ji me re mabûya, lê mixabin di destê me de zêde tişt tune ne. Lê ez hêvîdar im ku rojekê kesên ku arşîva wî li cem xwe diparêzin wan çap bikin, dibe ku wê çaxê tiştinê balkêş derkevin holê.

**Ev gotar di çalakiya "Çaremîn Roja Çîrokan a Cîhanê" ya ku li Amedê hat lidarxistin de, hatiye pêşkêşkirin.*

Dr. Nûredîn Zaza û 'Derketî'

Yildiz ÇAKAR

Jiyaneke ji sirgûniyê pêkhatî tê bîra mirov, dema behsa Dr. Nûredîn Zaza tê kirin. Wek gelek rewşenbîr û siyasetmedarên kurd wî jî ji vê jana kurd ku bi sedsalan e bi xwînê derbûye, para xwe girtiye. Di jiyana xwe ya sirgûniyê de Zaza, di warê siyasî û edebî de gelek xebatên serkeftî û bi rûmet kirine.

Ji zaroktî heta dawîya jiyana xwe, di nav êş û jan û zordestiya sirgûniyê de, aliyê xwe yê afirînerî yê dewlemend her carê daye jiyandin. Di sirgûniyê de jî, ji Sûrî heta Îraq, Lubnan, Urdin û Swîsreyê, jiyaneke biêş jiyaye û ji bo welatê xwe çî ji destê wî hatiye texsîr nekiriye. Lê di gelek waran de jî Zaza nehatiye fêmkirin. Îro kirinên wî û nivîsên wî rastiyekekê derdixê pêşberî me. Di 1957'ê de bingeha Partiya Demokrat a Kurd û pişt re jî, li Ewropayê Komeleya Xwendekarên Kurd ava dike. Di van xebatên xwe de rastî gelek êrîş û neheqîyan jî tê. Di nava kirinên wî de rojnameyeke bi navê "Dengê Kurdistan" jî heye. Navê wî yê eslî Yûsûf Ziya ye. Di sala 1919'ê de li Madena Elezîzê hatiye dinyayê. Ji ber sedemên siyasî yên wê demê, Zaza mecbûr maye ku derkeve xerîbiyê. Di sirgûniya xwe de Zaza, di gelek welatan de rastî êrîş û çewisandinan hatiye. Her wiha, di salên 1960'î de binçavkirin û girtin jî ji Zaza kêmkirine.

Dr. Nureddin Zaza, di vî sirgûniya xeter de, li Swîsreyê di Zanîngeha Lozanê de jî dest bi xwendinê kiriye. Beriya ku jiyana xwe ji dest bide, ji bo zimanê kurdî ketiye nav tevgeran û hin klasîkên kurdî wergerandiye zimanê biyanî.

Gelek nivîsên wî di kovarên Hawar û Ronahiyê de cih giritine. Mem û Zîna Ehmedê Xanî û 'Ma vie de Kurde' 'Wek Kurdek Jiyana Min' Bi wergera wê ya frensî hatiye çapkirin. Û hin gelek nivîs û wergerên wî yên ku nehatine çapkirin jî hene.

Dr. Nureddin Zaza di sala 1988'ê de bi nexweşîyeke reş ji hezkiriyên xwe li sirgûnê koça dawî kir...

Ji bilî aliyê wî yê siyasî, aliyê wî yê edebî jî gelek xurt e. Bi taybetî jî çîrokên Zaza ji aliyê nûjenî û ji aliyê estetîkê ve bala mirovan dikişînin. Wek di hinek çîrokên wî de êş û bîrînên ku çawan di jiyana de li mirovan diqewime, ew bixwe jî heman tiştan di jiyana xwe ya sirgûniyê de jiyaye. Ew bi xwe hestên payebilind, hem di jiyana xwe de, hem jî di nivîsên xwe de bi zimanekî hestewar û xwerû aniyê zimên.

Dr. Nureddin Zaza, di gelek waran de xebatên serkeftî kiriye û berhemên nûjen nivîsandîye. Pirtûka wî ya Keskesor ji aliyê Nûdemê ve di sala 1995'ê de li Stockholmê çap bûye. Di vî pirtûkê de 10 çîrok hene. Her çîrokeke wî ji aliyekî ve jiyana Zaza temsîl dike. Wek çîroka 'Derketî' li ser sirgûniyê, li ser wan kesên ku ji malbata xwe û ji warê xwe dûr ketine tîne zimên.

'Terka welatê xwe da û kete dinyayê. Xwedê rêberiya derketiyan bike!' Dinya aliyek, axa welêt aliyek, gotinek heye dibêjin 'Bilbil kirine qefesa zêrin jî dîsa gotiye ax welatê min.' Tenêtiya di nava qelebalixan de Zaza gelek baş aniye zimên di vî çîroka ku bi hilmekî re tê xwendin de.

Ez di nava miletan de derbas bûm, li min nêrîn, min li wan nihêrt; Lê me hevdu nas nekir. Derketî li her derê bi tenê ye!' Di vî hevokê de jî jixwe diyar dibe ku tenetî li her derê tenetî ye. Te divê bila bihuşt be, tenetî li her derê tenetî ye.

Gava roj diçû ava û ji xircikên newalan dû û dûman radibûn; min ji xwe re digot: Çiqas bextiyar e ew mirovê ku êvaran vedigere mala xwe û di nava zar û zêçên xwe de rûdinê.' Navê bextiyariyê tune ye. Ji bo her mirovî wateya wê diguhere. Lê li ser vî erdnîgariyê jiyaneke aram bextewariyê bêhempa ye û xeyalek e ku ji sedsalan bi têkoşinan, bi sirgûnan, bi kuştin û êşkenceyan ve heta îro hatiye. Zaza ji di vî çîroka xwe de tîne zimên ku li dinyayê tu tişt wek axa mirov nabe û tu aramî, xweşî û bextewarî wek miletê mirov nabe. Tenetîya Dr. Nûredîn Zaza, di vî çîrokê de ku di sala 1941'ê de di Hawarê de hatiye weşandin, xwe baş dide der. Her hevokê ve çîrokê wek helbesteke ku axîna dil birijîne ser kaxiz hatiye nivîsandin.

“Ev dar spehî, ev kulîlk xweşik in; lê ev ne dar û kulîlkên welatê min in: Tu tiştî nabêjin min. Derketî li her derê bi tenê ye!” Di vê hevokê de jî tê xuyakirin ku xweşiya hemû dinyayê nake tu tişt li ber kulmek axa welat, pelên darekê û kulîlkeke stûxwar a welêt. Bîranînên mirov, xeyal û zaroktiyên mirov parçeyên jiyana mirov amade dikin ji bo pêşerojekê. Ger, ev paşeroj û pêşeroj li hev nekin, li aliyekî bîranîn, li aliyekî zaroktî û li aliyekî din jî xeyalên mirov dimire. Ev mirin bi xwe re mirineke ruhî jî tîne. ‘Derketî’ hem qala mirineke ruhî dike û hem jî qala hêviyeke ku îro nebe... sibê dike. Mirin û hêvî her du jî du neyar in ku her tim li hev diqelibin. Her du jî li ser qadekê hev dişopînin.

“Ev çem bi dilekî şikestî li deştê diherike; lê xurîna wî ne wek a çemê me ye ku min di zaroktiya xwe de dibihîst; ev tu tiştî nayîne bîra min. Derketî li her derê bi tenê ye! Ev stran şîrîn in; lê ahengên wan ên geş û zîz ne wek ên stranên welatê min in. Derketî li her derê bi tenê ye!” Di van hevokan de jî mirov dikare hestên wî yên li ser welêt bêşîrove bibîne. Hestên di vê çîrokê de; “Derketiyê reben! Ev girîn û zarîn bes in! Pir wek te dût hatine xistin; her kesî wek te windabûna bav, bira û hevalên xwe ditiye. Hêviya xwe vejîne û xwe ragire; tu yê jî rojekê bigihîjî miraz û armaca xwe, heke îro nebû jî...sibe!” bi hêviyêkê dawî dibe. (Hawar, hejmar 29 Hizêran 1941)

Çîrokên li ser welêt, sirgûnî derûniya jana dilê Zaza, hinek be jî dide der. Ne tenê ev çîrokên Zaza, yên li ser evîniyê jî hene. Wekî minak çîroka ‘Stêrk’ çîrokeke evînî ye.

Di çîroka ‘Stêrk’ de qala şivanekî ku dil berdaye keça axê tê kirin. Çîrokên wek şivan û keça axê tîn zanîn; bi hezaran sal in li ser vî erdnîgariyê bûne helbest, gotar, stran, kilam, çîrok... Çîroka şivanekî belengaz ku dema li ber pezê axê ye çav li keça axê dikeve û evîna wî ya ku bi dîlpakî û wek xeyalekê dijî, bi zîmanekî estetîk û hestewar di vê çîrokê de hatiye zimên. Vê çîrokê, para xwe ne tenê ji estetîkeke ji peyvyan pêkhatî, jî hin baweriyên ku di nava civakan de wek destanan hatiye zimên jî, girtiye.

Wekî minak: “Binêre! Di ser serê me re: Komika Sêwiyan e, ji rojhilatî hiltê û ber bi rojavayî diçe. Hinek li bakûr, Termê Mixêl e heft in li rastê wan, Dûpişk e, her gav li bakûr e. Li ber me ye Kakeşîn e. Hinek li çep; Kerwankûj e, wek Stêrka Sibehê ye. Ji lewre kerwanek pê xapiye ketiye rê, û bi şev ji sermê qufuliye. Hinek li nîvro Lêl e; dibêjin ko Lêl û Mecnûn hê jî hevdu dikirin lê ne digihan hev; gava mirinê


giyanê wan derketine ezmên, yek çûye rojava, yek jî rojhilat. Li zivistanê Mecnûn li zozanan e, û Lêl li germiyan e. Havînê Lêl tê zozanan û Mecnûn diçe germiyanan û gava ji cem hev derbas dibin digihên hev, hevdu maçî dikin û pişt re her yek diçe aliyê xwe.” Hêmaya asîman û gelek çîrokên stêrkan di vir de ji xwe re cihekî xweş bi dest xistine. Ne tenê ew ew destanên ku Lêl û Mecnûn, ew karwanên ku li dû stêrkekê hatiye xapandin, hîn jî wek têgeh, wek hêma û wek rastiyeke evînê ya sûrealîzmê dijî.

“Şev xweş û hinek hênîk bû. Di dora me de cîhaneke veşartî bédeng şiyar dibû. Di her tiştî de ez bi livînekê dihesiyam; giya mezin dibûn, kulîlk vedibûn, mêwe digihan... Dilê wan jî wek ê min dibezîya... Stêr bi xwe radibûn û rûdiniştin.” Tehma şev û stêrkan, bédengiya cîhaneke veşartî, vebûna kulîlkan, tevgera xwezayê ku di vê çîrokê de wek dilê şivanê evîndar gihane hev û hemû tevgerên ku di vir de hene, bi hestên ku ji her aliyê ve evînê diparêzin zindî dike. Keça axê Mijgan ku rojekê bi bêhemdê xwe, ji dêvla pîrê, xwarina ku ji pazdeh rojan carekê ji şivan re diçû biribû jî şivên re, Xanima Mijgan li zozanan, di bin stêrkên ku her yek wateya xwe di xwe de dihevine de şevê bi şivên re derbas kiribû... Ev wekî xeyalekê bû ji bo şivan.

“Bû şev. Min ji xanima xwe re di holikê de ji pûşan û ji postê berxikeke paqij nivînek çêkir.” Pûş û postê berxikan hîn jî li zozanan û li gelek cihan tê bikaranîn. Ne tenê ev, di vê hevokê de jî derbas dibe wek kulavên şivanan: “Di wê gavê de deriyê holikê vebû û wek heyva çardeşevî keçika delal jê derket. Ji mayîna xwe; û ji ber nivînê ji pûş û pelaş xew lê çûbû, hat û li ber agir rûnişt. Min kulavê xwe ji xwe kir û danî ser milê wê, agir vejand û bédeng li cem wê rûniştim.”

Şeveke Tîrmehê, şivan û keça axê di bin stêrkên geş de tenê şevêkê rastî hev hatibûn. Dilê şivên û serê Mijgan ku bi xewê daketibû ser milê şivano, “tu caran ezmanekî mina ezmanê wê şevê kûr û stêrk wek ên wê şevê geş neditibû.”

Her çîrokek N. Zaza, jiyanekê, helwestekê û êşekê diweşîne ser hestên mirov. Derketî û Stêrk, tenê du minakên jî vî jiyanê ne. Xwendina di her carê de, dê hestên sirgûnî û hevîyeke nûpişkivî biafirîne li ber dilê hezkiriyên N. Zaza. Dê rojekê, jiyanê sirgûnî û bi birînen welatî ku bi sedsalan e didome, dawî bibe...û bila êdî ‘Derketî’yên me vegerin malê, stêrk, heyy û roj bibe para wan...



Nûredîn Zaza û Kurtenivîsek Li Ser Çîroknûsiyê

Edîp POLAT

Kevneşopiya kurteçîrok, çîrok an çîrvanokên kurdî, ji hev cihê ne. Zargotin ne tê de, ji bo kurteçîrokê mirov dikare bibêje ku ew bi mîrata jiyana bajarvaniyê û surgûniyê ve girêdayî ye. Di kurdî de cihêtiya di nav van her sê teherên nivîsê de jî di sedsala 20'ê de derketiye holê. Çîrokên ku bi şevan li civatan dihatin gotin, kengê derbasî qada nivîsê bûne? Bersiva vê pirsê belkî "di van salên dawî de" ye. Nepêkanbûna pîvana vê yekê deynin aliyekî, lê divê em çêla tesîra van çîrokan li ser pexşana nûjen bikin. Jixwe, zimanê kurdî ji bo sohbetên şevbêrkan, mijûliya li civat û caxiyan, an gotina çîroka serpêhatiyekê gelekî afirîner, herikbar û xwedî tevneke zengîn e. Lewma peyva ku ez dê dawiyê bibêjim, ji niha ve dikarim eşkere bikim ku di pêşerojê de di nava teherên pexşana kurdî de dê kurteçîrok û roman her li pêş bin.

Heke mirov kurteçîrokê weke "bilêvkirina bûyereke di demeke kurt de pêkhatî" tarîf bike, di zargotinê de tiştekî wisa tune ye. Ji ber çi? Kurd beriya zimanê wan bibe nivîskî, qewimînan an metelokan dûr û dirêj gotine, him bi vî awayî wext derbas kirine, him jî bi bûyerên serxwezayî bala guhdaran kişandine. Dibêjin diroka çîrokê ji Mele Mahmûdê Beyazidî dest pê dike, lê "Mem û Zîn" a wî, ne kurteçîrok e, lê çîrok e. Nivîskarê çîrokê bixwe, di serî da qala Ehmedê Xanî dike ku ew çîrok di tesîra berhema Xanî de hatiye nivîsin. Di kovara Rojî Kurd de çîroka Fûat Temo di sala 1913'ê de hatiye weşandin. Dema mirov vê çîroka Şewêş û bavê wî yê şivan dixwîne, dibîne ku weke çîrokên niha nûjen, bûyerhonandî û bimeraq nîn e. Jixwe bûyer ne balkêş e, ji ber ku tenê nexweşiya şivanê gund û berketina kurê wî, alîkariya gundiyeckî tîne zimên. Mirov li gor pîvanên niha bifikire, belkî hin kes wê weke çîrok nehesibînin jî. Lê ji aliyê kurtbûna nivîsê û bilêvkirina bûyereke tenê

ve, bûye kurteçîrokeke ne balkêş.

Di kovara Hawar, Ronahî, Roja Nû, Hêvî û hwd. de jî çîrok hatine weşandin. Ev mîrat çiqas xurt e gelo? Ji bo çîrokên pêşketî û yên bikaribin bi çîrokên dinyê re kayîşkêşanê bikin, ev bes in? Na, ji ber ku her sê teherên ku min li jor got di nava hev de ne. Lê asta zimanê kurdî niha gihîştîye merheleyeke ku dikare kurteçîrokên nûjen ên hêja biafirîne. Vê yekê dest pê kiriye û çiqas ji bin bandora siyasetê (xasma durûsmeyan) û kirûyên taybet, hestiyariya nivîskar û dengbêjan derê, ew çend dê bi pêş bikeve. Balkêş e ku di çîrokên berê de mijar pir girîng e û li pêşiya bedewiya peyvê û hevoksaziyê ye. Lê, weke tê zanîn bûyereke gelek ecêb jî bi tevneke nexweş, sistematîkeke nelihevhatî an bi hevokên dubarebûyî û jî aliyê peyvan ve qels, dikare were lewitandin. Li dijberî vê yekê, bûyereke ji rêzê jî aliyê nivîskar ve dikare ew çend were honandin, meraqkêş û balkêş were gotin ku, tama edebiyatê jê bifûre. Di çîrokê de bûyer, şeweya jiyanê, peyvên negotî û yên di dil de derbasbûyî, bi peyvên pêşiyên, bi îdyoman dikarin werin derbirîn. Yek dikare bi nêrîna xwe, bi "ez" an "min" dest bi çîrokê bike, dikare bi "tu" an jî bi "wî" dest pê bike û dikare bi çavê xwedayî her tiştî bibîne, hemî hestan bihesêne, peyvên negotî yê di dil û mêjiyan de, weke ku tîne bihîstin binivîse. Dikare xwe tîke dewsa qehremanên çîrokê, dikare gotina bûyerê ji dawiyê de bide destpêkirin û dikare weke labîrent bide nîşandan ku serê xwendevan biwestîne, ji bo ew careke din hewceyî xwendina wê çîrokê bibe. Di dinyayê de çi çîrok an romana ku bi carekê re û bi hêsanî bête famkirin, ew dê sivik be û zûka were jibîrkin. Nivîskar carna dikare hin pirsan an leystikan di nava çîroka xwe de veşêre jî. Qedrîcan di çîroka xwe ya di Hawarê de weşandî (hejmar 39) qala serpêhatiyekê xwe kiriye, Celadet Bedirxan "Gazîncaxencera" xwe bi pênûsê re gotiye, lê derdê kurdan yê ku Ehmedê Xanî di ristên xwe de xistiye nav çîroka xwe û bi vî awayî jî wî zimanê xwe yê şîrîn qels kiriye. Nûredîn Zaza di çîroka xwe ya "Gulê" de terzê kurteçîroka nûjen pêk aniye. Ew jî ji nîfşên Hawarê ye, bi Mîr Celadet Bedirxan re dest bi karê nivîsê kiriye. Weke tê zanîn destana Memê Alan jixwe ji edebiyata devkî tê, lê wî ew kiriye çîrok û derbasî nivîskî kiriye. Çîrokên wê yên ku ji aliyê weşanxaneyên Nûdemê ve hatine tomarkirin, bi navê "Keskesor" hatine çapkirin. (Bi maneya ji her rengî, ji her mijarî çîrok!) Weşanxaneyê ev nav li pirtûka wî ya çîrokan kiriye. Çîroka wî ya bi navê "Gulê" ku di Hawarê de çap bûye, di Antolojiya Çîrokên Kurdî de (Fîrat Cewerî) derket. Vê çîrokê bûyera di navbera Qoço, Gulê û gundiyan de bi terzê çîrokê aniye zimên. Gulê jineke gelekî xweşik e, bejnzirav û lihevhatî ye, lê di nava gund de weke "qahpik" navê wê derketiye. Wê

çi kiriye, çima jê re dibêjin qahpik ev ne diyar e, ev mijar li derveyî îskeleta çîrokê ye. Tenê tê zanîn ku bavê wê ew bi zorê daye yekî, wê mêrê xwe kuştiye û bi pey Qoçoyê mehkûm ketiye. Yekîneyên dijmin bi tenê dûrahiya qonaxekê ji gundê wan dûr bûne. Gulê ji ber ku ji aliyê gundiyan ve weke “qahpik” tê binavkirin û evîndara Qoço ye, dema qala nêzîkbûna dijmin têtê kirin, ew radihêje xencerekê û ji gund di-reve. Di vir de du tişt hene ku veşarî ne. Gelo Gulê çima wiha tevdi gere? Her wiha meraqa xwendevan di serî de dilibite: Gulê diçe ku derê? Gunehên Qoçoyê Pola jî di pazdeh salan de civiyabûne. Ew bi çil zilamên gundî re kemînê davêje pêşiya dijmin. Qoço jî ji Gulê hez dike û di wê kemînê de dibînin ku ji nişka ve Gulê ji nava yekîneyên dijmin ber bi wan ve tê. Yek ji gundiyan dibêje “Qahpikê me xistiye dafikê, tivingê berdinê!” Li vir dijberiyek heye, dîsa meraq zêde dibe. Gelo çima? Ew ji ku derê tê, çi kiriye? Gelo Gulê cihê wan ji dijmin re nîşan kiriye? Ev di çîrokê de varyantek e, zêdekirina perosê vedijîne. Ger Gulê wê gavê bi berika Qoço neyê kuştin, dê ev çîrok xweş nebe. Piştî kuştina Gulê ew çil zilam êrîştî nava yekîneyên dijmin dikan. Dijmin ji ber wan direve, lê ew di odeyekê de tiştêkî ecêb dibînin. Serê zabîtekî dijmin hatiye jêkirin û di nava destê wî de gurzek porê zer yê Gulê têtê dîtin. Xencera ku berî wê gavê Qoço dabûye Gulê, li ser nivînan diçirise.

Peyva Qoço ya dawî ev e: “Me ji Gulê re qahpetî kir!” Çîrok xelas dibe, lê serê bûyerê vekirî dimîne, angî xwendevan nizane Qoçoyê ku diçe nava yekîneyên dijmin dimire an na. Her wiha xwendevan bi cesedê Gulê jî nahise û nabîne. Wî zabîti çi kiriye ji Gulê û wê ew çawa kuştiye? Ev jî ne diyar e! Lê bi hinceta hevokan ew têtê famkirin. Tama çîrokê di vir de veşarî ye. Li gor pîvanên kurteçîroka nûjen, bi her awayî tevna vê çîrokê rast û durust e. Ji çend alîyan ve mirov dikare vê çîrokê binirxîne. Bûyer yek tenê ye, di demek kurt de pêk hatiye, meraqa xwendevan dide ser nivîsê û di heman demê de mirov ecêbmayî dihêle. Mêzîna wijdanê derdixe pêş, qehremanî jî heye û fikra ku “parastina welêt di ser her tiştî re ye” tîne bîra mirov. Mirov dikare gelek fikrên din der heqê vê bûyerê de bibêje.

Nûredîn Zaza çar pirtûk nivîsiye û gelek nivîs û çîrokên wî yên neçapkirî jî hene. Hin ji van çîrokan ên ji bo zarokan in. Dudo ji wan Mar û Mirov û Dîk û Rovî ne, ku ew di der heqê têkiliyên ajal û mirovan de ne. Pirtûkeke wî jî di nav weşanên Pêrî de bi navê “Weke Kurdekî Jiyana Min” (Bir Kürt Olarak Yaşamım) bi tirkî çap bûye.

Di dema nivîsîna van çîrokan de, ji ber sedemên siyasî rewşenbîr û siyasatmedarên kurd mecbûr mane ku jiyana xwe li welatê xerîbiyê bidomînin. Serkêşiya grûbên sirgûnê, ronakbîrên siyasatmedar bûn, nasnameya wan a têkoşînê li pêş e, ne ya nivîskariyê, angî ew ewil partîzan bûn pişt re bûbûn helbestvan an nivîskar. Ev yek bi xwe re tesîra îdeolojiyê an siyasatê li ser berhemên wê demê aniye û pêşî li mijarên wêjeyê yên curbicur girtiye. Jiyana rewşenbîran ya li Ewropa û berî wê jî ya li Sûrî, wan ji jiyana nava gel, pêkenok, zargotin, çîrok an çîrvanokên nava jiyana kurdan a rojane dûr xistiye. Me di serî de got ku dîroka çîrokê li sirgûnê dest pê kiriye, ne li welêt. Vê yekê nehiştiye ku hunera çîrokê, berhemên hêja û nûjen bîne afirandin. Asta çîrokê ya ku niha em dijin, gelên din ên dinyayê sed sal berê li pey xwe hiştine. Ziman û wêjeyêke pêşketî û afirîner di nava gelê xwe de kok digire, xwe nuh dike û berhemên hêja û sipehî dikare vejîne. Lê di bin zordariya asîmilasyonê de wê demê û pişt re jî ne pêkan bû ku wêje li welêt bête afirandin, pirtûk werin çapkirin û belavkirin. Bi awayekî profesyonelî, di şertên azad de nivîskariya kurdî dikaribû him çeşnên pexşenê vî zimanî bişitilîne û av bide û him jî qayîşê bi edebiyata cîhanê re bikişîne. Mixabin ev pêk nehatiye. Di helbestê de Cegerxwîn, di çîrokê de Nûredîn Zaza, di gramera ziman de Celadet Bedirxan, di romanê de Ereş Şemo, heke ne li xurbetê bûna, li welatê xwe wê demê tenê nivîskarî bikirina, dê rewşa wêjeya kurdî wiha bûna?

Weke encam; ger çîrokên nûjen bi yên gelêrî xurt nebin, sûdê ji zargotinê negirin, dê tam û lezeta ziman wînda bikin. Li ser navê nûjeniyê dê zimanekî hişk derkeve holê.

Li gor şertên çar parçeyên Kurdistanê, çîrokbêjî an çîroknûsî rengên taybet girtine. Mînak li Kurdistanê Başûr ji ber serbestiya zaravayê Soranî, him helbest xurt bûye him çîrok. (Elaeddîn Secadî kovar weşandiye û di navbera salên 1958-1974'an de li zankoya Bexdayê mamostehiya edebiyatê kiriye.) Li Sovyeta berê, yekî weke Ereş Şemo di dema xwe de tenê roman û çîrok nivîsiye. Mirov dikare bibêje ku li Sovyeta berê nivîskarên kurd weke ekolekê tîn hesibandin û her wiha piştî 12 Îlonê li Swêdê û welatên Ewropa jî gelek çîrok hatine nivîsin, ew jî weke ekolekê ne. Lê di serî de ekola Hawarê pêşkêşiya hemû cureyên wêjeya kurdî kiriye.

e-mail: edipolat@hotmail.com

DESTPÊKA QONAXA NÛJEN A ÇÎROKNÛSIYA KURDÎ: *Çîrokên Ku Ji Rengê Sor ê Keskesorê Hez Dikin*

Sîdar JÎR

Wekî arketîpa çîroknûsiya kurdî ya hevçax û nûjen, bi hejmareke qitût û kêma kurteçîrokên xwe ve qonaxa çîroknûsiya kurdî ya nûjenziman û hevçaxziman daye destpêkirin. Yek ji wan kesayetiyan ku bûne awêneya nîfşê xwe, ku ew nîfş jî, nîfşê Hawarê ye, ligel Qedrîcan û Reşîdê Kurd ê helbestkar, Nûredîn Zaza îro dikare bi hêsanî were pejirandin ku destpêker û pêşengê çîroknûsiya vî zimanî ye.

Her çiqas ez ê hewl bidim ku çîroka wî ya bi navê “Gulê” hildim dêst û çîroka wî û mîrateya ku li pey xwe hiştiye bînim zimên jî, bi giştî ez çîroka Nûredîn Zaza bi navê Gulê bi nav dikim. Ji ber ku gul di hemû serdeman de gul e. Lewma jî divê em bikaribin wê gulê bi rengê wê yê ku Nûredîn Zaza dirûv û giyan dayê, bêhn bikin...

Di van çîrokên xwe yên ku bi hejmar gelekî kêma de, Nûredîn Zaza di hin waran de hêmayên klasîk ên wêjeya rojhilatî jî hev weslewesle kiriye, ji ber ku di wêjeya rojhilata navîn de hêmaya bîngêhîn gihaştin e, ango vûslat e. Lê wekî mînakê herî berbiçav, wî di çîroka xê ya bi navê “Gulê” de ev hêmaya klasîk serobinî hev kiriye û ev vûslatî jî hev çîrçirî kiriye. Lewma jî divê ku mirov dest bi veçîrîna çîrok û çîroknûsiya Zaza bike û ku mirov bixwaze mîrateya ku wî ji çîroka kurdî re hiştiye, divê berî her tiştî ew çîroka wî jî nû ve were deşîfrekirin û were bi darvekirin li dîwarê hemû odayên çîroknûs û çîrokbêjan.

Heta ku jê hatiye lehengên xwe û mijarên xwe ji nava tebaqeya civakê ya herî bi êş û kul hîlbijartîye. Gundî ne, şivan in, carnar evîndar in lehengên çîroka wî. Lêbelê, hemû lehengên di çîroka wî de bi tirs in, bi endîşe ne, di heman demê de jî wêrek in!.. Ev yek jî derdixê holê ku çîroka Nûredîn Zaza her çiqas lehengê xwe ji gundî û şivanan ango bi piranî ji xizan û êşkêşan hîlbijartîye jî çîrokeke modern a dema xwe nivîsiye. Yek ji tiştên ku tesîr li ser çîroka kurdî ya îro kiriye jî di çîroka Nûredîn Zaza de ev e. Lewma jî dibe ku rasterast tesîra Nûredîn Zaza be ku di çîroka kurdî ya îro de rîstêke wêrekî li lehengên jin ên di çîroka kurdî de ne, tê barkirin. Wêrekiya jinê di çîroka kurdî ya îro de jî berbiçav e. Bê guman dibe ku tesîr ji rewşa ku kurd tê de dijîn de jî tesîr wergirtîbe, lêbelê wekî çîrok, Nûredîn Zaza ev yek bi awayekî xurt kiriye.

Her wiha di çîrokên wî de, wekî sembola her dem al, ala kurdan hatiye bikaranîn û ev yek jî bi piranî di ser jinan re, yan jî bi jinê bi xwe hatiye kirin. Yanî al û jina kurd di çîrokên Nûredîn Zaza de xwedî ciyekî berfireh e. Bê guman, bi reng û dirûvekî din be jî ev hêma di çîroka nûjen a kurdan de hê jî wekî hêmayeke bîngêhîn heye.

Wekî çîrok, çîroka Zaza her wekî alê û jinê, ew jî mê ye û bêhtir eleqeyeke nêzîk, dilsoz û kûr dixwaze.

Di çîroka wî de stêrk jî her wekî al û jinê têgeheke mê ye û di çîroka wî de cihê xwe girtiye. Stêrk endîşe ye ji bo wî. Her ku li asîmên xuya bikin endîşeyek dest pê dike di çîroka wî de.

Nûredîn Zaza, bi çîrokên xwe ve rasterast qîrînek e, ku hiş û mêjiyê kurdan û kurdîhezan dihejîne. Di hemû çîrokên wî de xwendevan hew dibîne ku ji nişka ve aksiyon û aktîvîteyên ku di çîrokê de hin caran veşartî û hin caran jî aşkere ne, bi carekê re diçe lûtkeya herî berz û bi derbekê re stûyê xwînê bi ber ve tê û xwînê dikeve nava xeyalan. Peyvên wî jî rengên keskesorê, piranî jî rengê sor dirûvê xwe digirin... Di çîrokên xwe de hema mirov dikare bibêje ku di her kêliyê de ew bi xwe jî di nava xeyalên ku ji warê wan dûrketî de ye. Ji ber ku her çiqas dûrî welatê xwe -li mişextiyê- jiyabe jî, bi hesreta ku dê xwe bigihîne serbestî û azadiya welatê xwe ketiye nava xeyalan...

Vegotin û şayes her çiqas bi hêsanî hatibe kirin, zimanekî çiqas hêsan bi kar anîbe jî Nûredîn Zaza wekî ku di çîroka ‘Gulê’ de jî vedibêje, hunera qîrîna xwe ya hundirîn dide der. Çîrokên Nûredîn Zaza, her dem -her çiqas mijar şikestin û derbxwarin be jî- bi serkeftinekê yan bi destpêkekê û qet nebe jî bi hêviyekê diqede. Ev balkêşîya çîrokên Nûredîn Zaza



jî derdixê holê ku wî di wêje û her wisan jî di çîrokê de xwe li hêmayên klasîk ên rojhilatî negirtiye û bêhtir xwestiye derbekê hem li klîşeyên rojhilatî bixe hem jî li hêmayên wêjeya rojhilatî ku klîşe bûne bixe.

Di sedsala bîstan de, ku ev sedsal wekî sedsala şer tê zanîn, Nûredîn Zaza di nava şer û liberxwedanên li Rojhilata Navîn de, tirs nivîsiye, metirsî nivîsiye. Lê belkî jî yekem kes e li erdnîgariya Rojhilata Navîn tirs û metirsî yan jî xeyala tirs û metirsiyên xwe bi teşeyeke romantîk nivîsiye.

Di heman demê de di çîrokên xwe de li pey serdestî û azadiyê ye. Têgih û hêmayên serdestî û azadiyê bingeha çîroka Nûredîn Zaza ne.

Merdî û nemerdî, xayintî û dilsozî paradoksa ku di çîroka wî de bi ber lehiya xeyalên wî dikeve ye. Ev hêla çîrokên wî jî derdixê holê ku divê berhemek bêyî ku mirov şert û mercên ku ew berhem derxistiye holê neyê nirxandin. Lewma jî, Nûredîn Zaza wekî fenomenekê ye di nava çîroka kurdî de. Divê serboriyên Zaza û jiyana wî û di heman demê de şert û mercên wê demê jî li ber çavan be ku mirov bêhtir li ser çîrokên wî hûr bibe da ku kelepûr û mîrateya ku jî çîroka kurdî re hiştiye bêhtir bi gewde û giyan bibe.

Ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku çîroka Nûredîn Zaza ya bi navê Gulê, çîroka hemû çîrokên wî ye û her wisan, hemû tiştê ku xwestiye bibêje; serêş, mişextî, bindestî, xeyal, serîhildan, di nava şer û serîhildanê de evîneke şaşcebirî û xwesteka azadiyê hemû di vê derê de ye. Wekî ku bibêje, ev welat Gulê bi xwe ye û

ev Gulêya ku kesê ku bê dilê xwe zewiciye ev welat bi xwe ye. Welat û jiyan bi hev re dibin vebeyadina Gulê.

Heger çîroka kurdî û her wisan çîroknûsiya kurdî ya modern bikaribe, Gulêya Nûredîn Zaza, rast deşîfre bike, ji hev veçirîne û wekî nişdarekî ji hev de bixe û dîsa bi goşt bike, wê demê em ê bêhtir têbigihîjin ku ka Nûredîn Zaza çi mîrate ji me re hiştiye. Her wekî ku hemû çîrokên serdemên qedîm û yên herî nûjen bingeha xwe ji çîroka tofanê wergirtibin jî, ew çîroka Nûredîn Zaza ku dixwazim wekî nûnera çîroka wî bidim pêş, tofan çand û rewşa kurdan bi xwe ye. Çi êş û daxwaza kurdan a li jiyanê hebe bi çêjekê di xwe de di-hewîne.

Her çawan ku Maupassant di çîrokên xwe de xurifîn û nakokiyên civakî yên wê demê bi êşê ku her dem mirov mit dihele nivîsiye, Nûredîn Zaza jî bi heman rengî, ew êş û daxwaza civaka xwe ya wê demê û ya Rojhilata Navîn jî di nava wê de pê re nivîsiye.

Ji ber wê yekê Gulê heta derekê kurd e lê ji derekê pê ve ne kurd e tenê bindestek e ku li azadiya xwe ya winda digere. Ev yek jî bi şêwe û dirûvekî hevçax û nûjen ji bo çîroka kurdî ya nûjen bûye referansek.

Bi her awayî refleksên di çîroka ku ji pênûsa cenabê wî derketiye de, her dem di nava lêgerînekê de ye. Dibe ku wî ew lêgerîn di ser çîrokê re fikir, belkî jî çîrok ji xwe re fikir gopal û dar û dida ber xwe da ku xwe bigihîne welatê xwe yê ku jê hatibû bidûrxistin... Her çi dibû bila bibûya wî bi refleksên xwe yên mecbûrî mîrateyek ji çîroka kurdî ya nûjen re hiştiye ku em dikarin bi hêsanî li ser giyanê Gulê, li motif û reng û dengê kurdî binexşînin. Nûredîn Zaza, bi peyvên xwe yên ku ji rastekê dertên û xwe li gelî û newalên kûr radikişîne qonaxa çîroknûsiya kurdî ya nûjen daye destpêkirin. Peyvên wî yên ku di hemû tebeqeyên civakê de xwedî refleks in, di çîroka wî de xwedî rengên curbicur in.

Nûredîn Zaza û çîrokên wî yên ku piranî ji rengê sor ê keskesorê hez dike, rê vekiriye ku çîroka kurdî di sedsala bîstemîn de derbasî qonaxeke din bibe û gelî û newalên ditir ên cîhanî nas bike û bi wêrekiya Gulê berê xwe bide qada çîroka nûjen a cîhanê û bi hindiktirîn êş û jan derbasî qonaxeke din bibe.

e-mail: sidarjir@hotmail.com

Di Çîroknûsiya Kurdî de Pêl

Yaqob TILERMENÎ

Pêvajoya geşedana çandî, bi qasî ku mirov nikare tesewir bike digihîje serdemên kevn. Em bi rewşa xwe ya îro û bi beşek mezin a êşên xwe, deyndarê vê pêvajoyê ne. Veguherînên psîşîk ên ku bi pêvajoya çandî re dest pê kirine, gelekî eşkere ne. Ev veguherîn ji ber ku hedefên dozînî roj bi roj diguherin û ji ber ku hestên dozînî tîr çewisandin, derdikevin holê. Sansasyonên ku daxwazên me yên sereke şa dîkin, dûrî balkişandina me ye angoyê ketine halekî ku nayên ragirtin; ger ku daxwazên me yên der barê daxwazên etîkî û estetîkî veguherîbin, sedemên vî ya yên organîk hene.”

Mirov bala xwe bide gotinên jor ên ku Sigmund Freud di nameya ji Albert Einstein re şandiye de, dê têbigihîje ku ji bo beramberkirina duh û îro divê veguherînên ku her dem jîndar in, di ser guhê xwe re navêje. Heman beramberkirin ji bo beşek çandê, beşa wêjeyê jî derbas dibe. Ger mirov bixwaze berhem angoyê nivîskarekî ku berî bi deh salan jiyaye binirxîne, divê pêdiviyê bi du rêyan bibîne: An dê mirov xwe di ser zemên re gav bike û vegere salên rabirdûyê û li gora şert û mercên wê serdemê nivîskêr û berhema wî binirxîne, angoyê dê li gora feraset û zanebûna xwe ya îro nirxandin bike. Lê mirov dikare ji xwe re rêyine din jî diyar bikin.

Ez dixwazim rêya duduyan hilbijêrim û li gora rêbaz û qayîdeyên wêjeyê yên ku di her demê de li gora şert û mercên wê demê guherbar in û hebeke jî bîngeh in tevbigêrim. Nivîskarê ku ez dixwazim jê behs bikim Nûredîn Zaza ye. Ger mirov zanebûna xwe ya roja tê de paşguh bike û tenê şert û mercên berî bi şêst heftê salî bide ber çav, dê pêşketin ji nîvîskêr nû re neyîne û dê nivîskarê çandekê her timî weke tabûyekê bipejirînin. Nûredîn Zaza ku xwediyê şeş çîrokan telîf û çar çîrokan lêanîne ye ku bi giştî nûserê deh çîrokan e, divê li gora berhemên wî yên li ber dest were nirxandin. Çima? Ji ber ku xwedî û berpirsiyarê

Kovara Hawarê Celadet Bedir Xan, Nûredîn Zaza weke Çexovê kurd nîşan daye; ji ber ku çîroknûs û nivîskar Firad Cewerî, Nûredîn Zaza û Qedrîcan weke du pêşengên çîroknûsiya nûjen dihesibîne. Ev her du destnîşankirinên ku di klasîkên wêjeya kurdî de bi cî bûne, divê li gora rastî û geşedanên wêjeyê werin eşkerekirin.

Mirov dikare di wêjeya cîhanê de ji bo çîroknûsiyê du pêlan bigire dest xwe: Pêla Maupassantê fransîz û Pêla Çexovê ûris û mirov dikare di wêjeya Tirkî de jî Pêla Sait Faik û Pêla Sabahattin Ali bipejirîne, lê li gora bîr û boçûnên min mirov nikare yekser bibêje ku Pêla Qedrîcan û Pêla Nûredîn Zaza. Çînkû digel van her du çîroknûsan mirov nikare Celadet Bedir Xan, Kamiran Bedir Xan û Osman Sebrî weke çîroknûs nehesibîne. Ger dê veqetînek duneçel were destnîşankirin, divê mirov hemû çîroknûsên nîvîskê Hawarê bide ber hev û li gora rewşa wêjeya kurdî binirxîne. Hin çîrokan ku Osman Sebrî nivîsibûn di serdema xwe de dikaribûn qayîş bi çîrokan wêjeya cîhanê re bikişandina, dîsa çîrokan resen û ên lêanîni ku Celadet Bedir Xan nivîsibûn ger derfetên xwegihanîne dîtibûna dê teqez îro weke mîrateyêke wêjeya cîhanê bihatina hesibandin.

Îcar çima mirov nikare Nûredîn Zaza weke lehengekî pêlekê bihesibîne? Nivîskarê ku bêtir weke siyasatmedar û welatparêzê bîrdozekê tevgeriyaye, ji ber egerên mişextîbûn û zordariyên pergala Tirkîye û Sûriyê neçar maye ku bêtir der barê ewlehiya jiyana xwe de û der barê xebatên xwe yên siyasatê de bîronî; ne ku bi dehan çîrokan binivîse. Ev ponîjandin û hesasiyetên wî, weke naverok û peyama di guldesteya çîrokan wî de jî diyar in. Bêrîkirina welêt, diljenîya welatparêziyê, paşdemayîn û belengaziya netewekê, qehremanî û bîserketin di hemû çîrokan de armancên sereke ne. Çawa ku Nûredîn Zaza di hejmara 32'yê ya Hawarê de bi nivîsa “Şîretên Ehmedê Xanî” û di hejmara 30'î ya Hawarê de bi nivîsa “Ji Xortan Re” xwestiyê şîretên Ehmedê Xanî û Kipling arasteyî zarok û ciwanên kurd bike, ev hewldan di çîrokan wî de jî eşkere ne. Ji bilî çîroka “Şerê Mêşan” hemû çîrok di salên 1941-42'yan de hatine nivîsin. “Şerê Mêşan” ku mêjûya 1965'ê li binî hatiye nivîsin -piştî bîst û sê salan-, hem ji hêla vegotin û hem jî ji hêla şewazê ve dikaribû bibûya despêka hewldaneke mayînde; lê mixabin, ji ber ku îro ji bilî van çîrokan tu çîrokan wî yên din li ber dest tune ne, mirov nikare bi gotinên qelew çîroknûsiyêke domdar û pêlekê xweser veçirîne.


“Di rastiyê de nivîskar dizane ku ji bo azadiyên ku di heriyê de mane, veşarî mane û bikaranîna wan ne pêkan e diaxive; û jixwe azadiya wî bixwe jî ne pak e,

divê wê paqij bike; ji ber vê, ji bo ku azadiya xwe paqij bike jî dinivîse.”

Nivîskar û feylesofê Fransî Jean-Paul Sartre di pirtûka xwe ya bi navê “Qu’est ce que la littérature” (wêje çi ye) de armanca nivîsandinê bi wî awayî rave dike. Gelo nivîskarekî mîna Nûredîn Zaza ji ber vê hişmendiye hewldana xwe ya çîroknûsiyê geştir nekiriye û bi qasî tiliyên du destan çîrok li dû xwe

hiştine? Destnîşankirina Pêlan ji bo nivîs û wêjeya kurdî bi berhemdariyeke bêhejmar pêk tê. Çinku pêl di deryayê de radibin. Ji bo ku pêl hebin, divê di serî de deryayeke bêser û bêbinî hebe. Ji ber hindê ez dibêjim, “çîroknûsiya Nûredîn Zaza nebûye pêleke çîroka kurdî”, gelo xwîner û nivîskarên kurd çi dibêjin?

e-mail: yaqobtilermeni@hotmail.com



Bîranîna Koçkirina 17 Saliya Dr. Nûredîn Zaza*

Mihemedê Seyîd Husên

Birêzan xwişk û birayên beşdar!

Berî her tiştî lêborînê, ji bo nebeşdarbûna xwe, ji komîteya amadekar dixwazim û keş, kêr û bizava we, di berevaniya vê helkefta gewre de pîroz dikim û ligel silavên xwe yên germ destê we dihejinim.

Xwişk û birayên hêja!

Gelo? Piştî van salên dirêj û xemsar, îro ji nû ve sebareti vî xweşmêrê buhabilind, nemir Dr. N. Zaza dê çi bibêjim, bê guman newaziyên coşa dil, salixên birîndar û tev derd û kul, li ber yadiyên xawer giranmatim, mîna aferîdeyekî mirovanîhez bi giştî, welatparêz û niştimanperwer bi taybetî.
(.....)

Xwişk û birayên hêja!

Bê awarte ne ez û ne ji tu kes, gereke maf nede xwe, nemaze ku şelafi û quretiyan, li ser pişta vî ciwamêrî bike.

Pirdaxe bi taybetî bi qasî ku Doktor, gornepenî, ji ber zor û kotekiya rejîmên dagirkerên Kurdistanê, kete sirgûn û mişextiyê, li welatên biyanî der bi der geriya, mixabin bi heman pîvanê jî, ji ber hişkbaweriyên cotkarî, gavanî, giyanê helperestî, gêl û kewdanî, zavê hozperestî, di gel re jî ne têngihîştina radeya ramanên wî, yên kûr û dûrbîn, ew pîlîmetê tevdezan, awirtûj û tundbawer, wêrek û şareza, ronakbîrê mirovna û şaristanî, ji dest xwe bi erzani berdan û di biyanîyê de mêwe girt û bi merdî berhem da.

Loma mîna berê dareke kerrik, pêşdemî payîzê ji darê bête xwarê û çirûskên ramanên wî li wê hindamê vemirtin û ligel azweriyên xwe, di vegera welat de li wê dûrdeverê binax bû û kedera welatê wî pê re çû gorê.

Her wiha ku her yek ji me, ji dil jînenîgeriya vî xweşmêrê cindî û gewre bixwîne û weke peledar baş lê vekole, mîna êşnasekî çak lê venêre, nemaze ji bo

ku hinek ji rûmeta wî ya takekesî lê vegerîne, merdî, dilsozî û nemekdariyê pê re bike, hingê dê xweş zanibe ku rê, şiverê, xaçeriyên ku ji xwe re bijartibûn, tev kelem, asteng û rencekêşanbûn, têr kefteleft, kêferat û tengezarbûn, wê hestên keservedanê, brûskên çavliêmanê, li ber lehiya hêşran vedidin, wê hingê çespanên tundarî yên ku me di şûnşopa, vî têkoşyarê gewre de, vî qehremanê hozan de, bi viyan û şiyar di bizavê de bimîne û çaktir bizanibe ku veger ji ser wê şopa evra, wateya mirin û nemanê diçespîne

Bi rastî eger yek ji me, kî dibe bila bibe, ku mîna gewremêr Dr. Nûredîn Zaza ku ji bo vemanê, bi çavên ronakbîrî, diplomasi, li gireft û kêşeya gelê kurd venêre û têgehane de baş nas bike, hingê teqez wê yekmil bê kîn, zikreşî û çavnebarî, hevpeyman di rêbazeke yekgirtî de hevbest bibin û di yek darêjê de jî vala bibin û paşê armanc û mebesta avra berdest dibin. Loma jî di awira xwe de, nemaze di serdema ku îro em tê de beşdar in, çakeger e ku vexwendineke kûr û nûder, li van xalên li jêr gotî bibe.

Awireke paşdemî:

Bi rastî li ber helwestên wiha, derbirîn lalezar, xav û sar, tawanbar bi nav nabe, lê di paş encaman de dîrokeke hevgar û çîrok di xilboqiya bi darvekirinê de bê çare.

Bê guman dibe ku gelek ji me, bi taybetî yên ku rêdemî gorbihuştî bûne, di sinc û nîhadên xwe de, li ber velerzîna biranîna hêja, Xwedê jê xweş Dr. N. Zaza, poşman, xembar û birîndar in.

Lewra bawerîya min e, ku îro çi di biwara wî de bête gotin, ê min bi xwe di yek awirê de lê dinîhêrim, mîna nimûneyeke rewşenbîrî, ronakbîrî, dûrbîn, firehzanî, cegerdar, yekta û payebilind, zarxweş û têkoşyarekî konevan, pêşmergekî canda, zimanhez, ku bi destê dijminan biketa, av lê venedixwarin lewra çendî ji bo min eger e, ku di çavên min de, her dimîne ew çalakvanê têvelşewaz ku ciwaniya xwe di berevaniya niştimanê xwe de bi comerdî û cangorî mizaxtiye û mixabin vaye îro ji nû ve em li ser digirîn û girî û gazind bêhode ye, beza dû guran e.

Lê her ji kurtejiyana vî mirovê kurd, fêrî vê yekê jî bûme û gerek e li gor temîniya wî, di her zemanî de ku em destegava pêşeng, ber bi pêş ve bavêjin û em baş bizanibin ku rewşenbîr û siyasî berdeham rêheval in, cotyar in, zanevan in, çaktirîn û girîngtirîn metodên bergirîya kêşeya mîletê xwe ne û delîveyên berhemdar didinê û her du mil, bi mîletê xwe mezin dibin, ango bi tevgera siyasî û rewşenbîrî jî. Her wekî ezmûneya jîyanê wiha şanî me daye, nemaze ku ew wêjeya fite, ew siyasîyên navgiran, dema ku xwe ji

derveyî millet dipesinînin, an ku xwe ji partiyan mezintir dibînin, zû wenda bûne. Biçûk û sivik li ber lehiya gel dibin lêmişt û mînaka herî ber bi çav ew e pîlana şevnivîstî ya şovenîzma erebî di 12'ê avdarê de û helwesta cîgir, cegerdar û dirust, mabû ya rewşenbîrên xamesoz, her wiha yekser em bê awarte, berxê ber kêrê ne. Dibe ku em jî mîna Doktor, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd û mîna girtiyên 12'ê avdarê, di kewt û koman de bêne girtin, lêxistin, revandin. Piş bo vemanê, bo mafên rewa pir giran e, pêdivî ye ku di raweya pîrsê de, bipeke holê. Gelo? Pergaleke wiha ne sezayê rêkeftineke hevkar e, nemaze di hundirê pêwendariyên xweristiyane de, di navbera rewşenbîr û siyasî de, di helkefta civîn û kombûneyan de, bêtin goftûgokirin û lê jî bête kolan, çunkî qonax wiha dixwaze ku em hevdemî wê bin. Li gor rewşa navnetewî, li gor dirûşmên cîhanî û destdirêjiya gilobalîzmê, hemdema guhertinên hemcur û ragihandina lezgîn, her wiha li gora ku min şopa vî hozanê kurd gerandiye, li gora min jînenîgariya wî sêpla wî pelandiye. Li gora zanîn û pêkarîna xwe min çend xalên girîng, ji hozaniya wî bijartine. Çunkî helkeft ji bo min derfeteke keyszêrîn e ku ez jî ya xwe di biwara vî xweşmêrî de dibêjim, metehêkî ji nîrxên wî li ber xwendevanên xoşewîst raxînim.

1- Em kurd ji nû ve dikin ku destpêya helperîna çandî, siyasî civakî ji nû ve hewl didin ku fêkiyên şareweriya nûdemî bixwin û di civakeke hemdemî veguhêz de pêşverû bilivin û her bivê nevê em pêdiviyê gelek alav û sedemên şaristanî ne. Di serî de perwerdekirina ziman, xwendin û nivîsandinê, dirustkirina pergala civakî, aborî û hîn çaktir rewîşt û rêpîvanên banebilind ji bo civaka kurdî, her wekî yek ji azweriyên, Dr. N. Zaza bû jî.

2- Pîrnase û ji koma milletên cîhanê ve jî diyar e ku bi taybetî rewîşt miletan bala radike û serjêr dirûxîne jî. Hîç mal û şewket bê rewîşt, bê sûde ye û li gora ku min dîroka kevn û nû xwendiyê, nemaze xwedî rewîştên zivêr, zulm û zor, gemkirina dev, kêr zêde dirêj namînin. Mîna pêkerê Sedamê revoke ku li Bexdayê hate rûxandin û rastî jî seraqet mîrzayê rewîşt nimûne dike. Wêrekî, hişmendî, pêwîstirîn pesnê payedar in derbarî rastiye, lewra di heman wateyê de dibêjim em ê hevdu hogirî rastiye bikin. Çinkû pîrs-girêkên me tevde di zikê wê de nependî ne. Gereke bê paxav, em li derew û şaşiyan xwe mikur bîn û da qene deriyê cegerdariyê li pêşiya me hêsan vebe û dilsozî, nemekdarî, xawenî ku li me hestiyar bibe, hingî teqez em ê erkên bergirîya rastiye dirust bixebitînin.

3- Hêmanên cegerdariyê ew in ku axêver di awirvedana xwe de rastgo be. Bê saw û tîrs bibêje, li rastiye mikur bîn, ayê wê di nav tem û morana sextebaziyê de veneşêre. Mixabin hetanî îroj em çiva

didin bersivê, hîna li ber pîrsiyar tavilê li xwe dilikumin. Bêhna şelafî û şayîkirinê jê difûre û ya ku hîn bêtir mirov giranmat dike; ku hindê hene durûtiyê dikin rêbaz, cothelwestên nakokîdar bi kar tînin tenha ji bo ku berjewendiyên xwe yên tenahezî, helperestî biparêzin û di heman demê de, kesên wîhareng bi çavên şîretvanan li xwe dinihêrin û naven-deke payeberz di civakê de digirin. Gotara bi dengê bilind li valî walî dibêjin. Quretiyên vala û pîfdayî, mîna peqpeqokên sabûnê dikin, her wiha eviya nimûneyeke serete bû hişt ku Dr. N. Zaza û ji bilî wî gelekên dîtir jî derkenar, li mala xwe rûnên. Ango hevtayê wî, ji ber pîlan, zixt û zorên dewletê ji aliyekî ve û ji aliyê dîtir ve ji ber giyanê helperestî, zavê êl, ol û hozîti, yên paşverû, kete penaberiyê û wî jî milletê xwe, welatê xwe bi der da.


4- (.....)

5- Dilsozî û nemekdarî, ji bo civakê di hemî derbirîn û tîreyên xwe de, rêpîvan û hêmanên sereke gewde dikin û pêşmercên diyarde, bo şaşi, dirustî, lêwleyî, hevpeymanî, gelo? Ne ji rewîştên berpak in, ne ji toreya mafnas e. Nemaze ku mirov di çavên xwe de û di yên xelkê de jî, di bîryara xwe de, di dan û standinê de bextewle be. Bê sond û peyman pê bawer be û di şeweyekî hûrbîn de, nûneriya soz û peymana xwe, rêzê bide gotina xwe. Mixabin hestekî wiha, ta niha di civaka me de baş lawaz e, lê bi rastî bê hewêdarî, hestekî wilo li rex Dr. N. Zaza tiştêkî destegul rewa, pîroz û umûdwar bû.

6- Mixabin hetanî îro, hê jî em li dora rastiye dizivirin. Xwe di dîmenên wê de, ango di bergê wê de bergûman xwe dirapêçin. Li ser pişt quretiyên zir û gerdîş, rastiya xwe li ba dikin. Bêtir bi qaşûlên birîqokî digirin û rasteqîna tund di paş xwe de vedişêrin. Hîç ne kêmanî ye ku em ji ezmûneya xelkê sûtê bigirin; wê çendî çêtir be ku em ji nû ve şopa gelên pêşdeçûyî bigerînin. Zanayên weke Dr. N. Zaza hino hino, me bi rex şaristanîya çanda Ewropa û rojava de bibin. Ji bo ku em ji sawêrên wê dîroka xapînok û paşdemayî de kutah bibin û di giyanekî erênî de vegerin, navkutka gewherê kêr û kirinê, pergala, keys û mercên siyasî, rewşenbîrî û civakî, di kar û xebatê de qelafet bikin, ne ku hema em li xirecira aş guhdarî bikin, bêyî ku em ard bibînin.

7- (.....)

8- Yek ji xestên milletê me, bi derengîxistina kar û civan e. Rêpîvanên nîrxdar û lêhêja nadê. Soz û peymanên xwe paşdemî dihêlin. Hem jî di bêtirîn kar, çalakî û stûbaryên jiyanê de xav û sist in. Lewra di vê helkefta pîroz de, tund bawerim ku, ji niha û pêve, gerek e li gor giyanê hemdemî, bê derengî em raperin. Toza kevnar ji ser milên xwe dawêşînin, li ser evrazên pêlên delîveyan, berjewndiyên xwe, di nav mercên navnetewî, lêhatî de bi cih bînin. Zîrek birijîn kar û xebatê. Wiha jî lebatê bi hişmendî, ji



**Hîç ne kêmanî ye ku em ji
ezmûneya xelkê sûdê bigirin;
wê çendî çêtir be ku em ji nû
ve şopa gelên pêşdeçûyî
bigerînin, zanayên weke Dr.
N. Zaza hino hino, me bi rex
şaristaniya çanda Ewrûpa û
rojawa de bibin**

ezmûneya jiyane hîn bibin. Di coş û pêşbaziyeke pîroz, berê çalakiyên rojane bidin pêş. Bêyî ku xem-sar bihêle û bi paş bixîne. Ango karê îro bihêle sibehê û bi wiharengê ku deriyê rewîştê pak, ayê rastiye, nîrxê cegerdariyê, jixweber, sivik li ber vedibe û nimûne di vê bafîkê de, mina rewîşt, rastî, wêrekî, hemî mîna pesnên lêwer in, di gewremêr nemir Dr. N. Zaza de dicivîyan. Loma mîna aştxwazekî xwe kire cangoriyê azadî û serxwebûna mîletê kurd û temenê xwe jî di ber de mizaxt û her ma dola berxwedanê û riya têkoşînê neşemirand. Mîna gernasêkî pêşewa çavê wî jî zindan, îşkence, azar, penaberiyê neşikest. Pariyê xwe bi xwîne re diqurpand û jî dest hilanîn neket.

9- Berî her tiştî diyardeyên balkêş, li nig Dr. N. Zaza nemaze ku rewîşt, hiş û bawerî, mîna prensîbeke yekta, ew bû ku di serî de xwe paldarî ser jen û hêza mîletê kurd a taybet dikir. Çi mirovanî, aborî hwd. û

bi taybetî jî, di dilê nîfşên nûhatî de diçand. Dîsa di pêşî de perwerdekirina zimanê dayikê di xwendin û nîvisandinê de ji ber ku hetanî îro kelepura me ya ser û binê zemînê, ji destê dagirkeran û karbidestên ewlekariyê yê rejîmên şovenîst, têne dizîn. Huner û foloklor û di serî de zimanê resen talan dibe. Hê jî em ji xwe kêmbawer in, çak ne li ser hev in, hê jî hemdemî ramanên kevnedemên heyamên çûyî, yê bizavên paşverû ne. Di bin bandora rêzikên gelêrî paşdemayî de, mane. Bargiranî li ser piştî qonaxê, bêyî zimanekî yekgirtî, di mebest, armanc û rêbazêke siyasî, hevgirtî de, ji gelek tayên zanistî, di jiyane de bêpar mane. Bêtir çavên me li ber destên xelkê ne. Di gelek tiştên girîng de em li benda bilî xwe ne. Tenha li ber bûyer û rûdanên van mercên dawî, di gêra listikên diplomasiyê de, em baş bi kaxta kurdî geşbîn in û di hofka dirûşmên cîhanî de, di guhertinên nûder de mafê mirovan û demokrasî, ligel parastina gelên bindest, her wekî kurd dîsa roleke çakbext leyist û berjewendiyên xwe di nakokiyên navnetewî de li radeyeke pesende parastin. Her wekî vîn û jenê dide hêviyan ku rojeke nêzîk, dê kurd bibe mirzayê bîryara xwe ya azad û serbixwe.

10- Bê guman sîngfirehî, ji çaktirîn pesnê rewîştên mirovan e. Çikû wilo rewîşt, bi taybetî li ser rewan û hişmendîya mirovê lacwer û kes borîn ava dibe. Li pîşekî biçûk naraweste. Lê belê nîrxê giran û pêwîst dide pîşê mezin. Kesê bêhnfireh zû napeke. Li her du rûyan dinîhêre û ji hemû aliyan ve tê de dirame. Di av û bayekî aram û tenahî de, di awirên tûj û kûrbîn de, şîrove dike. Loma jî şaşiyên kesên wiha kêmbayda ne û her gav di her cih û zemanî de têne rêzgirtin û silavdan û rûdarên tevdezan di civakê de xweş têne nasîn. Mîlet bi hemû tîreyên xwe ve ji wan sudekar in. Loma neçar im jî ku di sîra wî de bîranîna gewremêr hêja Dr. N. Zaza ku navendeke wiha bilind, di kurtedemeke nêzîkde, di dilê civaka kurdî de digirt û bê guman hindek ji mafê wî yê rewîşt e ku nîfş li dû nîfş her sal aheng û festivalên hunerî, çandî li dar bixin.

(.....)

Didawîya vê gotarê de, xwendevanê xoşewîst agah dikim ku tiştên min li jor dane zanîn, netexmîne, lê belê teqez ev xal, pesn û navnîşanên nîrxêdar, ji kurtejiyana gewremêr nemir, D.N.Zaza, mirovê Kurd yê ramankûr, dûrbîn û firehzanîn, min ji bo we rûpel pê ronî kirine.

Carekedin vê helkefta navgiran, çalakiya pîroz û çîgir li komîta emadekar, û hemî beşdarên xoşewîst pîroz dikim.. Sipas..... **Qamişlo/ 6/10/2005**

Ev nivîsar ji malpera **avesta@avestakurd.net hatiye wergirtin.*

e-mail: gorican@hotmail.com



Tara CAF: Xeyala min bû ku rojekê ez bi tevahî bibim a muzîkê

Fatma SAVCI

Tara Caf a ku berî niha albûma wê ya bi navê "Dilley Dêwanem" derket, di 28'ê heyva 10'ê de ji bo konserekê bû mêvana Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM). Berî konsera ku wê li salona şanoyê ya Muammer Karaca li dar bikeve me hevpeyvînek bi Tara Caf a hêja re kir. Em vê sohbeta ku bi me xweş e, pêşkêşî we xwendevanên hêja yên kovara Wyê jî dikin.

Fatma Savcî: Hûn dikarin bi kurtayî xwe bidin nasîn? Tara Caf kî ye?

Tara Caf: Ez bi xwe ji Başûrê Kurdistanê me. Bavê min xelkê Helepçeyê ye. Dayika min tirk e. Di sala 1958'ê de, li Bexdayê ji dayik bûme. Di 1976'ê de hatim Londonê. Min ji biçûkayî ve li piyanoyê dixist, li muzîka klasîk... Ez xwe bi xwe fêrî muzîkê bûm. Ku ez hatim Îngilîstanê, min xwe fêrî Harpê kir.

F.S: Çend sal e ku tu bi muzîkê re eleqedar î?

T.Caf: Min di biçûkayîya xwe de du salan li piyanoyê xist. Paşê ez fêrî gîtar, saz û mandolînê bûm. Min gelek tecrube di hêla amurên muzîkê de wergirt. Bes min ev berdewam nekirin. Lê ku min Harpê dît, ez bûm evîndarê wê û min ew careke din berneda. Ez li ser muzîka Harpê gelek jidil rawestiyam. Min evîna xwe bi tevahî da Harpê.

F.S: Paşnavê te Caf e. Tu ji êla Caf têtî?

T.Caf: Belê. Eşîreta Caf pir mezin e. Piraniyên xwe li başûr û rojhilatê Kurdistanê dijîn; li Helepçe, Kelar, Kifrî, Ciwanro. Em ji Cafên Helebçeyê ne.

F.S: Dema qala Tara Caf tê kirin, dengê çivîk, dar, ba û bi tevahî dengê xwezayê tê bihîstin. Tu çawa dikarî van dengan

hemûyan li muzîka xwe bikî?**T.Caf:** Pirseke zehmet e...**F.S: Tu xwezayê pir didî axaftin.**

T.Caf: Min nizanibû...(diken e) Dengê harpê, dengê gelek kevn e. Dîroka wê kevn e, Sumeran bi kar aniye. Harp a Sumeran e. Hewayeke xwezayî, surîştî heye di Harpê de. Ez jî loma aşiqî xwezaya ku ew Harp derdixe bûme. Dengê Harpê gelekî nazik e. Dengê avê, ba û teyrikan heye. Bi qasî xwezayê xweşik û rengîn e. Ew hesta xwezayî ye ya ku min ber bi muzîkê ve dibe.

F.S: Tu xwe bi kîjan çavkaniyan xwedî dikî? Tu stranên xwe ji kîjan hest û kaniyan di-qfirînî?

T.Caf: Muzik tiştêkî wisan e ku rasterast bi giyana mirov ve girêdayî ye. Ez bixwe miroveke ruhanî me. Ez ê çawa bi rêyeke paqij bigihîjime giyana xwe? Ev pirs min e. Bi raya min muzîk ev rêya paqij e ku mirov ber bi giyana xwe ve dibe. Û ev rê hestên evînî ne. Ev evîn ne ku ji bo kesekî ye, eşqa jiyane ye, eşqa mirovahiyê ye, eşqa xwezayê, eşqa ji bo lawiran e. Eger ez nikaribim herim nav vê eşqê, ez ê nikaribim muzîkê bikim. Car caran xeyidîme ji dinyayê, xemgîn im, dev ji xwe diqerim. Wê demê ez nikarim muzîkê bikim. Wexta ku dikarim muzîkê çêbikim, dikarim bigihîjim giyan û hestên xwe.

F.S: wekî jineke Rojhilata Navîn, wekî jineke kurd, muzîk têrî janên te û bi giştî têrî te dike?

T.Caf: Ez niha 48 salî me. Tenê ev pênc salên dawî min dikaribû azad muzîkê çêbikim. Berî van pênc salan zor bû ku bikaribim muzîkê çêbikim. Lewra di nav eşîreta me û di nav civaka me de gelek zehmet e ku jinek bikaribe muzîkê çêbikê, strana bibêje. Şerm tê dîtin. Bavê min hez dikir ku ez muzîkê çêbikim, ji bo bîreke entelektuelî, lê ji bo xwe, ne ji bo xelkê. Ez paşê zewicîm, bi kêşeyên zarok re lebigim, bi pirs-girêkên malê re eleqedar bûm. Lê piştî ku ez ji mêrê xwe veqetiyam, ku kurê min mezin bû, bav û diya min çûn ser dîlovanîya xwe, îcar ez wek jinekê azad bûm. Ya ez jina mêrekî bûm, ya keça bavekî bûm, ya dayika kurekî bûm. Piştî ku ev hemû qediyam ez bûm mirovek, bûm jineke muzîsyen, bûm Tara Caf. Mixabin heya ku min ev dem derbas kirin paşê min derfet dît ku ez bi tevahî dema xwe bidim muzîkê. Ez niha bi tevahî dema xwe bi muzîkê derbas dikim û niha encex muzîk têrî min dike. Ev xeyala min a her timîn bû ku rojekê ez bi tevahî bibim a muzîkê, bibim a xwe.

F.S: Bi taybetî tu li kîjan muzîkan guhdarî dikî?

Ya ez
jina
mêrekî
bûm, ya
keça
bavekî
bûm, ya
dayika
kurekî
bûm



T.Caf: Ez bi taybetî li muzîsyenên Ehlê Heq guhdarî dikim. Mînak; li Seyîd Xelîl guhdarî dikim. Ew miriye. Desthilatdariya Îranê ew kuşt.

F.S: Em dizanin ku hemû muzîk ji bo hest û giyanê mirov in, lê ya te gelek nêzikî giyana mirov e. Bêhna tesewûfê jê tê. Kûraniya nepeniyekê heye. Gelek pîspor muzîkê ji bo başbûna derûniya mirov û giyana mirov pêşniyar dikin. Muzîka te çi ye, tu çawa dibînî? Muzîka te dermanê çi ye?

T.Caf: Pêdiviya muzîkê bi giyanê heye. Divê ku mirov pêşiyê bi giyana xwe bigihîjê. Gerek mirov bikaribe bi giyana xwe bigihîjê, wekî tesewûfê. Divê ku mirov bikaribe bigihîje tesewûfê. Ez bi şeweyekî olî qal nakim. Mîna Budîstan... Ew jî gihîştina bextewariyê bi gihîştina giyana xwe ve pêwendîdar dibînin. Ez bi mirina dayik û bavê xwe gihîştîm hin rastiyan di jiyana xwe de. Min bi mirina dayik û bavê xwe (piştî diya min bi sê heyvan bavê min wefat kir.) min pirs minin û jiyane gelekî ji xwe kir. Min li xwe neda û ez gelekî kêr gihîyam. Di navbera mirin û jiyane de giyan heye. Û giyan tu carî namire, ya din jî her ew e. Eger wek mirov em bikaribin bigihîjin giyana xwe, li wir tirs minin û jiyane namîne, diqede. Min jî gelek hewl da ku bigihîjim giyana xwe. Ez bi muzîkê berdewamiya giyana xwe tinim. Û ew giyan bi xwe evîn e. Bi raya min mirovê/a ku negihîştibe evîna giyana xwe, yan giyana evîna xwe wê kuştinan, talanan, xirabkirina xwezayê bike. Û sedemê hemû xirabîyan ev negihîştina giyana xwe ye. Mînak çima ereb, tirk û faris ew qas bi ser kurdan de tên. Sedem hemû tirs e. Tirs windakirina jiyana xwe ye. Tirs mininê ye.

**F.Savcî: gelek spas
Tara Caf: Zor spas**

Nanê Evînê

du çeng due

ser vê kahniyê ye rawestgeha min
diwestim, di dilê min de lodek hêvî
çavên te şîn, şîrkî, beîvî...
sînorek şahid e
beytik şahid in, av şahid e
di destên min de du çeng due
hubra nivîstekê vedide l' avê Kanîkan!

nanê evînê

ji ser sifrê bir, rakir hilanî
min got wê: kanî? wê got min: kanî?
min dest avêt dil û min ji cih deranî
min got: hişte! û min li ber danî
rahişt dilê min- ku tijî hez bû-
ew car bû bir û êdî hew anî!

xwe serê xwe mam ez bi dû wê de:
tenêtiyeke tisî, bê wens, wêranî...
deriyê dil girtî j' wê rojê de
min li hêviyê hişt hez û mêranî...

vegere rojekê piştî ev qas sal
ku bibêje: hişte, va ye dilê te
dê bêjim çi bikim bi dilê ku hew tu tê de!

Arjen ARÎ

ne tu bî?

ne tu bî
hezê çawa li ferhengê zêde bikim?
peyvê çawa ji Evdêl deyn bikim?
kaniya ji nû ve zayî me, dikim
zêde bibim û biherikim berûbahrekê !

Adar JIYAN

Seba Tu Nehatî

min ê helbestek birista
 bi hêviya hevdişaneke şevdêr wê şevê
 û min ê bineqîşanda
 ji peyvên xêlîkirî yên ku ji ferhenga dilê min î bikul dipaliyan
 û min ê hawara xwe bikira
 duayên bêmîrad
 gotinên berzewac
 hevokên azep
 û biwêjên dûşîze
 hatina min bi min ma
 çûyîna te bi te
 tu bi kêfa xwe biliyayî
 ez jî bi derdê te
 û ken ji min biriya wê şevê
 seba tu nehatî

min ê stranek biloranda
 ji bilûra şivanekî keserkêş wê şevê
 û min ê
 bidota nîşeyên naşîtiya xwe
 yên ku di hestên min î bihicran de diesirîn
 û min ê
 xwe biavêta bextê metelokên dilbirehm
 dilokên delodîn
 û zêmarên zarzêrîn
 ez ji bo te dihatim
 tu ji ber min diçûyî
 tu ji kêfê bûyî
 ez ji te
 tu bi ser min neketî
 û ez bi girî ketim wê şevê
 seba tu nehatî

min ê destanek biafiranda
ji birînên lewendekî barûte wê şevê
û min ê
bi lêv bikira nifirên nefrîn
ên ku ji zengilolka min î ziwa difirdîn
û min ê
xwe li deriyê
xeberoşkên xêrxwaz
çîrokên dîlnaz
û qiseyên bitinaz bigirta
ez bi qesta dîtina te bûm
tu bi qesta jîna min
min birînên te dikewandin
û te dilê min
binihêr
helaçê(!)
helbest xeyidî
stran teriqî
destan qefilî
ziman ket tev
û deng bi min neket wê şevê
seba tu nehatî

Mizgîn AYDIN

Zozan*

Hezîran e Zozan! Çikiyane avên behran ji hesretan
 Şev e, xwîn dibare dilop bi dilop
 Xwîn dibare ji taveheyvê
 Û taveheyv dibare ji xwînê, Zozan!
 Û xwîn didilope ji pelên daran ji simbilên geniman, ji beybûnên ber çeman
 Û xwîn dibare ji stêrkan Zozan!
 Xwîn dibare, diperpite dilê min
 Dişewite bi alawiyên jana bindestiyê!
 Dişewite û dicemide, diqerise di nav dojeha zilmê de
 Hêna bi zilma Asûr diperpite dilê min
 Can dide bi fixan li Efrîqa
 Û di xewnên min de perçe perçe ne Zarokên Întifadayê!
 Di xewnên min ên sor de perçe perçe...
 Dilê min, çivîka çemê Helepçeyê ye Zozan!
 Çivîka çemê bêmîrad û wenda
 Çemê bi kuştina zilmê di nava xwînê de kûr û dirêj...
 Gelo çavê min rast dibînin an na?
 Waye stêrk digirîn, Zozanê
 Cîhan derdê me fam nake,
 lê stêrkên ku tu dest nagihîjin wan, birînên me fam dikin
 Û dinalin stêrk ji bo me, Zozanê!
 Ka bêje biçûka min
 Çima ji dilê me, ji xewn û xeyalên me
 Xwîn dikişe û çima kenên me
 Di nava xwînê de wenda dibin?
 Çima em tene kuştin;
 Ma me çi zilm kiriye li vê dinyayê?
 Binêre Zozan; gund dişewitin; bexçe û rez zevî û pez...
 Kaniyên xweşik dişewitin ku ava wan ji rengê moriyên dayikan e
 Kar û berx dişewitin ku hêna bi şîr e devê wan
 Gul û çiçek sosin, rihan û binevş neman Zozan!
 Ez şewitîm di bihara rengê wan de ew şewitîm di emrê min de
 Stûyê spîndar û biyan şikandin Zozan
 Tevayê hêşînahîyan şikandin bi panzêran...
 Li zarokên kenkulîk, li ciwanên dilagir
 Li kal, pîr û zarokên destwelat negere!
 Li gundên xemilandî bi pale û cotkaran
 Li bilûra şivan û stranên bêrîvanan ên berbangî, negere
 Tev çûn! Çûn û bûn xewneke xemgîn
 ÇÛN! Tenê xwelî û xwîn ma li ciyê wan
 Tenê birîn û dengên wendayî man Zozana min!
 Li ser benderan jî, civatên eşqazad tunin niha
 Tenê şopa panzêr û jiyana koçber heye
 Hezîran e Zozan! Çikiyane avên deryayên dilan
 Di ber rih de ne stran, ji hesreta Roja Azad...
 Kevokên aştiyê baskîkestî ne
 Rengexwîn e spîtiya wan
 Dengê wan nayê ji tu warî

Roja Azadiyê çiqas wan bi firê dixê, tîn kuştin
 Û wek pelên payîzê diweşin ser erdê...
 Evînên me, jan didin di nav birînan de
 Ez birîndar im Zozan!
 Kanên çavên min ên reşxemgîn?
 Ka dengê min ku bi bayê re diçû
 Û geş dikir warên bêkes?
 Dilê min ê xweşbihar kanê Zozan?
 Ka kenê min, kîjan artêşa canewer kuşt?
 Ka kenê min Zozan, ka kenê te; kenê binevîşî, zaroktî
 Çima êdî nikarim bikenim û bibe zim Zozan?
 Beza min a xezalî, beza Zozanê kanê gelo?
 Çima cîhana mezin û fireh li me teng kirine?
 Çima em tenê ne Zozan, di nav deryayek xerîb de
 Çima bi ax û esmanên xwe tenê ne em?
 Zozanê, çiya xemgîn in, lehengên li çiyên xemgîn in
 Nakenin, dîlanê nagirin êdî bazên delal li asîman
 Û quling pişt bixencer in Zozan!
 Difirin bi qêrîn li dora girava Îmrîyê
 Ev çi ferman e Zozanê, quling jî birîndar in
 Lê em napejirînin!
 Em bi çavên te yê xweşnemir napejirînin!
 Hezîran e Zozan, bêhna temenên şewitî
 Bêhna zaroktiyek kuştî, bêhna zewiyên şewitî tê!
 Bêhna panzêrê tê Zozan, bêhna panzêrê!
 Û bêhna mirina reş tê jî panzêrê!
 Dikim ku bibêjim: xwe veşêre Zozan
 Xwe veşêre! Lê nabe
 Hezîran e Zozan
 Li Misircê demsal xemgîn e
 Wek wêneyekî sar û matmayî maye!
 Û tu Zozan; tu şehîd î di nav wî wêneyê de
 Lê ez diqîrim Zozan, napejirînim wî wêneyê sar
 Ez diqîrim, diheje asîman!
 Rabe Zozana min!
 Kulîlka dilê min, rabe!
 Veke wan çavên xwe yê merdzarok
 Bikene bila bibe bihar
 Rabe, waye dimre zilm!
 Rabe em herin, em herin demsalên pirZîlan
 Rabe em bibezin Zozan, bila panzêr negihîje me
 Em herin xwe di bin baskê çivîkan da veşêrin
 Rabe, em bi stranên azad bibezin Zozanê
 Rabe, zilm û mirin derew e!
 Panzêr tune, zilm tune, rabe!
 Zozancan, rabe em herin, mirin tune, mirin xewneke sar e, Zozan, mirin tune!

30 Hezîran 1999
Sêwaz

**Ev helbest; ji bo Zozana biçûk ku li Misirca (Kurtalan) Batmanê di encama qezaya ango êrîşa pan-zerekê de, jiyanê xwe ji dest dabû hatiye nivîsandin. Ez dibêjim ku bila tu zarokên me yê kenkulîlê êdî nebin nêçîra gurên boz û bi xewnên xwe yê zarokê jiyanê me geş û xweş bikin.
 Zozan! Em tu carî we jî birîndar û helbestên xwe yê dilagîr diyarî giyanê we ya pak dikin. Bimînin di xewnên me yê evîndar û bihuştên me yê zarokê de...*

Dinalim Ez

Sîpan XIZAN

Ez bilbil im tu bexçe yî
Gula sor a nûxunçe yî
Her dem evîndarê te yî
Lew seheran dinalim ez

Ez bilbil im dil bi kul im
Li bexçe û gulîstan im
Li seheran her dinalim
Ji bo gulê dixwînim ez

Bizan gula sor a min e
Her dem li xeyala min e
Ji bo wî nalîna min e
Lew seheran dixwînim ez

Her hişyar im li seheran
Dinalim reng birîndaran
Ronak ji çavan dibarin
Digel ronak dinalim ez

Dema gula sor dibînim
Ji bo wê her jar û dîn im
Lew li seheran dixwînim
Evîndar im ji bo wê ez

Keser seheran hişyar im
Bo gulê axîn û zar im
Dil û gurçik birîndar im
Hekîm gul e dizanim ez

Hekîmê Loqman ji bo min
Çare nake bo jara min
Derman li xunça gula min
Lew dinalim ji bo wê ez

Li seheran ez im hişyar
Bo xwendin her dem kar û bar
Keser dirêjim bi hezar
Bo evîna gula xwe ez

Li seheran ez bilbil im
Bo xunça xwe her bi dil im
Evîndar û dil bi kul im
Lew seheran dinalim ez

Gula sor î kesk li ba te
Spî xwe da navenda te
Zer xweş dike wê rewşa te
Her dixwînim ji bo te ez

Li seheran her ji bo te
Herî dixwînim ji bo te
Evîndarê xunçeya te
Her heyran im ji bo te ez

Xwezî her dem biba seher
Min bixwenda xem û keser
Gul ji bo min herî serwer
Ji bo wire bilbil im ez

Lew dibînim li xewna xwe
Dixwînim gulîstana xwe
Şehnaz im ez bo gula xwe
Gulîstana Sîpan im ez.

05-06-2006

Du Kurteşîr

S. BEYAZÎDÎ

I

Geranewe

Le werzêkî behar bide geranewe û
dilop, dilop
baranyan be diyarî hêna
Le werzêkî hawînî da geranewe û
mist, mist
"ba" yan
Bo em xermanane hêna
Geranewe le werzêkî payîzî da û
cêjnaneyan brûske bû
bo em xake lêwqelsî we
Geranewe le werzêkî zistanî da û
kilu, kilu
befiryan hêna
bo em wilate qaqîr e.

II

Bo se

Xêwet diraw
Stûn sikaw
"ba" fêgirtû
mang le tirsan
serhelgirtû
tenya xot û çekeket bûn
lem nîwesewe tare da
pê xeftanberdêkî req û
Le bo se yî tarîkî da bûn...

Awirek li Helbesta Kevn û Nû

Konê RES

Bê guman di van deh pazdeh salên dawîn de geşbûneke rewşenbîrî serê xwe di nav kurdên Sûriyê de hildaye û hê jî ew geşbûn li dar e.

Ev geşbûn di warê danheva zargotin û afirandinê de ye, di gel weşandina pirtûkan û bi taybetî diwanên helbestan.

Di vî warî de, em dibînin ku çapkirina diwanên helbestan zoriya coreyên torevanî yên mayî biriyê, wek: çêrok, şano û roman ...

Heger em stastîkekê di vî warî de çêbikin, em ê bibînin ku pileya weşandina diwanên helbestan bilindtir e ji coreyên torevaniyê yên din û ji yên zargotinî. Gelo sedem çi ne? Heger em bersivê bidin, dibe ku gelek dilê xwe bigirin ... Belê ta ku rastî neyê gotin pêşketin rêka xwe di nav me de nabîne û em di pêvajoya xwe ya torevanî de rast û durist nalivin ...

Me got ku cihê diwanên helbestan gelekî berztir e ji coreyên mayî, lê gelo rast e ew diwanên helbestan in?! Û xwediyên wan rast e helbestvan in?!

Bê guman helbestvan di nav wan de peyda dibin û têvel in – gava ku em wî nîfşê pêşin ji vî mijara xwe bidin alî ku ji mîj ve bi rengê Cizîrî, Xanî û Cegerxwîn dinivîsin – yên ku em dixwazin li dor wan rawestin, ew nîfşê ku duh fêrî alfabeya kurdî ya latînî bûne û îro diwanên helbestan çap û belav kirine, bîyî ku helbestên diwanên wan şert û mercên diwanên helbestan hilgirin.

Gotineke Apo Osman Sebrî heye, dibêje: “Gelek ji xortên me çavên xwe berdana nivîsandina helbestan, ne tiştekî hêja ye, divê nivîsên rasteser bînin nivîsin. Belê helbest tiştekî ji edebê ye, lê ne tevaya edebê ye. Divê ku mirov zanibe, bi zimanê xwe binivîse, lê nîzanim, hema ji min re helbestan çêdikin ...” Ji kovara Pêşeng, hejmara 5 / 1984.

Em jî bi gotina rehma tiyê Apo Osman Sebrî re ne; lê em ne bi wan kesên ku navê nûjeniyê sehkirine û bi-hîstine, piraniya helbestên wan bi wî rengê nûjen hatiye nivîsandin, ew rengê ku xwendevan tê nagihêje û li ber nakeve ...

Heya xwendevanek ji helbestvanekî, vî terzê helbestê bipirse û bibêje:

- Ez li ber helbesta te neketim, min daxwaza te ji nivîsandina vê helbestê nas nekir?

Dibe ku ew helbestvan lê vegerîne û bibêje:

- Ev helbesta nûjen e, dibe ku di ser ast û ramanên te re be ...

Em bi xwe vê yeka wan, bi wî mirovê ku xwe kiribû wênekêş berhev dikin, dibêjin: mirovekî wênekêşer hebû, tabloyên wî, ji xêzekên rengîn dihatin xemilandin. Mirov serê tabloyê ji binê wê nas nedikir ku yekî şiroveya tabloyekî wî jê bipirsiya, wê jê re bigota: “Ev tabloya min wêneyê wê, bi wataya wêneyê dêwe, an pîrebokê ye.” Bê guman kesekî ne dêw û ne pîrebok dîtîye, vêca ew mirovê temaşevan bêçar dima û deng nedikir.

Heger rast be, ew wênekêşê ha wênekêşekî zîrek û çeleng bûya, wê wêneyê xezalekî an kevokekê biafiranda, lê ji ber ku nîzane biafirîne, ew wêneyê kesekî nedîtî çêdike.

Helbestvanên me yên nûjen jî wisan in. Nîzanin helbestên klasîk binivîsin, dibêjin: “Em helbestên nûjen datînin” Mane nûjenî pêşketina klasîk e û nûjeniya ku ne ji klasîk hatibe derê, dêmek ew nûjenî bîjî ye, bê esl e û em li toreya resen digerin, toreya ku kok û rehên wê di nav xaka me de kûr çûbe.

Ji rexekî din ve em bibêjin nebêjin rewşenbîriya ku bi me re kom bûye, ji zimanê erebî ye, bi saya zimanê erebî jî em serwextî rewşenbîriya cîhanî bûn. Heger mirovek ji helbestvanekî ji terzê nûjen bipirse û daxwaza navê sê helbestvanên ereb ên hevçerx bike, bê guman piraniya wan nîzanin, ji ber ku naxwînin, bi tenê navên çend kesên bi nav û deng bihîstine, wek Edonîs, Mehmûd Derwîş, Nîzar Qebanî û Beyatî... Ev navên ku pîrika min jî bihîstine, gerek mirovê rewşenbîr nemaze torevan, bi tevgera rewşenbîriya xwe re be, ew welatê ku tê de dijî, heger helbestvan be, gerek helbestvanên hevçerxê xwe nas bike û helbestên wan bixwîne û wiha jî kesên ku çîrok, şano, romanê dinivîsin.

Ji bilî ku rûrikê xwe bi gotin, metelok û çîrokên folklorî dagirin, nexasim ji pîrejin û kalemêran, da ku samanên xwe dewlemend bikin ji gotinên kurdî yên resen û dawî û pêşî xwendin, bi çi zimanî be bila ew ziman be û wek ku hatiye gotin: “Sê heyvan bixwîne, ku tu sê rojan binivîsî, da ku tu sê rûpelan dagirî.”

e-mail: koneresh@hotmail.com

Sergoyê Kurdan Baxçeyê Cîranan

Evdile KOÇER

Gava ku mirov hinekî li civaka kurd mêze dike û çavê xwe piçekî li xebatên entelektuelî digêrîne, tu dibêjî qey hewşa kurdan bûye sergoyekî mezin.

Dema mirov li vî sergoyî hûr û kûr dinêre, tê dîtîn ku ji qirş mirşên cîranên kurdan û bi hemû bermahiyên wan ên çand û hunerî hatiye dagirtin.

Dagirkeriya madî û fizîkî, bi vî metoda nû û bi xêra vî sergoyî tê dikeve nava rih û hemû manewiyeta civaka kurd!

Hiş û mêjiyên nifşên nû wekî fabrîqeyê bê ser û ber û bê xwedî, heta ku bêhemdî xwe nas bike, her qirêj û bermahiyên çand û hunera cîranên xwe dihêrîne û mîna hemalên sedsala navîn ji hev û du vediçirîne.

Tu dibêjî qey cîranên kurdan zibil û mibilên xwe yên herîkokî, fikirok û gotinokên xwe yên qewlborî, pirtûk û stranên xwe yên jihevçûyî û nav û bernavên xwe yên ku êdî bi pîvazekê jî nakin bi şev û roj tînin di nava ambalajên nû de dirêjin ser sergoyê kurdan.

Sergoyê kurdan çiqas ku tê dagirtin, baxçeyê cîranên wan jî ew qas paqijtir dimîne!

Cîraneke xwenaskirî, pirtûk û nivîseke xwe ya ku li Edîrne û Trabzonê du xwendevan nekirî, bi paletiyê delal dipekîne ser sergoyê kurdan; kurdekî me yî reben jî radike bi eşqeke mezin werdigêrîne kurdî û di nava ayetên pîroz de dixwe nava lepên civaka me ya xwelîser.

Civaka me ya ku pêdiviya wê bi rêwîtiya xwenaskirîneke dûvedirêj heye, ji mecbûrî tiştê ku ketiye

nava lepên wê wekî qûtê zivistanê her dadibeline nava mêjiyê xwe.

Cîraneke ku dîwarên civaka xwe her dem bi teoriyên nû dixemilîne, dema ku çend gotin û teoriyên mirî û kurmî bi ber bayê wê bikevin, dirêje ser sergoyê kurdan; kurdekî me yî ku hêj nizane ka kefenê gotinekê çend mîtro ye, radike wan gotinan ji ser sergoyê xwe wekî arkeologan top dike, ji nû ve dilûsîne, direqîne, dixemilîne û bi gelek miqam û awayan bi ferşa kaniya civaka kurd ve dialiqîne.

Kurdên ku dixwazin ji serkaniya xwe peşkek fikrên kurdî wergirin, ji destê van kesên ku xwe li arkeologiyê datînin ên ku nizanin kefenê gotinan çend mîtro ye, emrê xwe yê mayî mixabin kurtir dikin.

Cîraneke ku êdî dixwaze ala serdestiya xwe li ser hîvê daçikîne, du sê pişturmiyên xwe yên ku êdî di mal de mane di şereşeka bê Xwedê de datîne ser sergoyê kurdan; kurdekî me yî ku ferqa şev û rojê nizane çawa ku Amerikayê ji nû ve kifş kiribe radike pêlavên wan pişturmiyan bi destmalên zavatiya xwe dibiriqîne, her yekî mîkrofoneke zêrîn dixwe destê wan, wekî qehremanên nû datîne ser sehne û dîwanên kurdan.

Civaka me ya ku her dem zavayên xwe dixwe qurbana pişturmiyên cîranan, di bin dengê mîkrofon û dîwanên wisa de her kerr û lal dimîne.

Cîranekî ku êdî av di qûnê de nemaye piştî ku prezervatîvekê 50 salan bi kar tîne bi fiştokê davêje ser sergoyê kurdan; kurdekî me yî ku nizane sala par çi xwariye, radike li ser wî prezervatîvî 70 lêkolîn û analîzên ecêb dike û bi devê xwe yê beşkerî qaşo dixwaze ji me re qala seksolojiyê nû bike.

Yanî bi kurt û sosyolojîk: Cîraneke me –bê mane!- dema destava wê teng dibe, naxwaze sergoyê xwe bilewitîne, helbet ev heqê wî ye, hema di cih de berê xwe dide sergoyê kurdan; kurdekî me yî ku qet tiwalet nedîtiye gûyê wî cîranî hişk dike û bi ambalajên rengîn ve di sazî û dezgehên kurdan de pêşangehê vedike û dixwaze bifiroşe.

Hewşa kurdan bi xêra cîranên wan ên xwenaskirî her wekî sergoyekî dimîne; ku dişibe sergoyekî ku zarok tê de leyîstok û gilçê bilîzin.

Baxçeyê cîranan jî, çawa ku hûn jî niha texmîn dikin her paqij dimîne, helbet bi gul û qerenfilên xwe ve.

e-mail: evdilekocer@yahoo.com

ŞANOYEKE ÇAWA?

M. Saîd ALPASLAN

Di der barê şanoyê de, mirov dikare bi sedan drûpel nivîs binivîse, bi saetan biaxeve, bibêje. Lê ez bawer im ku yek jî qasî tiştê hatine kirin û qediyane, rê nîşanî mirovan nade. Ev 21 sal e, ez li Amedê û li herêmê şanogeriye dikim. Di vê xebata şanoyê de ez gihîştîm vê ramanê: “Şano mîna jiyaneke ye”.

Bê şik, mirovê ji şanoyê dûr bikeve, mîna masiyê ji avê derketibe bêhilm û bêtaqet dimîne. Di nav kevneşop û adetên gelê me de her çiqas bi rêya listikan cihê girîng bigire jî (mîna kalo û bûkê, an jî Kosegelî her çiqas listikên gelêrî hebin jî) tu carê bi navê şanoyê nehatiye binavkirin. Gava gotina “şano” an jî “teatr” bê ser zimên, ji ber kirin û hînkirinê serweran, mîna qebahetê an jî fahşîyêkê tête fêmkirin... Di xebatên piştî salên 80'yî de him di destpêkirinê de û him jî bi xebatan, ji bo vê daraziya çewt xera bikin, me gelekî li ber xwe da.

Îro em gihîştine serdema feza... Bi her awayî teknoloji ji bo çand û hunerê bi pêş ketiye. Êdî di filimekî de ji bo bombekirina pirekê, hinceta bombeyan û pireke têkçûyî nemaye. Ji ber ku kompîtur bi saya efektan hemûyên vana tîne holê. Ev hunera teknîkî ew qas pêşve çûye ku, mîna filimê “Tîtanîk”ê, di çolê de dikarin oqyanûsan ava bikin û keştiyên transatlantîk tê de noqî avê bikin.

Dikarin ji ezmanan agir bibarînin û erd û ezman, mîna ku bombeyeke nukleerî hatibe avêtin, biqelînin û di nava agir û kewkurdê de bigemirînin. Dikarin bajaran têk bibin û mîna oqyanûsan çêdikin, bajaran jî ava bikin.

Ew ew qas pêşve çûne, lê em? Hunermendê hunera



Ez li gelek cih û hêwanên şanoyê geriyam. Ramana ku gihîştîmê, ez ber bi şaşiyeke mezin ve birim, ji ber ku li her aliyê; “Madem ku ev huner bi mirovan dibe, wê çaxê divê mirov tenê li xebatên xwe bifikirin, dekor, akûstîk û hwd. bila bibe karê pisporên teknîkî...” dihat gotin û fikirîn

ku mirov bi navgîniya mirovan, bi awayekî mirovî tîne ziman li ku ne? Ez li gelek cih û hêwanên şanoyê geriyam. Him li Ewropa him jî li Tirkîyeyê. Ramana ku gihîştîmê, ez ber bi şaşiyeke mezin ve birim... Ji ber ku li her aliyê; “Madem ku ev huner bi mirovan dibe, wê çaxê divê mirov tenê li xebatên xwe bifikirin, dekor, akûstîk û hwd. bila bibe karê pisporên teknîkî...” dihat gotin û fikirîn.

Wê çaxê min berê xwe da mala xwe û şanoya gelê xwe... Bi rastî mîna ku min dewê deşo vexwaribe, dilê min li hev ket. Ji ber ku ji serî heta binî em di nav kêmasî, tengasî û xeletîyan de bûn. Pirsgrêkên me yî herî mezin di zimên, tekst, hêwan (salon) û fêhmariyan de bûn. Ev bi qasî deh salan e, rêvebiriyên heremî, di destê partiya gel de ne. Divê niha, li bajarê ku şaredarê wan ji gel e, qet nebe 5 hêwan

bihatina avakirin. Lê gava li paş xwe dinihêrim, hêwaneke mîna hêwanan, ew jî tenê mînakek... Şukir be, ew jî heye, li Wêranşarê, ji aliyê şaredariyê ve hatiye avakirin. Şano, bi min ne cureyekî jiyanê ye; bixwe jiyan e. Bo wê, tiştê ew qas jiyanî, bi qasî jiyanê ferz e... Şanoya gel, şanoya jiyanî; bi qasî azadiyê ferz e. Bo wê yekê divê şaredariyên ku ji aliyê aboriyê ve hinekî din jî xurt in, vî barî hilgirin ser milên xwe. Xebatên zimên, çand û hunerî, bi qasî xebatên kanalizasyon, zabita û hwd. bi ser ve bigirtina. Lê mixabin şaredarên kurd, bi tiştê ku qezenca wî ya populer tunebe, zêde têkildar nabin... Ma ne wisa ye? Belavkirina firçeyê diranan, çêkirina du mîtro rêya asphalt, belavkirina du kilo nîskên sor, her tim nakeve pêşiya şano an jî hunerê ?

Bi min; divê heta niha, qet nebe 5 navendên çand û hunerê û 2 konservatuar, enstîtu an jî akademî, li bakur, li herêma me bihatina vekirin û salê kêr û zêde 100 hunermend perwerde bikirina. Divê di beşên sînema, edebiyat, şano û muzîkê de niha mîna Şanoya Dewletê, bisazîbûneke xurt bihata avakirin. Ev dê bibûya bingeha yekîtiya gel û yekîtiya zimên. Lê mixabin ev kirin û xebat ji rêvebirên me re 2 numro mezin hatin. Ji bo van xebatan, ji bo van avahiyan, ji bo çareserîya vê pîrsgirêka ku ji bo me û gelê me jiyanî ye, divê dilawêrî hebûya. Gava ji paş salên ku derbas (winda) bûne û çûne dinihêrim û dibînim ku; ew dilawêrî ne di me de (ji ber ku em li ber vê nekirinê an jî çewtçûyîne bêdeng man, yê ku



dengê xwe bilind kir jî yan hate tecrîtkirin û tenêhiştin an jî ji aliyê komîte û saziyên ku di vê xetê de dimeşin hatin jibîrkirin) ne jî di rêvebirên me de heye. Sazî û partiyên me, jixwe her tim ji ber ku di berxwedaneke dijwar de bûn, jixwe pîrsgirêkên wisa biçûk qet nedîtin û neaxivîn. Ji bo bisazîbûyina şanoya gelê me, şanoya kurd, ji astengiyên herî mezin yek ev e.

Ya duwem, bi destê rewşenbîr û nivîskaran divê safî bibe. Lê ew jî mîna hêviyek bêbinî xuya dibe. Ji ber ku nivîsa şano, zanîne dixwaze... Pîspori hewce dike. Pêwistiya zanîna teknîka nivîsê heye. Lê mixabin rewşenbîrê kurd, bi tiştê ku qezenca wî ya madî tunebe, zêde têkildar nabe... Belê, jidil e, bo xebat û gelê xwe canê xwe dide, lê bi hunera xwe ya xwezayî xebatên xwe didomînin. Ji bo perwerdeyeke pêşveçûyîneke di zimên de, ne gavekî davêjin ne jî xwe diêşînin. Ez bi xwe di xebat û jiyana xwe de gelekî rastî vî tiştî hatime. Carna bi dawetnameyan, bi bangan jî me nikaribû nivîskar an jî hunermendên gelê xwe baniya şano an jî listikan.

Di der barê vê nirxandina xwe de ez dikarim ji jiyana xwe mînakekê bidim: Di sala 2003'yê de, gava cara yekem me di qada fermî de, bi fermî listika kurdî, "Jana Zirav" leyîst, bi rasti nivîskarên Amedî ne carekê hatin listika me, ne jî piştgiyêk dan me. Ew qas ku, gava rêvebirên wê; ji bo PENa KURD daxuyaniya çapemeniyê, li hêwana Şaredariya Mezin didan, me jî li hêwanê dekora Jana Zirav amade dikir. Em ew qas nêzikî hev û ew qasî jî dûrî hev bûn. Belê, gava protokolek hebe, xwarin û vexwarin hebe, hunermendên me ji bo ku xwe bigihînin wir û li wir, di wê protokolê de xuya bikin, bi çar lotikî diçin... Yanê hunermendê (nivîskarê) ku divê pêşengiyê ji gelê ku ji aliyê mêtîngeran ve hatiye bindestkirin bikin; xwe hîn jî lawaz û bindestir dîkin. Xeynî çend navî (mîna E. Huseynî, Ş.B. Soreklî, N. Baktaş...) û çend saziyên, hema her kesê ku bi nivîs û çixêzan mijûl dibe, dikare van gotinan ji xwe re mîna nirxandineke tûj bigire û bifikire. Ez vê rexneyê li xwe jî dikim, ji bo wê jî divê di van nirxandinan de xeyd tunebe.

Ya sêyem; bi rastî bi sedema yekem ve girêdayî ye. Bisazîbûyîn heta ku ava nebe, dê xebatên me yên şanoyê, her çiqas ber bi merheleyeke profesyonelî ve bimeşe jî, dê tim û tim aliyekî amatorî bimîne. Çimkî gihandina listikvanan, dê her tim li ser piştê şanogerê kurd bibe bar. Ji ber ku perwerdeya akademîk ferz e. Ez li dora xwe dinihêrim.

Ji sala 85'ê û heta niha herî kêr 200 şagirtên min çêbûne. Lê mixabin ên ku xwendekar bûn, piştî ku

xwendekarî qedandin, dev ji şanoyê berdan, ên din jî di nava şerê jiyanê de, her yek bi aliyekî ve pekiyan. Ger hebûn û cidiyeta şanoyê, ferzbûna hunerê ji aliyê rêvebir, sazî û partiyên me ve bihata zanîn, saziyên bi taybetî ji bo hunerên temaşeyê bihatina avakirin, şanoya kurd bisazî bibûya; niha qet nebe tenê li Amedê, dê nêzikî 2000 hezar şanoger hebûna. 2000 şanoger, ji Amedê heta Helebê, heta Hewlêr û Mehabadê li çar aliyê niştiman, dê bi zimanekî yekbûyî, tête fêmkirin û bikaranîn, listik bileyîstina, berhem pêk bianîna û di nava gelê me de pireke wekhevî, biratî û yekîtiyê ava bikirina...

Tew di ser de jî akademî an jî zanîngeha şanoyê hebûya, qet nebe, dê 10-15 şanoyên taybet an jî yên saziyan hebûna. Dê ev şano di nava welatê me de bigeriyana, listik binivîsandina, bilîstina û ew pira wekhevî, biratî û yekîtiyê bi vî awayî ava bikirina.

Ez bawer im ku ji bo van gavan, ji her aliyê ve jî bo destpêkirinê her çiqas dereng be jî, hîn fersend heye. Ev dê rojek miheqeq bibe. Lê hevalên giranbûha û xwendevanên birûmet; çima em li benda lehengan in? Di mercên iro de kî van tiştan bike, dê mîna Don Kîşot bête dîtîn... Bila be; ma di heman demê de hewcedariya me her tim ne bi Don Kîşotên di xebat û kirinan de bêperwa ne heye? Bila Don Kîşot derkevin, em bi xulamtiya wî yê ku tevî kerê xwe li pêy wî diçe, bi Şanso Panzatiyê qayil in...

Mîna xewnekê ye... Gava bibe, bi rastî jî em dikarim bibêjin; "çanda gel pêşve diçe" û "Em neteweyeke bi ziman, çand û hunerê bêkêmasî ne, tenê kêmasiyên me tixûb mane"... Lê van gotinan, ji bo çaxa ev bibin û di nava civakê de bijîn, dê bêne gotin ... Wê çaxê dê pîrsgirêk û guftûgoyên me, cihêtiyên me, ne ji kancî, çavnebarî û xizaniya mercan, lê di der barê listikên modernizm û postmodernizmê an jî li ser tehera Brecht, Grotowsky û Shakespeare bûya... Me yê bigota "Rîzo bi postmodernî dinivîse, lê listikê Rêzan bi awayekî epîk in"... Me yê dekor û listikvanî an jî birêvebiriya (derhêneriya) listikan binirxanda... Lê mixabin, berî ku em "şanoyeke çawa?" ji xwe re bikin pîrsgirêk û nîqaşa wê bikin, divê em şanoyeke nû, xurt, pêşveçûyî, xwedî hêwan û akademîk ava bikin...

Ma ne wisan e temaşevanên hêja û giranbûha?

e-mail: msaitalpaslan@hotmail.com

Awirek li ser romana Bêhna Axê

Mizgîn BÎNGOL

Jiyaneke nûjen û xerîb, her çiqas xerîb, ewqas jî nêzî mirovan û sê kesên ji nava me. Jiyaneke hevpar di kesayetiya Roza, Sozda û Dilgeş de bayê xwe li hest û ramanên mirovan dixê...

Omer Dilsoz bi romana xwe ya ku bi navê "Bêhna Axê" ya ku bi kurdî hatiye nivîsandin, gelek caran me û rastiya me tîne hemberî hev. Aktorên sereke yên romanê Dilgeş, Sozda û Roza didin xuyakirin ku mirov çiqas şoreşger be jî ewqas kesekî/e ji nava gel e û çiqas kesek ji nava gel be jî bi taybetiyên xwe dibe renekî nava gel, carna kes dibin kesekî/e veşartî an jî bijartî.

Sozda li çiyê maye, bêhna milîtanîyê bi hevalên xwe re parve kiriye. Dilgeş ji girtîgehê derketiye. Her duyan zilm û hovîtiya dewletê dîtine û Sozda bi birîna lingê xwe yê birîndar dinale. Piştî salan xwe davêje ber bextê hevalê xwe Dilgeş.

Roza jî dergistiya Dilgeş a qedexeyê ku piştî salan rastî Dilgeş tê û kovanên dilê wê jî carekê din bi dîtina Dilgeş geş dibin. Her sê jî ji aliyekî ve bi kul û derd in û nikarin serî li ber qedera xwe deynin. Di nava dubendiya civakê de dipelçiqin û bêkesî û bêhêzbûn carna bandoreke wisa li wan dike ku mirov li deriyê rizgarbûna kul û êşên wan digere.

Omer Dilsoz bi nivîsandina dramaya wan dîrokeke nenivîsandî li ber çavên mirovan radixe. Dram û kulên dîroka çûyî an jî ya ku hêj tê jiyîn dike kula mirovan û mirov li kesên der û dora xwe difikire. Ziman gelekî rewan e her çiqas gelek caran

dubarekirin hebin jî. Peyva demildest ku gelek caran tê dubarekirin bêyî ku mirov bizanibe çima 'demildest' mirov bêzar dike. Hinek peyvên herêmî hene lê ew ji kurdiya hevpar ne dîr in. Wekî kes ez bi bihîstina wan peyvyan tengezar nebûm, neketim nava lêgerîna wateya wan.

Omer Dilsoz bandora ziman an jî jiyana gel, bêyî ku di bin bandora kevneşopîyan de bimîne li romana xwe dike. Ew gelek caran bi zimanekî helbestvanî bi wan gotinan bîranînên Sozdayê dixemilîne. Wekî hevoka ku dibêje, "tevna min verisaye" an jî "xopana dilê min debar nake ..."

Lê gelek caran nîrxandinên filozofîk mirovan difetîsînin û ew nîrxandinên filozofîk bi gotinên ku têne heman wateyê bi peyvên cuda gelek caran tîne dubarekirin. Mirov wekî xwendevan dixwaze xwe bigihîjîne encamê, ji ber ku karakterê romanê an jî mijara romanê têra xwe balkêş e.

Di romanê de hinek caran mirov dubendiyekê an jî nelihevîkirina di navbera nivîskar û aktorê romanê de dibîne. Herî zêde mirov li dawîya romanê dibîne ku nivîskar çiqas dixwaze ji Rozayê xilas bibe û bi gelek tesadufan wê ji malê dike der. Ew derkirina Rozayê hinekî dibe nakokî ku çiqas tesaduf be jî, ji rastiya civakê dîr dikeve. Roza dibêje min zilamekî xwe yî hem dewlemend hem jî mîr e dîtîye (....)

Lê tiştê ku herî bala min kişand zayendiya wan e. Dilsoz bi awayekî pir hoste ev zayendî (cinsî) aniye ziman. Dema ku mirov tîkiliyên wan ên zayendî dibîne ji Dilgeş û Rozayê zêdetir li kesên der û dora xwe difikire. Bi pîrsa 'gelo hevalên me ji aliyê zayendî ve ewqas bi pêş ketine?' Ne kêmasiya Rozayê an jî Dilgeş e ew kêmasiya me xwendevanên kurd e. Dilsoz bi tîkiliya Roza û Dilgeş deriyekî tabuyan vekiriye û cinsiyeta jinê ji herambûnê derxistiye.

Bi hemû kêmasiyan ve ez dikarim bibêjim « Bêhna Axê » romana ewil a bi kurdî ye ku min li yek bêhnekê xwendîye.

Spas Omer Dilsoz




WEŞANÊN NUH



BILA GOTINEKE MINUTE JÎ HEBE

**Helbest
Omer DILSOZ
Weşanên Berçem**




DILÊ XEMBAR

**Helbest
Zekî KAYAR
Weşanên Tevn**



FERHENGÂ BERÎKÊ

**Weşanên
Azadiya WELAT**



AZAD

Mîran Janbar

AZAD
Mîran JANBAR
Weşanên Lîs-Pirtûkên Zarokan